Osmanlı İmparatorluğu sürecinde, eğitime medreselerde devam ediliyordu ve eğitim dili Arapça idi. Fakat, Osmanlı İmparatorluğu çokkültürlü bir yapıya sahip olduğundan, Arapça dışında farklı diller de konuşuluyordu. Özellikle, medreselerde Kürtçe kitaplar okunabiliyordu. Arapça dışında anadiller de kullanılabiliyordu. Bu dönemde, Ehmedê Hanî, Kürtçe eğitim adına çok önemli bir atılım yapmış ve Doğu Bayezid’de Kürtçe eğitim uygulanan bir okul açmış, Kürt çocukları için Kürtçe-Arapça bir sözlük hazırlamıştı. Osmanlı İmparatorluğu Döneminde, eğitim dili dine dayanıyordu, bu nedenle Arapça’ydı.

19. yy’de , eğitim “İdari Reformlar”larla birlikte ideolojik bir araç haline geldi. milliyetçi düşüncelerin yayılımı eğitimde ve tüm yazılı metinlerde bir gerçeklik haline geldi. Bu dönemde, eğitim, Osmanlı ideolojisini yaymak ve Batı Medeniyetinin gelişmelerini takip etmek için bürokrat ve devlet adamı yetiştirmeyi amaçladı. İdari reformlar sürecinde, osmanlı ideolojisi resmiydi ve toplum üzerinde merkezi bir baskısı vardı. Bu durum da eğitim politikalarını direk etkiliyordu.

Ortak dil veya bürokrasi dili, Osmanlı Türkçesi olabilir; fakat resmi dilin varlığı bireylerin kendi anadillerini kullanmalarına bir engel olmamalıdır. Farklı etnik gruplarda oldukları halde kendi anadilleri dışında, resmi dili bilen birçok entelektüel insan olduğunu söyleyebiliriz: Ahmet Vefik Paşa, Kürt Abdullah Cevdet...

Anayasal Monarşinin başlangıcında , Osmanlı İmparatorluğunun ilk yasası olan Kanun-i Esasi dil problemlerini içeren birçok tartışmaya sebep olmuştur. bu yasa, devlet işleriyle uğraşan herkese Türkçe bilmek zorunluluğu getiriyordu ve anadilinde eğitimi yasaklıyordu.

2. Abdülhamit döneminde, eğitimi yaymak amacıyla birçok önemli gelişmeler oldu. Abdülhamit, kendi merkezci ve İslamcı baskısını yaymak amacıyla birçok okul kurdu, fakat medreselerde

devam eden eğitime dokunmadı, Arap ve Kürt çocukları için İstanbul'da "Yatılı Bölge Okulları"nu açtı. bu dönemde, Türkçe resmi dil haline gelmişti. İslam kardeşliğine toplum yoluyla ulaşılmaya çalışılıyordu.

2. Anayasal Monarşi döneminde, 1908 ve 1913 yılları arasında, "İttihat ve Terakki" güç kazandı ve milliyetçi eğitim modelini benimsedi. Kürt ve Arap halkının yaşadığı bölgelerde Türkçe resmi dil kabul edildi.

Genç Türkler döneminde, anadili ile eğitim yasaklanmadı; çünkü Osmanlı İmparatorluğu devam ediyordu ve Arap ve Kürt toplumu hala bu alanda yaşamaya devam ediyordu. Birinci Dünya Savaşından sonra, birçok etnik grup devlet yapısından ayrılmıştı. Ermeni'lerin sürgünü ve nüfus değişimi Müslüman etnik grupların asimilasyonuna sebep olmuştur.

1923 yılında, Cumhuriyet kurulduktan ve milliyetçi hareketler geliştikten sonra, Türkçe tek dilli millet ve tek kültür, tek dil baskın olmaya başladı. Türkçe, baskın bir dil olmuştu ve bu yerel dillerin ölümünü amaçlıyordu.

Türkiye'de dil politikalarının nasıl etkili olduğunu görebiliriz. Özellikle dil alanında ilk değişim dil devrimi ile başladı. Yeni dil gazetelerde, dergilerde, yasada ve kitaplarda kullanılmaya başlandı. Dil devriminin yayılması için devlet okulları kuruldu. Arapça ve Farsça sözcükler atıldı ve yerlerine Türkçe sözcükler getirildi. Türkçe kelimeler, 14 haziran 1935 yılında, Ankara Üniversitesi Dil-Tarih-Coğrafya Fakültesi tarafından oluşturuldu. Bu yapı, Türkçe dilini araştırıyor ve dilin diğer dillerle olan ilişkisini araştırıyordu. Bu dönemde "Güneş Dil Teorisi" ortaya atıldı; bu teori bütün dillerin orijininin Türkçe olduğunu iddia etmektedir.

1934'te Türkçe Soyadı Kanunu getirildi; bu kanunun amacı din, sınıf ve kimlik farklılığını saklamaktı. Eski çağlardan gelen isimler Türkçe'ye çevrildi. Din dili Türkçe'ye çevrildi ve ezan Türkçe okunmaya başlandı. "Vatandaş Türkçe Konuş!" kampanyaları başlatıldı.

Dil kırımını Politikaları

2. Abdülhamit'ten bu yana, eğitim kuruluşları, Türkçe'nin yayılımı için önemli bir yere sahiptir. Türkçe, 1932'de yabancı vatandaşların da olduğu okullarda zorunlu hale gelmiştir. Türkiye Cumhuriyeti'nde birçok etnik grup, anadili Türkçe olmayan büyük bir nüfus git gide ulus-devlet içerisinde azalmaktaydı. Kürtçe kullanılmıyordu; resmi kuruluşlarda, alanlarda, radyolarda, televizyonlarda veya yazılı materyallerde yasaklanmıştı. Bu, dil kırımıydı.

Kürt halkı, dil kırımına maruz kalmıştı. Kürt dili ve lehçeleri, coğrafya ve tarih üzerine yapılan akademik çalışmalar ulus-devletin gözetimi altına alınmıştı; çünkü Kürt dili inkar ediliyor, yasaklanıyor ve suçlanıyordu. Kürtçe konuşan insanlar, suçlu olarak görülüyordu. Bu nedenle, dil sorunu eşitlik, adalet ve insan hakları bağlamında ele alınmalıydı. Bu şekilde, bir dil, diğer diller üzerinde üstünlük sağlıyorsa, o bölgede yaşayan insanların insan hakları ihlal ediliyordu.

Anadil kullanımını hakkını elde etmek için ilk atılım 1960 yılında oldu. Bu dönemde, Musa Anter tarafından yazılan KİMİL yayınlandı.

Bütün devlet mekanizmaları Kürtçe yazılı metinleri ve Kürtçe konuşmayı kaldırmak amacıyla harekete geçmişti. Şimdilerde, insanlar kendi özel alanlarında anadillerini kullanabiliyorlar, fakat eğer Kürtçe eğitim veya medya alanında kullanılmak istense, birçok zorlukla karşılaşabiliyorlardı. 40 milyon insan tarafından kullanılan Kürtçe, devletin denetimi altında reddediliyor ve yok ediliyor. Bu bir dil kırımıdır, etnik bir soykırımdır. Kürtçe konuşan, yazan, okuyan herkes şiddete maruz kalıyor.

Dil kırımının etkileri eğitim alanında açıkça görülmektedir. Bu durumu betimlemek için anadili Kürtçe olan bir arkadaşımın yaşadığı bir olayı anlatmak istiyorum:

“ İlkokula başlayacaktım, çok mutluydum. Köyümüze yeni gelen öğretmen evlerimize gelerek okula kaydımızı yapmıştı. Ve sonra okul başladı. Sınıfa gittim ve okuma yazmayı öğreneceğim için çok

heyecanlıydım. Öğretmen bizi konuşmak için çağırdı ve sorular sordu; fakat öğrenciler öğretmenin ne söylediğini anlamıyorlardı, sadece sorularına gülerek cevap veriyorlardı.

Sonra öğretmen beni çağırdı, beni işaret etti ve ben onun yanına gittim. Öğretmen sordu:

- Adın ne?

Ben anlamamıştım, sıkılmıştım ve gülüyordum.

Öğretmen sorusunu tekrarladı.

- Sessiz duramadım; fakat öğretmenin ne söylediğini anlamamışım. Bu yüzden öğretmenin söylediğini tekrarladım.

Bu sefer, öğretmen de güldü.

- Daha sonraları, öğretmen bize yeni dilde yeni kelimeler öğretmeye başladı. Bu yeni dil ile hiçbir şey eskisi gibi değildi. Sessiz kalıyorduk, her şey birden yabancılaşıyordu bize. Ve hep geride kalıyorduk.”

Anadilleriyle yetişen ve yaşayan Kürt çocukları, yedi yaşına geldiklerinde, Türkçe’yle ilk olarak okulda karşılaşıyorlar. İlk karşılaştıklarında, bu farklı dili kullanmayı ne kadar reddetseler de, kendi anadillerini geliştirmek için bir şansları yok. Kendi anadillerinde eğitim veren eğitim sistemi, yayınlar, radyo, televizyon yok ya da bu kaynaklara ulaşım çok zor.

Türkiye Cumhuriyeti heterojen bir toplum ve bu toplumdan bir Türk ulusu yaratılmaya çalışılıyor. Dil politikaları, insanlar arasında iletişim kurmak için en iyi yol ve eğitim alanı da, bu politikaların uygulanacağı en uygun alan!

Sonuç

Fransa’nın dil politikalarını hatırlayacak olursak, Fransa federal ve yerel sistemleri kabul etmiyordu. Türkiye Cumhuriyeti’nin yapısı da, Fransa’nın yapısına benzemektedir. Fakat, Fransa’da insanlar kendi anadillerinde eğitim hakkına sahiptirler, bu ne yazık ki, Türkiye’de Kürtçe eğitim, Kürtçe yayınlar kabul edilmemektedir. Türkiye’de anadili Kürtçe olan birçok insan var ve bu Kürtçe’nin

resmi olarak kullanımının gerekliliğini göstermektedir; çünkü dilin kullanım alanlarının genişlemesi insanların daha fazla ürün vermesini sağlayacaktır.

80 yıllık asimilasyon politikalarından sonra, Kürtçe Avrupa Birliği tarafından kabul edildi. Bu bağlamda, Kürtçe dil kursları açıldı. Anadili Kürtçe olan insanlar kendi dillerinde eğitim yapma hakkına, dillerini, kültürlerini geliştirme hakkına sahipler, bu hakları elde edebilmek için dil ve eğitim alanında bir takım değişiklikler yapılması ve devlet tarafından desteklenmesi gereklidir. Bu sorun, Türkiye’de yaşayan tüm insanların sorunudur, Türk, Kürt veya diğer uluslardan insanların sorunudur.

Kaynakça

- Amir Hassanpour, *Kürt Dili ile ilgili Devlet Politikaları, Dil Politikaları, Türkiye, Avesta Yayınları, 1997.*
- Hüseyin Sadoğlu, *Milliyetçilik ve Dil Politikaları, Edebiyat ve Dil, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 2003.*
- Ernest Gellner, *“Uluslar ve Milliyetçilik”, Cornell University Press, 1992.*
- Gülççek Günel Tekin, *Dilimiz Kimliğimizdir, Dil Hakları, 2002.*
- Ed. By Prof. Dr. Fatma Gök, *75 Yılda Eğitim, Tarih Vakfı Yayınları.*
- Said Verroj, *Avrupa Birliği Sürecinde Kürt Dili ve Eğitim Hakları, 2003.*
- Pulat Tacar, *Kültürel Haklar ve Türkiye Politikalarına Bir Öneri.*
- Alişan Akpınar, *Osmanlı Döneminde Yatılı Bölge Okulları, Aram Yayınları, 2001*

PARASTÎN û GUHERÎNA ZÎMÊN:

Destpêkek bo Çarçoveyên Teorîk ên Parastin û Guherîna Zimên û Hin Împlîkasyonên Wan li ser Rewşa Zimanê Kurdî

Ergîn Opengîn

1. Destpêk

Wekî ku li her kesî ve eyan e zimanê kurdî ligel Îran û Sûriyeyê li Tirkîyê jî bêpar e ji her cure piştgirî û handanê. Berevajî, wan dewletan, heta radeyekê Iraq jî tê de, carinan bi dizî û kirî be jî, gelekî bi plan û stratejî tim doza lawazkirina zimanê kurdî û guhartina zimanê kurdan a ser zimanên xwe ve, kiriye. Rewş û dînamîkên parçeyên din ji ber egera pratîk a spesîfîkbûnê li derveyî mijara vê gotarê, li Tirkîyeyê hêzên kurdan ên polîtîk ên serdest û kom û şexsên rewşenbîr tim bi vê diyardeyê (fenomen) hesiyayî bûne, lê heta wan salên dawî ku êdî polîtîkayên dewletê yên pişaftinê ên rapêçer, û bêtevdîriya kurdan, encamên xwe yên xweristî û jênager raxistine mexderê û her wiha di polîtîkayên hêzên serdest ên kurdan de gelek guherîn pêk hatin, meyl û girîngiyeke pir zêde li ser mijara rewşa zimên û axêverên zimên berhev bû ku êdî ji sînorên propagandayê xwe bi xwe û acizker ava bûye, û bûye benîştê devê her kesê ku dixwaze bi xwe û binivîse. Piraniya argûmanên hêzên kurdan ên serdest êdî li ser zimên in û her wiha di nava gel bi xwe de jî kêma zêde dikare behsa hişyariyê ji wî layî ve bê kirin. Lê belê, ligel ew hind nîqaş û girîngiya li ser zimên, belawelayî û bêplaniyê aşkera heye di nava tevger û aktîvîzma zimanê kurdî de. Bi ya me konferansa 'Parastin û Perwerdehiya Zimên' a ku di 18-19'ê meha sermawezê de li Amedê hate lidarxistin jî, nekarî perspektîf û formûlasyonên nûjen û zanistî û pratîk pêşkêş bike; encamnameya konferansê dîsa zêde jî ji bang û bangewaziyên her çî sazî an jî rêxistineke polîtîk wêdetir neçû. Gelek kes meseleyê wekî 'çî bê kirin jî ji çîneyî çêtir e' dinirxîne lê wekî ku Crystal (2000) diyar dike, helwesteke wiha ji xêrê zêdetir zerarê digehîne zimên ku ew çend wext e ev rastî ji aliyê çend weşangerên kurd ên şareza ve jî hatiye piştrastkirin. Ji bilî çend gotarên nisbet bi yên din birêkûpêktir çî plan û pêşniyar nayên kirin ku bi ya me sebebê wê yekê

bêhaybûna giştî ya ji literatûra çarçoveyên teorîk ên bi mijarê re eleqedar û pêşniyar û argûmanên pratîk e. Ji ber heman bêagahiyê ye ku hêj jî pêngava ewil a teswîrkirina rewşa heyî bi daneyên quantîtatîf (çendanî) nehatiye kirin lewre jî hemû argûman û tespîtên ku têne kirin sûbjektîf in û ji layê zanistî ve bêpalpişt in. Her wiha her çi tevgereke xwedanê armanca sîstematîkî û zanistiyê, divê plansaziya xwe ji analîzên rewşa heyî bide destpêkirin.

Bi vê gotarê em dê hewl bidin ku ji têgeha bingehîn a 'xetereya bo zimanekî' (language endangerment) û sîmptomên wê yên sereke dest pê bikin û argûmanên layengiriya parastina zimên bi çend paragrafan pêşkeş bikin û paşî çend çarçoveyên teorîk bi kurtî rave bikin û rewşa kurdî bi yek ji wan çarçoveyên teorîk, Jîndariya Etnolînguîstîk a Giles (1977) ku di 1977'an de weşand, analîz bikin. Ji bo bercestekirina analîz û raveyan em dê li cihînan daneyên lêkolîneke hêj nehatî sepandin bidin.¹ Bi vê gotarê hêviya me ew e ku em xizmetê lipey dakirina "bersiveke zanistî, sîstematîk, fêambar û dikare pêk were" (Çîçek 2006) bikin ji bo pirsra 'divê em çi bikin'. Danîna rênexseyeke şênber li derveyî çepera vê xebatê ye.

2. Xetereya bo zimên

"Nîşaneyên lawazbûna zimên (language decline): Zimanekî ku lawaz dibe, çepera erdê wê teng dibe û axêverên wê yên yekzimanî (monolingual) her ku diçe kêmtir dibin. Kesên ku pê diaxivin dibin duzimanî (bilingual) lewre bi pêwîstiya fêrbûna zimanê serdest (dominant, fireh) dihesin. Ew gelheya duzimanî jî her ku diçe zêdetir pîr dibe. Zimanê serdest têdikeve nav her zêdetir 'qadên jiyane' û her wiha her ku diçe xwe li ser zêdetir 'fonksiyonên zimên' ferz dike. Zimanê bindest (dominated language) her kêmtir tê bikaranîn û nihayet bi şiklê 'zimanê malê' dikeve nav xetereyê. Tê heye diglosia² (diglossia, du-glotî), bo demekê hukmî bike bi şiklê ku her zimanekî qadên xwe yên bikaranînê hebin, lê belê bes heke ew rewşa diglosyayê sabît nebe, zimanê serdest dê dewamê li meşa (pêşketin) xwe bike." (Wardhaugh 2002: 19)³

Berî ku em bikevin nav kîtekîten mijarê çêtir e ku em der barê xetereya bo zimên de bibin xwedan agahî û feraset da ku bi awayekî tîtîz û birêkûpêktir boçûnan bi pêş bixin. Lewre ev beş dê li dût bersivên wan pirsan be: 'Dixetereyêdebûna zimên

(language endangerment) çi ye?', 'Mirov çawa dikare tê bigihe ku zimanek di xetereyê de ye?', 'Ast û merhaleyên xetere û metirsiyê çi ne?', 'Sîmptomên sereke yê xetereya bo zi mên çi ne?'

Dema behsa xetereya bo zimên tê kirin, mirov bi rihetî dikare çend fikrên gelemperî derpêş bike wekî, axêverên zimên kê m dibin û fonksiyonên wî zimanî kê m dibin û hwd. Lê belê li gorî David Crsytal'î (2000) tiştê zehmet diyarkirina sînorên xetereyê ye; gelo piştî çend axêveran êdî behsa xetereyê ji holê radibe? Zimanekî ku bes 100 axêver lê mabin teqez di xetereyê de ye lê Brenzinger (1998:93) zimanê Yoruba ku gelheyeke 20 milyon mirovî pê dipeyive jî dixê nav zimanên di xetereyê de ji ber serdestiya îngiliziyê di perwerdeya bilind de. Ji ber vê hindê, mirov nikare asta xetereyê rasterast hejmaraxêveran ve girêde, lewre pê gelek faktorên din e ew mijar, bo nimûne, 'rêjeya fêrbûna zarokan a wî zimanî, helwesta gelî ya li hemberî zimanê xwe, bandora zimanên din ên ku zererê didin wî zimanî' û hwd. Dîsa jî danasîna Kincade'î (1991:160-3) gelek tiştan lê zelal dike ku wiha dibêje: "Zimanekî di xetereyê de ew ziman e ku têra jiyînê axêver lê hene lê belê ji bo ku bijî pêdivî bi şert û mercên guncan û piştgiriya civakî heye".

Bi awayekî gelemperî ziman wekî zimanên ewle, di xetereyê de û winda tene dabeşkirin (kategorîzekirin) ku Micheal Krauss (1992:4) nosyona 'moribund'ê lê zêde dike ku ew zimanên moribund êdî wekî zimanên zikmakî nayên fêrkirin li zarokan (Crystal 2000). Yanî di wan zi-manan de veguhestina navnifşî (intergenerational transfer) ji beyn (navê) çûye. Senifandina Wurmî (1998:192) hindekî cudatir e ji yê din ji ber ku bi tenê ji bo zimanên lawaz hatiye duristkirin ku bi ya me pêşkeşkirina wê girîng e.

Zimanên bi potansiyela xetereyê: Ew ziman ji layê civakî û aborî ve bi dezavantaj in û di bin pêkutiyên dijwar ên zimanekî firehtir de ne û her wiha zarokên ku wan zimanan wekî makeziman fêr dibin hêdî hêdî kê m dibin.

Zimanên di xetereyê de (ji niha pê de ZX): Kê m an jî tu zarokên ku wan zimanan fêr dibin nîn in, axêverên herî temenbiçûk ên bi wî zimanê dizanin, ciwan in.

Zimanên di xetereya dijwar de: axêverên herî temenbiçûk ên wî zimanî dor 50 an jî zêdetir salî ne.

Zimanên 'morîbund': Bi tenê çend axêverên baş lê mane ku ew jî bi piranî pîr in.

Zimanên qeliyayî: Tu axêverên wan nemane.

Ev senifandin helbet jî bo têgihîştineke berfirehtir pêwîst e, lê belê bi ya me bi tena serê xwe têr nake ku mirov zimanan bi awayekî têkûz bixe nav wan pênaseyan. Lewre em dê niha semptom û taybetiyên xetereya bo zimanan û zimanên di xetereyê de rêz bikin. James Crawford (1996) di gotara xwe ya ku tê de jî bo sebeb û çareseriyên windabûna zimanan heft hîpotezan pêşkêş dike de, wekî sîmptomên ZX wan xalan destnîşan dike:

- Hejmara axêverên ZX dadikeve;
- Kesên salmezî dikarin bi awayekî rewan bi axivîn, ne yê ciwan, jî ber ku ciwan zimanekî dîtir tercîh dikin (bi piranî zimanê civaka serdest);
- Bikaranîna zimên a di 'qadên jiyane' ên ku caran (berê) ewle bûn, kêr dibe. Bo nimûne, li dêr, helkeftên çandî, dibistan, û ji hemûyan girîngtir li malê;
- Hejmareke her zêdetir ê dayikbavan nikarin zimanê xwe fêrî zarokên xwe bikin.

Ligel çar xalên li jor mirov dikare wan sîmptomên hanê jî wekî nîşaneyên ZX bihesibîne: jî layê lînguîstîkî ve fonksiyonên zimên kêmtir dibin heta ku hindêk jî wan fonksiyon namînin û hindêkên din jî bi zimanekî dîtir tene bicihanîn; di struktura zimên de gelek guherînên neyînî pêk tên bo nimûne gelek rewşên têkhelebûna kodan (code-mixing) tên dîtîn. Di wan têkhelebûna kodan de piranî taybetiyên zimanê di kontaktê de (contact language) tevli zimên dibin û çawanî û bikaranîna zimên qels dikin. Her kes wan cure axaftinan dibihîze li derdora xwe ku tê de lêkerên bi formên tirkî hatine kişandin û peyvên fonksiyonan wekî yalîz, sadece, daha xweş û hwd. pîr in. Pîrbûna peyvên fonksiyonan⁴ bi xwe, di struktura zimên de xetereyeke têra xwe mezin e lê bi ya me êdî di kurdî de diyardeyên di lîteratura zimannasiyê pîr kêr qewimî pêk tên. Bo nimûne, Odlin (1989: 82) diyar dike ku transfera morfemên bestî/girêdayî⁵ (bound morphemes) pîr zehmet e û peydabûna

wan a di zimanan de tişteki awarte ye. Lê bihîstina hevokên weki 'mêze eger hatibise bêje min' qet ne zehmet e di kurdî de, her wiha dîsa morfema bestî ya bi tirkî 'miş (bi qewlê kurdan 'miş')' bûye alîkarê herî mezin ê piraniya kurdîaxêvên li Tirkîyeyê. '-se' û '-miş' her du jî morfemên bestî ne û têkelbûna wan a bo zimanekî din ne tişteki asayî ye lê xuya ye ku 'rewşa kontakta zimanan' a tirkî-kurdî gelek zerarên bingehîn dane kurdî ku ew morfem û hêj gelekên din êdî bûne malê kurdî.

Ji bo tespît û têngiştina sîmptomên di halê hazir ê zimên de heyî tecrûbeyên her kesekî helbet mimkûn dike ku gelek fikr û boçûn bîn bipêşxistin lê ji bo sepandin û analîzkirineke têkûz a wan xalên der barê ZX de divê daneyên statîstîkî hebin ku fikr û encamên ku em ji rewşa heyî derdixin ji sûbjektîfîyê derkevin. Nexwe her kesek ji me dikare bes ji çavdêriyên xwe yê li derdora xwe bidêre ku ew her çar xalên li jor destnîşankirî û dirêjahiya nîqaşa sîmptomên xetereyê, di nava kurdan de meyleke qewî ye. Ji ber vê hindê di vê beşê de bes ji bo têngiştineke baştir em ê weki mînak kurteanalîzeke encamên çend anketan pêşkêş bikin da ku bi acîlî û ferzbûna lêkolînên zanistî î spesîfîk bêtir diyar bibe.

Di tabloya li jêr de bikaranîna zimên a li gorî kesê/a ku pê re tê axaftin (interlocutor) hatiye pirsîn. Ew tekilî kême zêde di jiyana her kesî de hene, lewre di wan têkiliyan de tercîhên li ser bikaranîna zimanê axaftinê, zimanê serdest ê da-nûstandinê

mirovî jî heta radeyeke bilind pêş dibînin.

Axivger	Temen	Zayend	Ligel xwîşk û birayen	Ligel xizman	Ligel haywanan	Ligel herwanên neztik	Ligel zarokan	Ligel karmendên dewletê
A	54	M	K	K	K	K	K	T
B	40	M	K	K	K	KT	T	T
C	28	J	K	KT	K	KT	KT	T
D	18	J	T	KT	KT	K		T
F	12	M		K	KT	K		T
E	9	M	T	T	T	T		T
G	7	M	T	T	T	T		T

Tablo.1⁶

Wekî ku mînakên di tabloyê de diyar dikin ku li gorî temen bikaranîna zimên diguhere. Tekane tîkiliya ku sabît maye 'ligel karmendên dewletê' ye, di yê din de di rexê kurdî de guherîneke zimên heye ber bi tirkî ve her ku temenê beşdarîna biçûktir dibe. Heke tîkiliya statîk nehesibînin di hemû cure tîkiliyên din de ji bo kesên salmezîna zimanê kurdî zimanê serdest e, di temenê navsere de bi qasî hev e bikaranîna her du zimanan û ji bo her du zarokên dawî tu cihê kurdiyê nemaye êdî.

Windabûna zimên (language loss) zêdetir bi wateya windabûna zimanekî ji bo kes an komekê tê bikaranîn. Dema ku ziman li seranserî welatê xwe wînda dibe û tu kesê ku pê biaxibe nemîne, hingî ew dibe 'mirina zimên' (language death). Li gorî wan pênasayan mirov dikare tê derxe ku windabûna zimanekî li nav civakê, ji bo wê civakê mirina wî zimanî ye. Lê belê, bo nimûne em li rewşa kurdî bi gelemperî bifikirin, her çend mirov bikare behsa mirineke di çarçoveya zimanê şexs û koman de bike jî mirov nikare wê tespîtê ji bo zimanê kurdî bi giştî bike, lewre li vir nebe jî li başûrê Kurdistanê zimanê kurdî jîndar e û tu behsa mirina wî li wir nîn e. Ji ber vê hindê terma mirina zimên ku gelek kes ji bo kurdî bi kar tînin, wisa diyar e ku ne durist e. Niha heke em piştî

vê kurtenirxandina terman dîsa li tabloya xwe binêrin, em dibînin ku meyleke guherîna zimên heye bi ser tirkî ve. Veguhestina zimên a navnifşî qut bûye û ji bo kesan halê windabûna zimên xuya ye, lê tu împlîkasyonên mirina zimanê kurdî jê nayên derxistin.

Di heman lêkolînê de, ji bo pirsên der barê bikaranîna zimên a di qadên jiyanê de encamên ligel yê tabloya jorîn paralel, hatine bidestxistin. Bi qasî ku temenê beşdarî mezin be, rêjeya giştî ya axaftina di qadên jiyanê yê wekî navmal, tax, sûk, listik, kar, dibistan, dawet, serdanên cejn û xizman, cenaze, daireyên dewletê (wekî nexweşxane, şaredarî, walîtî), medya, çapemenî, weşan de jî bilind bû û bi daketina temen re rêjeya bikaranîna zimên a di wan waran de jî diket. Ev encam helbet ne diyarker in ji bo rewşa kurdî, lê belê ji bo teswîrkirina xwezaya xetereya bo zimên daneyên girîng in ku ew derbirîna Mari Rhydwenî (1998) jî bi heman awayî balê dikêşe ser faktora takekesî û guherîna reftarên jiyanî di windabûna zimên de:

“Windabûna zimên ne windabûna têgehekê ye, lê bêtir ew tişt e ku dema mirov tevgerên xwe diguhêrin û zimanê xwe venaguhêze zarokên xwe, pêk tê. Bi tevahî mirovan re girêdayî ye û nabe wekî pirsgerêkeke entellektuelî mudaxale lê bê kirin bo çareserkirinê.”

3. Çima em zimanê xwe biparêzin?

“Ez fêrî zimanê xwe nehatibûm kirin. Dayika min dibêje ku bavê min nexwestiye em fêr bibin, ji ber ku di dibistanê de wî dîtibû ka hevtemenên wî çiqas zehmetî kêşaye ji ber ku ew ewil fêrî Hualapi bûbûn û zimanê dibistanê bi tevahî îngilîzî bû. Lewre jî ez û birayê xwe nehatibûn fêrkirin.

Ez xwe temam hîs nakim... Carinan xwe ji hevtemenên xwe dûr hîs dikim, ji wan ên ku di temenê min de ne û bi zimanê min diaxivin û dizanin ku ez bi zimanê xwe nizanim. Ku li nasnameya xwe germ bûm û bi kêmasiyên xwe hesiyam, ez ji zarokên îro re dibêjim ku heke hûn bi zimanê xwe nezanim hûn ê jî wekî min hîs bikin.” Ciwanekî Hualapanî (Amerîka), (di nav. Hornberger 1996: 101).⁷

Em çima zimanê xwe biparêzin? Ev pirs, di çavpêketina ewil de wekî pirseke gelekî hêsan û asayî tê hizra mirov, lê belê di rastiya

xwe de yek ji mîhengên her tevger û liveke bo parastina zimên e bersiveke birûkûpêk û qanihker a vê pirsê. Lewre em gelek caran nas û xizmên xwe dibînin ku bi tirkîyeke pir şkestî û lawaz diaxivin lê belê heman kes li xwe danaynin zimanê xwe fêrî zarokên xwe bikin. Ew helwesta bidûrxistina zarokan ji zimanê xwe, ew qas berbelav e ku di nava kesên xwedan hestyariya neteweyî de jî heta bi dereceyeke mezin tê dîtin. Gelek caran em jî vê yekê bo wan wekî tercîha wan qebûl dikin û xwe xûs dikin, ligel ku dilmayîn jî çêdibe û carinan jî dema ku ligel wan dikevin nîqaşa girîngiya zimên, di destê me de argûmanên xurt nîn in ku pê wan qanih bikin.

Ez bi xwe li Stenbolê şahidê diyalogeke wiha bûm ku vê rewşa heyî pir baş dinimîne: Zilamekî dilxwazê zimanê kurdî dixwaze nasekî xwe teşwîq bike ku zarokê xwe fêrî kurdî bike û wiha pê de diçe: 'Binêr keko niha bizane sibe dusibe kurê te mezin bû û xwest here Diyarbekirê cem xizmên xwe, hingî ew ê çawa bi zarokên min re biaxive? Ew ê pir nexweş be ji wî re ha.' Gelekî aşkera ye ku ew argûman sernagire û nasê wî jî qanih nake, ji ber ku zilam jî nasê wî jî dizanin ku wan (zarokên wan) zimanekî hevpar heye ku pê têkiliyê daynin û ew jî zimanê serdestan e. Ji ber vê hindê, niha pêde nabe ku argûman li ser hêza zimên a wekî 'tekane navgîna têkiliyê' be, ji ber ku ne rast e.

Argûmanên wisa divê bêne bipêşxistin ku di rewşa duzimanî de jî tercîhê bixe ser zimanê zikmakî. Ew argûman li layê Crystal (2000) ve wiha têne rêz kirin: pêdiviya bi cudahiyan, ziman wekî nimînerê nasnameyê, ziman wekî bîrên dîrokî, bexşa zimên a bo sercema zanyariyên mirovatîyê. Belê berî her tiştî divê argûmana sereke ew be ku ziman, 'tekane navgîna kifşkirin û peydakirina tiştên mexsûs bi mîrata gelekî' ye (Crystal:2000). Dema em ji yekî/ê re behsa muhafizekirina zimên dikin, divê pê bidin hesandin ku mîrata me ya herî xwerû û xweser e ew. 'Mileteke bê ziman mileteke bê dil e' dibêje pendeke Welsh'an, û Zana Farqînî tiştêkî nêzî wê pendê derdibire û dibêje 'Ziman hestiyê piştê yê neteweyan e'. Dîsa gotineke din digot ku 'her zimanek perestgehê e ku bi ruhên wan kesên ku bi wî zimanî diaxivin neqîşandî ye'. Bi vî rengî hêza zimên a di tayînkirin û peytandina

nasnameya gelekî de dikare were bipêşxistin ji ber ku nasname ye ku endamên civakê dide nasîn û taybetiyên 'me' û 'wan' pêk tîne (Crystal 2000). Qîmeta zimên a di bargîriya wî ya dîrokî de dîsa pir girîng e. Yekî ku bi qestî xwe ji zimanê xwe dûr dixê bi awayekî xwe ji dîroka xwe jî dûr dixê, heta xwe jê cuda dike. Dîsa fêrbûna her çend zêde zimanan argû-manêke din e. Lewre kesên ku bi zêde zimanan dizanin di nav hemû civakan de wekî kesên rew-şenbîr û şareza tîne nasîn û her wiha lêkolînên li ser babeta norolînguîstîkê çespandiye ku kesên ku bi du yan zêdetir zimanan mezin dibin an jî piştî fêr dibin, ji aliyê mêjiyî ve xwedan performansekê çêtir in. Jê wêdetir, rewşa kurdî ya stratejîk dikare bibe argûmanêke pragmatîk. Kurdî, her çend cudatîyên zaravayan pîçekî bi arîşe be jî, di nava sînorên çar welatan de xwedan cografyayêke fireh e û statûya wî li Başûr her ku diçe baştir dibe. Gelek zanîngêhên Başûr bo ciwanên kurdan bûne deriyên alternatîf. Bazirganiya di navbera wan dewletan dîsa faktoreke girîng e. Argûmanên bi vî rengî pragmatîk dikare bêne zêdekirin.

4. Çend çarçoveyên teorîk ên parastin û guherîna zimên

Dibe ku gelek kes ji aliyê xwe ve rêyên çareseriyên daynin ji bo parastin û berlêgirtina guhe-rîna zimên û tevgerên zimên ên sistematîk wekî karên beredayî bibînin û bibêjin ku 'heke tu bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivî wa ye zimanê te ji xeterê xelas bû'. Di nav kurdan de jî kesên ku wiha difikirin hene û di payeyên bilind de ne jî, lê lazim e ji wan bê pirsîn 'gelo mirov heta çî radeyekê azad e di tercîha hîlbijartina zimanê têkiliyê de di konteksteke duzimanî an jî pîrzimanî de?' 'Dayikek çawa dikare zarokê xwe wisa mezin bike ku zarok nekare bi dapîra xwe (ku dayika dayîkê bi xwe ye) re biaxive?' 'Çawa gundiye ku bi egerê ji egeran berê wî ketiye bajêr û mala xwe li wir daniye, ligel ku jê re wekî îşkenceyê ye jî dixwaze zimanê malê biguherîne ser zimanê serdest?' Pirsên bi wî rengî dikare bêne zêdekirin lê xuya ye ku dînamîkên ne ew qasî basî hene di paşxaneya wan de. Der barê wê xalê de, tespîta Bradley (2002:1) fikreke çaktir e bêguman ku dibêje, 'Piraniya sosyolînguîstan (zimanzanên bi aliyê civakî yê zimên ve dilepikin e.o.) diyar dikin ku mi-rîna zimên ne ji ber devjêberdaneke (devjêberdana bikaranîna zimên e.o.) basî a

di navmalê de ye, lê bêtir, ew devjêberdan ji ber guherîna helwesta li hember prestîja zimên e'. Lewre ji bo têgihîştina dînamîk û xwezaya guherîna zimên ku prestîjê jê kêm dike û bi wê têgihîştinê jî duristkirina tevgerên parastina zimên, pêdivî bi çarçoveyên teorîk heye ku tu tiştî li derve nehêle û dema li ser wan mijaran dest bi kar û xebatan tê kirin, mirov dilrihet be, piştî xwe bispêre formûlasyonên ji tecrûbeyên cihê pêkhatî.

Bi ya me di wê mijarê de tespîteke bikêrhatî jî ya Fishmanî ye (1991) ku dibêje: 'bêyî veguhestina navnifşî, tu parastina zimên ne mimkûn e; her wiha bêyî parastina zimên (qest tevgereke bi hişmendiya parastina zimên e, e.o.) çavkaniya hewlên veguhastina navnifşî tim dê zeîftir û biçûktir be'. Wêdetir li gorî Crystal (2000: 93) divê ew kar di nav çarçoveyê teorîk de bêne kirin, ji ber ku ew ê 'rêberiyê li tespîtên li ser rewşa heyî û nirxandin û teşhîsa wan bike'; her wiha çarçoveyê bi wî rengî 'dê mimkûn bike ku têkiliyên di navbera faktorên xetereyê tînin de diyar bikin', û 'dê bihêlin ku der barê asta xetere/daketina/lawazbûna zimên an jî rewşa vejînê de hîpotezên ampîrîk pêk bên'. Lê belê wekî Fishman (1991:87) diyar dike ku 'di babetên civakî de tu carî dermanekî bo hemî derdan nîn e' lewre ji bo peydakirina çareseriyên rasteqîne divê rewşa heyî gelekî baş û hûrgulî bê analîzkirin.

Di hejmarê 7'an a ZEND'ê de birêz Cuma Çiçekî (2006) hewleke bi wî rengî dabû û bi ya me gelekî birêkûpêk bû jî, lê belê ji ber ku zêdetir bi şiklê analîzên sûbjektîf bûn û tu sûd ji teoriyên heyî wernegirtibû, gotar, wekî analîzeke hûr û kûr lê ne têra xwe berfireh mabû. Di vê beşê de bi mebesta ku bi ronîya wan teoriyan analîzên berfirehtir bêne kirin em ê çend çarçoveyên teo-rîk û kurteşîroveyên li ser sepanînên objektîf ên rewşa kurdî bidin.

4.1 Çarçoveya Teorîk a Bradleyî

"Biryara 'dev ji zimanê xwe berdanê', her gav, ji guherîneke di 'xwe-bawerîya' civakê de dertê. Di rewşên guherîna zimên de, mirov dikare bibîne ku endam, pirî caran nifşên nû yên civaka hindikayî, civakên xwe biçûk (inferior) dibînin. Ew endam pirî caran, bi xwemalkirina (adopt) zimanê (û nasnava civakî) gruba serdest, hewl didin ku nasnava xwe ya civakî ya 'negatîf' biguherînin... Bi vî awayî, divê guherandina zimên wekî stratejiyê guhartina pozîsyona xwe ya 'negatîv' a wan kesan bê

qebûlîkirin ku nasnava xwe ya civakî, negatîf dibînin. Di rewşên ku ev stratejî ji aliyê hemû endamên civaka zimanekî bê bijartin de, mirov dikare ji navê rabûna zarê kevn bipê.” (Brenzinger, Heine û Sommer 1991:38)

Di wê jêwergira li jor de diyar e ku prestîja zimên a hem di nava civaka serdest û hem jî ya di nava civaka zimên bi xwe de gelekî girîng e; heta belkî girîngtirîn faktor be ji bo diyarkirina rêje û coşiya bikar(ne)anîna zimên. Yanî, her çend ‘dev ji zimên berdana’ li navmalê wekî sersebebê guherîna zimên bê dîtîna jî, divêt li bingeh û rîşeyên wê diyardeyê bîna kolan û ew diyardeya derasayî bê analîzkirin. Di lîteratûrê de guherîna helwestên axêveran li hemberî zimanê xwe ji ber kêmprestîjiya zimên, wekî sebebê sersebebê proseya ku bi ‘guherîna zimên’ ve encam dibe, tê nîşandan. Zimanên xwedan kêmprestîjîyê ku tûşî guherîna tîna jî, ew ziman in ku li gund û cihên gundewar mirov pê dipeyivin û bi taybetiyên xwe yê wekî statûya hindikayî de bîna; modêleke aborî ya kevn-xerab, statûya hindikayî, statûya polîtîk a duhemî (bindest), dînen tradîsyonal, şeweyîyanên tradîsyonal, [an jî] karên lipaşmayî tîna nasîn; û di perwerdeya fermî de yan qet an jî pir kêmprestîjîyê bikaranîn (Brenzinger et al. 1991:38).

Pênc faktorên ku Bradley ji bo diyarkirina prestîja zimên û bi wî awayî jî têgihîştina rêyên domandina bikaranîna zimên, destnîşan dike ew in: statûya hindikayî; derfet û beşdariya li bazar û saziyan; hêza çandî; perwerde; û koçberî (Bradley 2002:1). Helbet girîngiya her yek ji van faktorên ne wekî hev e û her wiha ji bo kontekstên cuda girîngî û diyarkeriya her yekê dê cuda be. Lê dîsa jî hin hîpotezên giştî hene der barê wan de. Li gorî angaştekê, nîfûseke zêde ya axêveran, an jî statûyeke sivik a hindikayiyê, îhtimala veguhastina zimên zêdetir dike. Duyem, derfet û beşdariyeke zêde li bazar û saziyan, ligel kêmtir bikaranîna zimanê zikmakî di korelasyonê de ne (paralel in). Li gorî hîpoteza sêyem, cihê ku hêza çandî zêf dibe, hêza zimanî jî zêf dikeve ligel wê. Çarem, asteke bilind a perwerdeya bi zimanê serdest dikare bibe sebebê zêdetir windabûna zimanê zikmakî. Dawî, wisa tê bawerkirin ku koçberiyê zêde, ligel xwe bikaranîna zimanê hindikayî jî kêmtir dike (Hawkins û John 2001).

4.2 Bervajîkirina Guherîna Zimên

Di xebata xwe ya giranbiha ya bi navê 'Reversing Language Shift' (Bervajîkirina Guherîna Zimên, (ji niha pê ve BGZ) de, Joshua A. Fishman (1991) bingehên teorîk û azmûnî datîne ji bo xebatên li ser ZX. Berî ku têkevin nava kitekitên formûlasyonên wî yên teorîk me divê çend îdiayên wî yên pratîk pêşkêş bikin. Li gorî Fishmanî her zimanek ji bo pêdivî û nasnava civakekê hin fonksiyonan bi cih tîne ku ew fonksiyon bi zimanekî dîtir ne mimkûn e bi cih bîn. Di konteksteke 'kontakta zimanan' (language contact) de ew fonksiyon têkel dibin; gelek caran zimanê serdest piraniya fonksiyonên zimanê civakê vedigire. Lewre her çî hewlên BGZ divê ber bi parastina wan cudahiyên fonksiyonên mexsûs ên zimanan be. Wate, di konteksta duzimanî an pirzimanî de divê fonksiyonên her zimanekî bêne parastin û bi qasî ku mimkûn be ew fonksiyon têkel nebin. Bi vî awayî duzimanîyeke stabîl û sabît û hevseng dikare bê peyitandin. Ev xal pir girîng e bi ya me, ji ber ku ji bo zimanekî civakeke bîndest ne mimkûn e ku doza yekzimanîya bi zimanê xwe bê kirin, lewre ne helwesteke realist e; lê belê doza pêkanîn û parastina konteksteke duzimanîyeke hevseng dikare bê kirin, wêdetir, ji bo zimanê hindikayî tekane rê jî ev e jixwe.

Dîsa Fishman diyar dike ku divê xebatên BGZ di du eniyan de bêne kirin, yek, plankirina kuliyatê (corpus planning) û yeka duyê jî plankirina statûyê. Dema hin mirov xwe bi rêk dikin ku li ser fonksiyonên civakî yan jî nav û nasîna zimanekî tiştinan bikin, karê wan dibe 'plankirina statûyê'; û dema armanca wan têxebitîna li ser peyv (vocabulary), bilêvkirin an jî her çî aliyê dîtir ê zimên be, ew bi karê 'plankirina kuliyatê' radibin. Hewlên BGZ divê xwe bêxin bin barê wan her du eniyan bi hev re.

GIDS a (Graded Intergenerational Disruption Scale: Skalaya Qutbûna Navnîfîşî) Fishmanî ji heşt astên rewşên zimanan pêk têt. Bi vî tabloyê cihê zimanekî di xetereyê de ango asta wî ya metirsiyê tê tespîtkirin. Bi wê tespîtê mirov dikare taybetiyên rewşa zimanê xwe û yek û yek qede-meyên ku divê mirov pê re hilkişe bibîne. Li gorî wê formûlasyonê, asta GIDSê çend bilind bibe berdewamiya navnîfîşî (intergenerational continuity) û

îhtimala parastina zimên a kom an civakê ew hind dadikeve/kêm dibe.

Layê zêf	Ast 8	Ew qas kêm axivger mane ku divê civak norm û rêzikên zimên ji nû ve ava bike; gelek caran pisporên ji derve pêwîst in (mn. lînguîst).
	Ast 7	Nîfşên mezin bi coş û kêfxweşî zimên bi kar tînin lê belê zarok fêrî zimên nabin.
	Ast 6	Sosyalîzebûna zarokan a zimên û nasnameyê di nav mal û civakê de pêk têt.
	Ast 5	Sosyalîzasyona zimên piranî li ser xwendin û nivîsandinê ye, gelek caran bi şiklê fêrkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê yekem di dibistanên ne-fermî de.
Layê qewî	Ast 4	Zimanê yekem ligel zimanê neteweyî yan fermî di perwerdehiya fermî de tê bikaranîn.
	Ast 3	Zimanê yekem di qada karxaneyên civaka firehtir (serdest) de, li derveyî sînorên zimanê yekem, tê bikaranîn.
	Ast 2	Xizmetên hikûmetî (dewletî) yên sivik (bingehîn) û medyaya herêmî vekiriye bo zimanê yekem.
	Ast 1	Zimanê yekem di asta herî bilind a hukûmetî (dewletî) de tê bikaranîn.

Tablo 2. Adaptasyona Skalaya Qutbûna Navnîfşî ya Fishmanî (Graded Intergenerational Disruption Scale) (Malone: 2003)

Li gorî GIDSê, asta 8, rewşa herî xerab û xeternak e bo zimanekî. Lewre di wê astê de gelek kêm kes bi wî zimanî diaxivin û dîsa pir kêm kes hene ku pê re biaxivin. Bi wî awayî her astekê taybetiyên xwe hene û di tabloyê de bi kurtî hatine dayîn. Tiştê girîng ew e ku

GIDS, wekî rêberê ye ji bo zimanên di xetereyê de. Ji bo her astekê di pirtûkê de analîzên kûr û pêşniyarên pratîk hene. Li gorî formûlasyonên GIDSê zimanekî di astên jorîn de divê ewil pêdiviyên asta xwe bi cih bîne, paşê dikare dakeve 'yek ast jêr'. Ango nikare di ser astekê re biqewêze yeke jêrtir. Bi ya me, zimanê kurdî di wê tabloyê de di asta şeşan de bi cih dibe. Niha em hinekî asta şeşan rave bikin ku asta xetereya zimanê kurdî, rewşa wî ya nisbet bi zimanên din ên di xetereyê de û her wiha yek û yek pêngavên ku divê bavêje zelaltir bibin.

Asta 6, asta herî stratejîk e di xebatên BGZ de; ji ber ku di vê astê de zimanê devkî hêj jî tê veguhestin bo nifşên nû û civak li cihina berhev e, ne ji hev cuda. Dîsa zimanê di wê astê de zi-manê têkiliyên înfornel û devkî ye di navbera her sê nifşên malbatê de. Zimanê serdest, ji bo babetên fermî û teknîk bi kar tê. Helbet em nikarin bibêjin bi tevahî rewş wiha ye ji bo zimanê kurdî lê belê girîngiya asta şeşan jî jixwe ji wir tê. Ango di wê astê de divê hewl ji bo wê hindê bin ku kes û malbatên bi wî zimanê najîn an jî têra xwe rewan naaxivin peyda bikin û bi xêra handanan, duristkirin û sepandina normên civakî û her çi çalakiyên din, di nav mal-malbat-tax-civakê de zimên bikin navgîna têkiliyên rojane. Ango divê mirov ewil di nav malbatê de, paşê li taxê û axirîn di nav civakê de bi pêdiviya zanîna bi zimên bihesin. Wekî ku diyar e di vê astê de tiştê ku bê kirin peyitandina hişmendiya zimên e di malbat û taxê de û bi vî awayî duristkirina civakeke ku bikare bi serbilindî li pişt argûmanên xwe yê der barê zimên de bisekine. Heke em taybetiyên malbatê yê wekî girtîbûna bo derve, mahremiyet û faktora hezkirinê bifikirin, girîngiya malbatê ji bo pêkanîna civakeke wisa, aşkeratir dibe. Diyar e, mirov hêdî hêdî bi wan rastiyan dihesin ku hem ji aliyê dewletê ve hem jî ji aliyê siyasetmedarên kurd ve çalakiyên micid tene kirin ku kelk ji wê hêza malbatê bê wergirtin.

Birêz Cuma Çiçek (2006) der barê girtina kursên zimanê kurdî de tespîten muhîm dike û digihe encama 'daxwaza hînbûna zimanê kurdî ne zêde ye' û encameke din jî lê zêde dike û dibêje ku siyasetmedar, rewşenbîr û sazî û dezgehên sîvîl yê gelê kurd, ji bo ku zimanê kurdî bikaribe li hemberî siyaseta pişevker ya


dewletan xwebûna xwe bidomîne û bi pêş ve biçê, siyaseteke zimên çênekiriye. Ligel qebûlkirina wan tespîtan me dil lê ye çend tiştan lê zêde bikin: Bi ya me siyaseteke wan a xelet hebûye û sedemê ku ji bo girtina kursan hatiye nîşandayîn jixwe argûmaneke wê siyasetê bû ango divê zimanê kurdî bi awayekî fermî di dibistanan de bibe zimanê perwerdehiyê. Divê bê zanîn ku bi weşandina biryarnamayan ne mimkûn e çareserî bi dest bikeve. Lewre dema mirov formûlasyonên li jor difikire, qelsî û xeletiya wan argûmanan yekser xwe didin der. Ji ber ku divê berî bidestxistina wan mafan, dawaya duristkirina civakeke ku bikaribe azadî û derfetên wan mafan ragire pêk bêt da ku bo nimûne siberoj kurs û dibistan bê elaqe nemînin. ⁸ Wekî din, jixwe ya ku dê standina wan mafan mimkûn bike civakeke ku bi dil û can û samîmî li dûv berjewendiyên zimanê xwe ve ye. Bi ya me pêşniyarên pratîk ên birêz Çîçekî, ji bo wan armancên bingeşîn rast û pêkan in, lewre tê de nirxandineke pir baş a hêz û perspektîfên civaka kurd heye (bnr. Çîçek 2006).

4.3 Teoriya Jîndariya Etnolînguîstîk

Ev teoriya Jîndariya Etnolînguîstîk (ethnolinguistic vitality; (ji niha pê ve JE) ji aliyê Giles et al. (1977) ve di 1977'an de hatiye duristkirin. JE wekî 'faktorên ku dikin ku komek, di rewş û têkiliyên nav-komî de wekî komeke xweser (cuda) û yekgirtî tev bigere' tê pênasekirin (Giles, Bourhis, û Taylor 1977: 25). Li gorî vê teoriyê, JE ya civakeke hindikayî xwedan tesîreke zor e li ser helwesta parastina zimên. Giles, faktorên wekî statû, demografî, piştgiriya dam û dezgehî (institutional support) û kontrolê rêz dîke di nav faktorên JE'ya civakê de. Ew sernav di nav xwe de dabeş dibin û her yekê hêmanên xwe hene. Hêmanên ku statûyê pêk tînin: statûya aborî, civakî, dîrokî û zimên li nav an jî li derveyî civaka serdest. Hêmanên demografîyê, ewên ku têkildarî hejmar û belavbûna endamên civakê ne li herêmekê an jî li seranserê welatekî. Ligel wan rêjeya zarokanîne, rêjeya zewacên têkel, û awayên koçberiyê jî di nav faktora demografîyê de ne. Piştgiriya dam û dezgehî û kontrol: heta çî radeyekê koma etnolînguîstîk (civaka wî zimanî) piştgiriya fermî û ne-fermî werdigire ji saziyên cihê cihê, ji çapemenî û weşangeriyê,

perwerdehî, xizmetên hikûmetî, pîşesazî, ol, çand û siyasetê. Dema quwet û lawaziya civakekê di wan her çar waran de tê nixandî, jîndariyeke kê-m-zêde wekî kê-m, navînî, an jî bilind derdikeve jê re (Yagmur 2004).

Vê teoriya ku me pir bi kurtî salox da, tex-mîneke pir rasterê heye di warê parastina zimên de: makezimanên civakên xwedan JE'yeke bilind dê bêne parastin, û yên xwedan JE'eke kê-m dê bi zimanekî serdest bêne guhartin (Yagmur: 2003). Ango di konteksteke du yan pîrzimanî de civakeke bi JE'ya bilind dê ziman û taybetiyên xwe yên çandî biparêze û yên bi JE'ya kê-m dê asîmîle bibin. (Bi mebesta bercestekirin û têgihîştineke çêtir em tabloyeke vê teoriyê li jêr didin (bnr. tablo 3).



Tablo 3: Jîndariya Etnolînguîstîk û Bandora wê ya li ser Rewşa Zimên (Yagmur 1997: 27)

4.3.1 Kurtenixandîneke Faktorên JE'yê li ser Rewşa Zimanê Kurdî

Civaka kurd û zimanê wê, hêj di avakirina komara Tirkiyeyê de bi yasayên destûrê û sepandinên pratîk wekî civak û zimanekî 'mehrûmkirî' (deprived) xuya dike û ew rewş heta niha ligel ku dem û destûr guherîne jî kê-m zêde wekî berê maye. Ne hewce ye yek bi yek kiryarên ji wan yasa û hişmendîyan paşketî rêz bikin,

lewre gelekî aşkera ne lê belê bi tenê bibîrxistina redkirina hebûna her çi zimanekî ji bilî tirkî li ser axa Tirkiyeyê di destûrê de (bo nimûne made 3⁹ û hewlên fermî yên ji bo ji beynbirina wî zimanê bi rêya xerabkirina belavbûna civaka kurd, bi mebesta ku yekgirtina civakî têk biçe (bnr. Bulut 1998), û her wiha qebûlên xwedêgiravî zanistî yên der barê kok û dîroka kurdan û raveyên li ser zimanê wan, dê têr bike ku em helwesta dewletê ya li hemberî ziman û civaka kurd têbigihin (bo nîqaşeke berfirehtir bnr. Akin 2006). Di konteksteke wiha de ku rêveberî bi hemû derfet û şiyana xwe bi karê tepeserkirinê radibe, mirov nikare behsa tu piştgiriya dam û dezgehê bike, berevajî vê yekê mirov dikare qala mehrûmbûna ji her çi piştgiriya dezgehê bike. Wiha jî çend akademîkên li ser mijarê xebat kirî kiryarên dewleta tirk bi terma 'zimankujî/zimanqirî' bi nav dikin (ligel yên din Akin 2006, Hassanpour 1997, 2004).

Ev helwesta rêveberiyê bû û mirov dikare vê helwestê heta radeyekê li civaka serdest jî mal bike lewre kêma kes ji wan li hemberî rewşê reaksiyonên micid bi pêş xistine. Layê dîtir, ligel pêşketinên polîtîk û guherînên di sîstema rêveberiyê de şêwe û bikaranîna hêz û otoriteyê jî hinekî guheriye, di wan salên dawî de û kurd jî di rêveberiyên herêmî de xwedan tesîr in û her wiha bi rêya rêxistinên civakî jî di qada civakî de warek (sphere-sfer) vebûye ji bo zimên û di wî warê de piştgiriya dezgehê carinan bi şiklê festîvalan carinan bi şiklê bikaranîna zimanê kurdî di qada fermî de û carinan jî bi şiklê weşandina pirtûk, belavok, salname û hwd. dirûv digire. Bi vî awayî, niha mirov dikare heta radeyekê behsa piştgiriya dezgehê bike jibo zimanê kurdî (ji bo nîqaşeke berfireh bnr Çiçek 2006).

Faktora dîrokîbûnê jî mirov dikare ji layê kurdî ve girê bide lewre civaka kurd zimanê xwe wekî zimanekî kevnare qebûl dike. Lê belê, berevajî vê yekê, bikaranîna kurdî ya di warên cihê de û proseya modernîzasyona wî ku heta dereceyekê aniye, li ser axêveran têsîreke pir neyînî jî kiriye. Axêverê zarê herêmî dema bikaranîna zimên a di televîzyon û medya de û her wiha axêverên bi forma standard diaxivin, dibîne, ji rastî û qîmeta zarê xwe dikeve şikê yan jî berevajî zêdetir bi zarê xwe ve diçespe û

reflekseke pir neyînî pêk tîne li hemberî formên standard. Ev diyarde, statûya zimên a li cem miletî dadixe. Her wiha, cihê zimên, di jiyana cemawerî de layekî dîtir ê statûya zimên a di nava civakê de ye. Bo nimûne, di nav kurdên Îranê de, cih û girîngiya zimên ew qas peyt e ku yekî/e ne-kurd bêt û li bajarekî wan bi cih bibe, mecbûr e ku xwe fêrî zimanê kurdî bike; cihê zimanê kurdî di nava gel de wê yekê li wan ferz dike, lewre zimanê serdest e di nava civakê de. Mirov bi rihetî dikare îdia bike ku di konteksta kurdên Tirkiyeyê de cih û fonksiyona zimên ne ewqas mezin e. Faktora aborî, bi ya me, her û her li dijî kurdî û kurdan bûye. Ji ber ku bi nebûna daneyên îstatîstîkî ev nirxandin têne kirin, mirov nikare tespîten gelek qewî bike, lê belê dema mirov feqîriya giştî ya li herêmên kurdan difikire û her wiha helwesta dewlemendên kurdan a li hemberî zimên û reflektkirina zimanê kurdî wekî zimanê feqîr û gundiyan bi rêya medya û weşanan lê zêde dike, tabloyeke ku piştevaniya îdiayên me yên sêbjektîf dike, diyar dibe. Heçî demografiya kurdan e, kurd berî bi bîst salên dawî her li war û herêmên xwe yên kevn dijîyan û niha ligel ku koçberiya bîst salên dawî ew rewş heta cihekî têk daye jî, dîsa welatê kurdan piraniya nifûsa kurdan dihewîne. Her wiha li cihên ku kurdan koçkirinê jî meyleke bihevrejîyanê hebûye di nava wan de ku wê yekê tesîra neyînî ya koçberiyê li ser zimên kêmkirîye. Zarokanîna zêde di nav kurdan de û meyla giştî ya zewaca navxweyî (di nav civaka kurd de) faktorên ligel zimên in.

Analîzên JE'ya li ser du bingehan têne kirin: yek JE'ya objektîf, û ya duyem JE'ya sêbjektîf. JE'ya objektîf, bi analîza daneyên statîstîkî û qualîtatîf (çawanî) ên der barê çar faktorên sereke yên JE'ya tê kirin; û JE'ya sêbjektîf jî bi analîza bersiv û nirxandinên axêverên wî zimanî ên der barê wan faktorên de tê kirin. Li vir, bi nirxandinên jorîn ku di nebûna her çî daneyên statîstîkî de ku bi tenê bi dane û agahiyên qualîtatîf hatine kirin, armanca me ne ew e ku JE'ya zimanê kurdî zelal bikin, jixwe ev yek ne mimkûn e jî, lê belê diyarkirina hin xetên giştî yên JE'ya zimanê kurdî ye ku bi wan nirxandinan xwendevan dikare hin fikran li ser JE'ya zimên bi pêş bixe.

5. Encam

Me bi vê xebatê destnîşan kir ku ji ber nebûna daneyên statîstîkî û agahiyên zanistî di mijareke ew qas pêdivî bi boçûnên zanistî heya de, xebat û hewlên ji bo parastina zimanê kurdî têne kirin ne bi pergala in û heta radeyeke bilind ji lîteratûra zanistî ya cîhanê ya bi mijarê re eleqedar ne haydar in ku êdî ligel hişyariya giştî ya li ser zimanan xebatên zanistî yên di wî warî de pir zêde bûne. Ji ber vê hindê, divê tevger û saziyên kurd xwe ji wê gencîneyê nehêlin, xebatên xwe li gorî teorî û tecrûbeyên zanistî dîsa bi rêk bikin û planeke xebatê ya di wê çarçoveyê de bi pêş bixin. Helbet, wekî ku di nava gotarê de hate diyarkirin divê tu kes li hêviyê nebe ku teorî û formûlasyon bi awayekî tekûz li rewşa zimanê kurdî bîn û teqîbkirin û sepandina yek ji wan mişkûleyên zimên çareser bike; bêtir, divê ew teorî û formûlasyon ku li jor girîngiya wan a ji bo her çi tevgereke zimên hate ravekirin, li gorî dînamîk û mercên civak û zimên ên heyî bêne analîzkirin û di proseya diyarkirina armanc û duristkirina plana xebatan de wekî çavkanî îstîfade jê bê kirin.

Dîsa hate dîtin ku mijara parastin û guherîna zimên diyardeyên pîralî ne ango birrek faktor hene di paşxaneya wan de; lê dawiya dawîn tê û di-gihe encama ku parastina zimên, qirareke civakê ya cemawerî ye li ser domandina bikaranîna zimên û guherîna zimên, zêdetir qîrarên şexsî ne sebarek bi dev ji zimanekî berdan û naskirin û qebûlkirina yekî dîtir. Teorî û formûlasyonên di wî warî de ku çendek ji wan hatine ravekirin, dikarin rêyên baş li ber tevgerên zimên vekin ku ew qirara cemawerî bi layê 'parastinê' ve bidêre, ne bi layê guherandinê ve.

Jêrenot

1) Lêkolîna navborî xebateke sosyolînguîstîkî ye û ji aliyê Ergin Opendin û Kadir Gokgoz ve tê meşandin. Armanca wê ew e ku rewşa zimanê kurdî ya di 'qadên jiyanê', bikaranîn û bijartina zimên de, bi aneketekê teswîr bike ku ew anket li gorî çend çarçoveyên teorîk hatiye duristkirin û ji ber sedemên peydanebûna butçeyê du sal in ku li hêviya sepandinê ye. Daneyên ku di gotarê de hatine pêşkêşkirin ji pîlotê hatine bi dest xistin ku pîlot bi qewlê pêş-xebata eslî ji bo teselîkirina bikêriya anketê, ligel 54 kesan li çend taxên Stenbolê hatiye çêkirin.

2) Dîglosya (diglossia): konteksta ku du ziman lê têne bikaranîn lê her zimanekî fonksiyonên xwe yên xweser hene û têkilî qadên hev nabin.

3) Jêwergirên ku me di wê gotarê de bikaranîne bi îngilîzî bûn û me wergerandine ser kurmançî. (1)

4) Peyvên wateyî (content word an jî open class) û peyvên peywirî (function word an jî closed class) du polên peyvan in. Peyvên wateyî xwedan wateyekê ne û di zimanekî de potansiyela wan bêdawî ye. Bo nimûne: kompûter, heliz, dêr û hwd. Heçî peyvên peywirî ne ew jî xwedan wateyêke rêzimanî ne û hejmar û potansiyela wan bi sînor e. Bo nimûne: heçî, ligel, bes û hwd. Îcar zor asayî ye ku peyvên wateyî ye ji zimanekî bikevine nav zimanekî din û hejmara wan zêde bibe lê belê peyvên fonksiyonan ne wisa ye lewre ew wekî qorzîberan in ji bo zimanekî û têkelbûna wan nîşaneyê rewşeke xerab e ji bo wî zimanê ku werdigire.

5) Ew morfem in ku serbixwe bêwate ne, tim bi morfemeke din ve têne bikaranîn.

6) Divê neyê jibîrkin ku ew dane bes ji bo zelalkirina mijarê ne nexwe tu îdiayên giştî pê re nîn in; her wiha li Stenbolê yanî ne li warê zimên ê mîratî hatine berhevkin.

7) <http://web.mit.edu/linguistics/www/mitili/langu-age%20loss.html>

8) Li vir mebest ne ew e ku divê dev ji têkoşîna ji bo mafên dewletî-sazûmanî bê berdandê girîngiya pêwîst a ji bo bingehdanîna wan mafan e û heke kurs ji bo danîna wê bingehe alavek bin, parastin û sûdwergirtina ji wan ji bo niha ji gelek tiştên din ferztir bû.

9) Made 3: Zimanê zikmakî yê hevvelatîyên Tirkîyê Tirkî ye.

Qedexa ye ku:

a) Ji xeynî Tirkî, zimanên din wekî zimanên zikmakî bêne bikaranîn û ji bo belavkirina wan zimanan çalakî bêne kirin;

b) di civîn, xwepêşandanên kolanan, poster, nîşane, tabela, afîş û agahiyên bi wî şiklî de, zimanekî din ji xeynî Tirkî bê bikaranîn, heta ku zimanên bi qanûnê nehatine asêkirin jî, her çend ji berpirsiyarên herêmî destûr hatibe standin jî kaset, tomarên dengî, fîlm û hemû pergal û navgînên derbirin û belavkirinê bi wan zimanan bêne bikaranîn.

Çavkanî

Akin S. (li ber çapê ye). Private Teaching of Kurdish in Turkey: Problems and Prospects [Fêrkariya Kurdî ya Taybet li Tirkîyê: Pirsgerêk û Perspektîf]. (werg. Derince, Ş. & Opendin, E.). ZEND

Bradley D. (2002). Language attitudes: The key factor in language maintenance. Di nav David Bradley and Maya Bradley (ed.) Language Endangerment and Language Maintenance de. London. U.K.: RoutledgeCurzon. 1-10

Brenzinger M., Bernd, Heine û Gabriele Sommer. (1991) Language death

- in Africa. Di Robert H. Robins û Eugenius M. Uhlenbeck (ed.) *Endangered Languages*. Oxford, U.K.: Berg. 19-44
- Brenzinger M., (1998). Various ways of dying and different kinds of deaths: scholarly approaches to language endangerment on the African continent. Di nav Matsumara (ed.) de, 85-100. (di Crystal 2000 de hatiye neqlkirin).
- Bulut F. (1998). *Kürt Sorununa Çözüm Arayışları*, Stenbol: Ozan Yayinlari
- Crawford J. (1996). Seven Hypothesis on Language Loss: Causes and Cures. Di nav Stabi-lising Indigenous Languages de G. Cantoni (ed.).
- Crystal D. (2000). *Language Death*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Çiçek C., (2006). Pêşniyazêke Planeke Giştî ji bo azadkirin û bilindkirina statuya zimanê kurdî. *Zend payîz* 2006: 32-42
- Giles H., Bourhis, R. Y., & Taylor, D. M. (1977). *Towards a Theory of Language in Ethnic Group Relations*. Di nav *Language, Ethnicity and Intergroup Relations*, H. Giles (ed.). London, Academic Press.
- Hassanpour A. (2006) Li Tirkîyê zimankujî û zi-manê kurdî. (werg. Derince, Ş.). *Yazınca* 7, 19-26
- Hassanpour A. (1997). *Kurdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-198*. Stenbol: Avesta Yayinlari
- Fishman J. A. (1991) *Reversing Language Shift*. Clevedon, England: Multilingual Matters.
- Hawkins J. P. û John, S. R. (2001). Mamean. Di nav David Carrasco (ed.) *The Oxford Encyclopedia of Meosamerican Cultures: The Civilizations of Mexico and Central America* (hej. 2). Oxford. U.K.: Oxford University Press. 159-163.
- Kincade M. D. (1991). The decline of native languages in Canada. Di Robins and Uhlenbeck (ed.) de, 157-76.
- Krauss M. (1992). The world's languages in crisis. *Language* 68. 4-10
- Odlin T. (1989). *Language Transfer. Cross-linguistic influence in language learning*. New York, Cambridge University Press
- Rhydwen M. (1998). Strategies for doing the impossible. Di Ostler (ed.) de, 101-6. (Di Crystal 2000 de tê neqlkirin).
- Suwilai P. û Malone, D. (2003). *Language development and language revitalization in Asia*. http://www.sil.org/asia/ldc/plenary_papers/suwila_and_dennis_malone.pdf
- Wardhaugh R. (1987). *Languages in competition: dominance, diversity and decline*. London: Blackwell Publishing

Yagmur K. (2004). Language Maintenance Patterns of Turkish Immigrant Communities in Australia, and Western Europe: the impact of majority attitudes on ethnolinguistic vitality perceptions. *International Journal of Sociology of Language*, 165, 121-142

Yagmur K. & Akinci, M. A. (2003). Language use, choice, maintenance and ethnolinguistic vitality of Turkish speakers in France: Intergenerational differences. *International Journal of Sociology of Language*. 164, 107-128

Yagmur K. (1997). *First Language Attrition among Turkish Speakers in Sydney*. *Studies in Multi-lingualism*, Vol. 7, Tilburg, Tilburg University Press.

www.arsivakurdi.org

Derbarê Dayîka Wêrek û Zarokên Wê de

Berhevkar: Aysan Sönmez

Werger: Ergin Öpengin

Lîstik, di hengama şerên sihsalî, 1624-1636 de derbas dibe. Dayîka Wêrek, Anna Fierling, ligel sê zarokên xwe yên ku bêyî mare peyda bibûn, û ku her yek ji mêrên cuda cuda bûn, li qada şer digere. Bi erebeya xwe ya bi şeklê konê (xîvet) ku wek dukanekê bi kar dianî, tiştan difroşe leşkeran û debara mala xwe dike. Di tevahiya lîstikê de, têdikoşe ku zarokên xwe ji şerî biparêze, lê zarokên wê yek bi yek têne kuştin; şerê ku zikê wan têr dikir, rêkê li mirina wan jî vedike: Penîrê Swîsre dibe qurbanê durustiya xwe, Eilif qurbanê wêrekiya xwe, Kattrin jî dibe qurbanê mihrebaniya xwe. Di dawiya lîstikê de Dayika Wêrek bi tenê maye, êdî erebeyê bi xwe dikêşe û qirardar e ku dê dewamê li rê bike.

Dibêjin ku Bertolt Brechtî, fikra karaktera Dayika Wêrek û şerê Sihsalî ji romana Hans Jacob Christoffel von Grimmelshausen a *Lebensbeschreibung der Erzbetrügerin und Landstörzerin Courasche* (1670) (Çîrokjiyana Şêlander û Welatxerabkerê Courasche) girtiye.

Paşxaneya lîstikê, şerên Sihsalî, wekî serdemeke herî xwînî ya dîroka Ewrûpayê tê dîtin. Birre şerekê ku navbera salên 1618-1648'an de, nexasim di navend û bakurê Ewrûpayê de bitesîr bûye ye. Ji ber ku sebebên şerî yên fermî, nexweşiyên navbera mezhebên Protestan û Katolîkan bûn, hindêk dîroknas wan şeran wek Şerên Dînî bi nav dikin. Lê belê dîroknasên nûjen, vê rûdana dîrokî, têkildarî polîtîkayên berfirehbûna emperyal dikin ku ew berfirehbûn dibin sebebê pêkhatina dewletên neteweyî. Şer esasen di navbera du hêlan de çêbûye: Hêla yekem, Binemala Habsburg a Katolîk e ku Awusturî ne û di Imparatorya Roma Germen û Kraliyeta Îspanyayê de text di hukmê wan de bû. Hêla reqîp jî, Danimarkaya Protestan, Swêd û Hollanda, û Fransaya Katolîk e ku reqîbên wan ên navneteweyî ne. Ew şer, dîroka Ewrûpayê de

sîstemeke nû ya navneteweyî pêk tînin û hemahengiya ku heta Şoreşa Fransizan dê dewam bikira ava dikin. Gombrich derbarê wî şerî de wiha dibêje: 'Lêkdanên xwînê gihiştine asteke wisa ku êdî mirovan nedizanî ka ji bo çi û ji bo kê şer dikirin... Di 30 salan de, hema bêje hemî gundên li Elmanyayê hatine sotin, bajar hatine hilweşandin, jin û zarok hatine qetilkirin, her der hatine şelandin, sotin, rûxandin... Birçiyatî, nexweşiyên şob (salgin), celebên gurên wehşî ku li pey xwarinê ketibûn gund û bajaran; wan hemî faktoran Elmanya kiribû wekî xerabe, û çoleke bêhêvî (xêrtênemayî). Qederê nîviyê gelê Elmanyayê miribû. Piştî şerî, hindêk ji yê sax mayî koçî Emerîkayê kirin. Yê dî bûne leşkerên bi peretî bo artêşên biyanî. 30 salan de ji bilî şerkirinê hînî tu tiştî nebibûn.'

Brecht, lîstika *Dayika Wêrekê* di sala 1932'an de, pîçek berî ku şerê duyem ê cîhanê dest pê bike nivîsî. Ewrûpaya ku taze ji Şerê Yekem ê Cîhanê derket, û ji ber şer û faşîzmê serûbin bûyî, niha jî li ber şerekê nû bû. Ev lîstik, wekî hunermendeke li sirgûnê, bersiva wî ye ji şer û xemsariya li hemberî şer.

Brecht, piştî ku Hîtlêr li Elmanyayê dibe desthelatdar, sala 1933'an de, neçar dimîne û terka Elmanyayê dike. Sosyalîzma nasyonel, êdî bûye rejîm bi xwe, û di nav civaka sîvîl de tabaneke zêde peyda kiriye, entellektuel û komunîstên li welêt bûne hedef û kitêb têne sotin. Muhalifên rejîmê yê li welêt belav bûne her derê Ewrûpa û Emerîkayê. Ji bo Brecht û Weigel, Danîmarka dibe rawestgeha ewil a jiyana penaberiya ku wê 16 sal dom bike. Her çend Naziyên Danîmarkî zor li hukûmetê dikirin ku komunîstan dersînor bike jî, ji bo demeke dirêj tiştek pê ve nehat. Heta sala 1939'an li wir dimînin, û Brecht di odeya xwe ya ji axurê hatiye durustkirin de dewamê li xebatên xwe dike. Dibêjin ku Brechtî, berhemên xwe yê herî têr tesel di wan salên sirgûnê de nivîsandiyê; her çiqas zext û zehemetî zêde bûn jî, salên penaberiya ji bo Brechtî gelek sûdbar derbas bûne. Brecht û Weigel di sala 1939'an de ji ber zextên Naziyên li welêt, terka wê derê dikin û li Swêdê bi cî dibin. Pênc sal piştê, Elmanya Polonyayê dagir dike. Ev rûdan hêrsa Brechtî zêdetir dike, û ew hêrs *Dayika Wêrekê û Zarokên Wê* yê derdixe. Brecht lîstikê di nav pênc hefteyan

de dinivîse. Lîstik promiyera ewil a derveyî Elmanyayê, li Stokholmê dike. Wateya polîtîk a pêşkeşkirina lîstikê li Stokholmê pir e, ji ber ku planên Hîtlerî yên dagirkirina Skandînavyayê tên zanîn. Brecht û malbata xwe, sala 1940'an de derbasî Fînlandiyayê dibin. Lîstik, di 1941'an de li Zûrîhê tê pêşkeşkirin. Brecht nikare vê pêşkeşkirinê temaşe bike (wê henganê de planên wî yên penaberîya Amerîkayê hene) lê nivîsarên rexneyan dişopîne. Ji ber ku şîroveya Dayika Wêrek, gelek hestiyar tê nixandîna dîsa li ser lîstikê difikre. Lê belê gelek dipê da ku lîstikê pêşkeş bike, niyeta wî ew e ku vê lîstikê bi Helena Weigel re li Elmanyayê pêşkeş bike.

Vegera wî bo Elmanyayê piştî 16 salan, sala 1949'an de pêk tê. Qadroya ku di salên sirgûnê de belav bibû dîsa kom dibin: Paul Dessau, Kurt Weill, Caspar Neher û Helena Weigel, bi rejiya Brecht, promiyera Dayika Wêrek û zarokên Wê ya Elmanyayê dikin. Pêşkeşkirina *Dayika Wêrek* a 11 Çile ya 1949'an a li Elmanyayê bû wesîleya avabûna Berlîner Ensembleyê. Eleqeyêke mezin ji lîstika ewil re tê nîşandan. Şîroveya Helena Weigel a li ser Dayika Wêrek ku di salên sirgûnê de lîstikvaniyêke epîk a taybet pêşxistibû, tê pesindan. Wextê Brecht hêj sax, li Elmanyayê, Ewropa û Emerîkayê li pence ciyan tê pêşandan, 10 salan zêdetir di repertuwarê Berlîner Ensembleyê de dimîne. Brecht, têbîniyên lîstikê yên dramaturjiyê, ligel rave û îzahatên hûr, wekî kitabeke model çap dike. Di sala 1961'an de lîstik dibe film.

Di vê lîstikê de Brecht, çîna navîn vedibêje, ku ew (çîna navîn) ji şer li hêviya bidestxistineke madî an jî manevî ne. Dîtinên Brechtî derbarê ekonomiya şer de wiha ne: 'Di demên şerî de, yên ku gelek tiştan bi dest dixin, ne mirovên biçûk in. Bereksê mirovên qewî, yên biçûk ne li benda tu tiştêkî ne ji şerî. Mirovên biçûk, tenê bedelên serkevtin û têkçûnan didin. Heke tu bixwazî dahatekê ji şer bi dest bixî, divê kevçiyê te mezin be.' Her teşebbuserê biçûk ê ku dixwaze îdara xwe bi şerî bike, divê bedelê wê jî bide. Bedela ku Dayika Wêrek da jî, zarokên wê bûn ku wekî riha xwe li wan hişyar dibû. Di lîstikê de tiştê balkêş, xemsariya Dayika Wêrek a li hemberî bedelî ye. Dawiya lîstikê de, bi tenê serê xwe mabe jî, dîsa li rêya xwe dewam dike. Têra xwe muqtedîr nîn e ku şert û mercên

sebebê wêraniya xwe fam bike; trajediya xwe bi xwe amade dike. Qirardar e ku bi şerî debara xwe bike, lê, xwe ser ve dibe ku şer bi wê (dayika wêrek) debara xwe dike.

Temaşevanê Brechtî, taze ji sîlsîleyeke şer û wêrekiyan derketiye, lê, xemsariyeka li hemberî şer hêj jî pir qewî ye. Li gor Brechtî, hêleke dî ya neyînî ya şerî jî ew e: 'Temaşevanan, sûcên Dayika Wêrek, beşdarbûna şerî, daxwaza ji şerî menfietgiritina wê hîç nedîtine; tenê mexlubiyeta wê û êşên wê dîtine. Bi wî awayî jî, şerê ku ew bi xwe tevlê bibûn temaşe kiribûn. Ev, şereke xerab e û mirov hêj jî bedelan didinê. Bi rastî, rewş wesa ye ku ez dixwazim nîşanî wan bidim. Şer, ne tenê dê ji wan re êşê bîne, lê belê dê rewîştta (xuy) wan a jişerîdersnegirtinê jî xurt bike.

Çavkanî:

1. *A Model of Courage*. [Gideon Lester](#) explores the evolution of Mother Courage and her Children
2. *The Obvious in Brecht*. Lisa Cirèlle Hansson, 30 Gulan 2001
3. *Mother Courage: A Legacy of Survival*. Jennie Knapp
4. *Otuz Yıl Savaşları Kısa Bir Tarihçesi*, Fýrat Güllü, Tiyatro Boðaziçi Dramaturji Toplantýsý Notları

DAYIKA WÊREK Û ZAROKÊN WÊ*Bûyer di Dema Şerên Sîhsalan de Derbas Dibe.*

KESÊN JI LÎSTIKÊ
DAYIKA WÊREK,
KATTRÎN, keça wê ya lal.
EÎLÎF, kurê wê yê mezin.
PENÊRÊ SWAZILANDIYÊ, kurê wê yê piçûk.
ÇAWÎŞ,
QARQAROK
AŞVAN
SERDAR
KEŞÎŞ
HEJMARYAR
YVETTE POTTIER, fahîşeya qampê
YEK ÇAV
ÇAWÎŞEKÎ DIN
SERHENGÊ KAL
NIVÎSAR
LEŞKERÊ CÎWAN
LEŞKERÊ KAL
GUNDIYEK
JINEKE GUNDÎ
MÎROVÊ CÎWAN
MÎROVÊ KAL
GUNDIYEKÎ DIN
GUNDIYEKE JIN
GUNDIYEKÎ CÎWAN
LEŞKERÊN DIN
DENGEK

1.

Demsala bihara sala 1621'an e. Fermandar Oxenstjerna, li Dalernê, ji bo sefera Polonyayê leşkeran berhev dike. Anna Fierling ku bi navê Dayika Wêrek tê nasîn û bi firotina hind tiştan a leşkeran debara xwe dike, kurekî xwe ji bo vê seferê

winda dike.

(Çawîşek li ser riyek li deverek bajar ku bi pereyan leşkeran berhev dike û ji ber sermayê dema diqêre, diricife.)

QARQAROK:

Tu hişê xwe bide serê xwe û li vanderan mirovan kom bike. Bawerke Serpel ez dikifirim ku xwe bikujim. Fermandar dibêje "heta danzdehê mehê divê ku çar yekine amade bibin" û êdî dengê xwe nake. Der dora min herêma min e, kerê kurê kerê. Xew nakeve çavên min. Bifikire ku min yek girt. Ez li baş û xirabiya wî nanêrim. Min ew serxweş kir û belgeya leşkeriyê bi wî da îmzekirin. Min hêj pereyê ereqa vexwariyê nedayî, kerê kurê kerê xwe avêt ber derî. Elbet ez jî ketim pey wî lê ku şansê te hebe tu dê bibînî. Ne mêranî ne jî rastî nema ye. Bawerîya min bi mirovan nema Serpel.

SERPEL:

Rastee. Ev demek dirêje ku van deran rûyê şer nedîtîye. Hingê jî ma exlaq dimîne. Ji xwe aşitî, tevlihevî, serberedayîti ye. Di dema aşitîyê de mirov dibezin dol avêtinê. Her kes tiştê dixwaze dixwe û vedixwe. Tu heywanan bêjî tewas dikin. Çi bûye, Francala û serde jî qedek pêxwarin. Ji kekê xwe re bêjim, piştê jî qatek qelê diavên ser. Welleh bavo xweş hal e! Kî dizane ka niha li vî bajarî çiqas hêştir û çiqas mêrxasên ciwan hene? Dê kî ji ku bizane? Kesek ku bi hejmêre tu ne ye kî. Min çî kesên zirmol dîtî. Heftê sale şer nedîtîne û tenê xwarine? Wisa lê hatiye êdî kes kesê nasnake. Pirsîn tune ye, hejmartin tu ne. Lê qey di dema şer de wisa ye? Mirovan jî sewalan jî dihejmêrin ! Serê te neêşînim, li cihekê şer tune be têkûzî û sazûman jî tune ye.

QARQAROK:

Belê eynî wekî te got e.

SERPEL:

Wekî hemû tiştên baş, şer jî pêşiyê ji mirov re zor tê. Lê piştî ku her tiştî carekî sererast bike, êdî tu mêzeke. Qumarbaz ser lîstikê radibe? Ranabe. Kurê bavan jî şer bernadin. Ji ber ku divê neçare ku tiştên di dema aşitîyê de winda kirîn, hesab bike.

QARQAROK:

Mêzeke, erebeyek tentelî jî di vî alî de tê. Du jin, du jî zîlam xuya dîkin. Tu jinika pîr bixapîne. Vê carê jî ez tişteke jê dernexim, em dê dawiyê li rawestiyana li ber helwasa avrêlê bînin.

(Dengê muzîqeyek devî tê bîhistîn. Erebeja ku du ciwan dikişînin, nêzîk dikeve. Dayîka Wêrek û keça wê Katrîn hene.)

DAYIKA WÊREK:

Beyanîbaş serpel!

SERPEL:

(Riya wan dibire) Beyanîbaş. Hela ka hûn kîne?

DAYIKA WÊREK: Kesên bazirgan. *(Dixwînin)*

Fermandar beg, fermandar beg

Bila hişbin trampêt

Bila bisekinin peyade,

Hat Dîya Wêrek

Bila rîya xwe bibîne

Top, tifeng

Xirt xaş

Zêde zêde

Hezaryek kêzikan

Ku derkevî seferê

Solên qayîm hene

Fermandar beg, fermandar beg

Guh bide min

Hirça birçî naleyîze

Bila şilke Dîya Wêrek

Berde

Mêjîyên hesinbûyîn

Bi şarabê

Min mêzeke

Ku ûr vala be

Top xirab lêdixin

Ser hemû mîrovan

Lê belê carekî jî têr bin

Bajo tu ku de diajoy

Heta bingeha dojhê

Bihar hat

Rabin ey evdên Xwedê

Berf helîya! Yên mirîn mirin

Bikevin ser rê yên zindî mayîn

SERPEL:

Hey jarno! Hûn çine, kîne?

KURÊ MEZIN:

Em? Em ji Duyemîn Alaya Fînî ne.

SERPEL:

Ka kaxizên we?

DAYIKA WÊREK:

Kaxizên me?

KURÊ BIÇÛK:

Ji wê re Dayîka Wêrek dibêjin.

SERPEL:

Min qet nebîhîstibû. Çima navê wê Wêrek e?

DAYIKA WÊREK:

Wêrek lê. Ji bo ku ez 50 nanên li ber kîfîkbûnê bifiroşim, ez ji werçerxa agir a li Rîgayê de derbas bûm.

SERPEL:

Dest ji derewan berde, kaxizên te li kû ne?

(Dayîka Wêrek kutiyek di destê wê de ye her tim teoli hev dike. Piştî komek kaxizan derdixe. Ji erebeyê peya dibe û kaxizan dirêjî serpel dike.)

DAYIKA WÊREK:

Ha bigire serpel tevahiya kaxizên min. Pirtûkek diayan. Ji bo pêçana xiyaran. Ev jî nexşeya Maehrenê ye. Xwedê dizane ka ezê bigihim wan deran? Bilî van, rapora tenduristiyê ya hêştir dimîne. Lê cardin jî temenê wî têrê nekir, xirîbê min. Li ser min panzdeh guldenan bibû mal. Çi dibêji. Ev qas kaxiz têrê hene?

SERPEL:

Tu henekên xwe bi min dikî, ez dê henakan nîşanî te bidim ha. Helbet te fam kir ku ez belgeya derbasbûnê dixwazim.

DAYIKA WÊREK:

Efendî be, tu nikarî li cem zarokên biçûk wiha biaxivî. Nasnameya min rûyê min ê esîl e. Ji Alaya Fînî ya Duyemîn dizanin. Ku tu xwendinê nizanî ma ez çi bikim? Ez nikarim damgeyan li her derê xwe bidim!

QARQAROK:

Dişibe yek rikoyî serpel. Ji bo leşkeriyê dîsîplîn hewce ye.

DAYIKA WÊREK:

Wisa ye? Min jî qey digot dayîn lazim e.

SERPEL:

Navê te?

DAYIKA WÊREK:

Anna Fierling.

SERPEL:

Hingê paşnavê we hemûyan Fierling e.

DAYIKA WÊREK:

Çima!

SERPEL:

Ka zarokên te bûn?

DAYIKA WÊREK:

Ew wisa. Lê çima divê paşnavên hemûyan yek be? (Kurê xwe yê mezînan nîşan dide) Mînak navê vî Eîlîf e. Paşnavê wî Nojockî ye. Çima? Navê bavê wî Kojockî bû, Nojockî bû, tiştê wisa bû ji ber wê. Zarok bavê xwe baş nasdike. Lê di rastiyê de yek din nas dike. Firansiyek rih bîzîn e. Di mejî de bi bavê xwe ve çû ye. Rehmetî pir bi aqil bû. Kirasê mirovan ji ber dîkir, rihê kesî pê nedihesiya.

SERPEL:

(Zarokê biçûk nîşan da) Ev jî çînî ye ez bêjim?

DAYIKA WÊREK:

Xelet. Siwêdî ye.

SERPEL:

Yê piştî yê fransî ye?

DAYIKA WÊREK:

Kîjan Firansî? serê min tevli hev neke. Me çî digot lo. Ha. Ya

siwêdîtiyê siwêdî ye zarok. Lê paşnavê wî Fajos e. Têkiliya wî bi bavê wî re tune ye. Avasaz bû ew. Baş vedixwar.

(Zarokê biçûk bi ken serê xwe dihejî ne. Henekan bi birayê xwîşka xwe ya lal re dike.)

SERPEL:

Tiştêk wisa nabe, bavê wî nebûye kî.

DAYIKA WÊREK:

Hema eşkere ye, kişandiye wî. Min navê wî danî, pêxwarina Siwêdê. Tu dizanî ji bo çi, pir qahîm e ji bo wê. Pir baş erebeyê dikişîne. (Keçika lal nîşan dide) Navê vê jî Kattrîn Haupt e. Meleza Elmanan e.

SERPEL:

Malbatek balkêş e

DAYIKA WÊREK:

Ez bi vê erebeyê li cîhanê geriyam.

SERPEL:

Hemû dê bikevin girtînameyê. (Nivîskar) tu jî Bavyeradansî. Tu çawa hatî vir?

DAYIKA WÊREK:

Ma min dê çi bikira, ez dê li bendê bimama heta şerî kerem dikir wira?

QARQAROK:

Ji ber ku hûn erebeyê dikişînin, diviya paşnavê we ga bûya. Demên ku we girênadin erebeyê jî hene gelo.

EILIF:

Dayê destê min dixwire. Ez şewiya wî belav bikim?

DAYIKA WÊREK:

Li ser quna xwe rûnê. Êêêê. Femandarên birêz. Tebanceyên min ên rind hene. Serpel tu palasqayek dixwazî? Di ya te de xêr nema ye. Ber çavê min ket de.

SERPEL:

A min jî hind tiştên din ber çavê min dikevin. Ez li van mêrxasan dinêrim de. Xwedê bihêle her du jî mina spîndaran e. Hem hêza wan jî li cih e. Çima ji leşkeriyê direvin?

DAYIKA WÊREK:

(Bilerizok) Nexêr serpel, destê wan çekê nagire.

QARQAROK:

Lê binêre. Dê wisa bigire. Zêdeyî vê yekê dê navdar jî bibin. Bi tune ling mehandin karê jinan e. (Berê xwe da Eîlîfê) Piçek nêzde were mêrxaso. Ku ez bizanibim ka bêhna şîr hêj ji devê te tê.

DAYIKA WÊREK:

Bêhna şîr jê tê ya. Ji ber ku ew berxa dayîka xwe ye hêj. Tu awirek dijwar bidiyê dê bikeve erdê.

QARQAROK:

Na looo. Gayê hêç bûyî bibîne, dê bikaribe rawestîne. (Digire milê Eîlîfê re û dikişîne)

DAYIKA WÊREK:

Keçikê rihet bihêle, li gorî te nîne ew.

QARQAROK:

Berî niha ji min re got gêjo, li dijî min derket, em dê wekî zilaman li nav vê zevyê xwe ji hev kifş bikin.

EILIF:

Ez ê wî ji hev biçirînim.

DAYIKA WÊREK:

Rawest e gayê Xwedê! Tu ji şer zêdetir tişteke din nizanî ma!
(Qarqarok) Di ber cizmeya wî de kêr heye. Dê, lê bixe. Dilê wî
namîne bi te re!

QARQAROK:

Xem neke xaltikê! Ez dê wî mîna avê vexwim. Bi destûra Xwedê!

DAYIKA WÊREK:

Ez dê giliya te li cem fermanarê te bikim. Tu dê bikevî zîndanê! Ji
xwe berbaz her roj keçika me dixwaze.

SERPEL:

(Ji Qarqarok re) Ya de dest j qare warê berdî! (ji Dayîka Wêrek)
Tu çima ji leşkeriyê hez nakî? Bavê wî neleşker bû qey? Bi rûmet
ne mir? Tu bi xwe dibêjî...

DAYIKA WÊREK:

Ew hêj zarok e. Berxika dayîka xwe ye. Tu dixwazî deynî ber kêrê.
Ez we dizanim. Pênç guldenan bidim we.

QARQAROK:

Em jî dê kasketek rindik, cîzmeyek hewadar bidin. Ne wisa ye
mêrxaso?

DAYIKA WÊREK:

Masiyê ji kûrmik re gotiye 'were em bi hev re biçin masiyan'. (Ji
pêxarina Siwêdê re) bibeze. Biqêre û bêje birayê min diredivînin.
(Kêrê dikişîne) Hûn mêr in destê xwe bidinê. Ez dê we tevan
biperçiqînim. Nijdevan. Em ketine derdê nanê xwe. Tevli me
nebin!

SERPEL:

Şerm bike be! melkemût! Bavê wê kêrê. Berî niha te negot tiştê me
xwedî dike, şer e? Ji xwe bilî wê hûnê bi çî bijîn. Ku leşker tunebin
dê şer çawa bibe.

DAYIKA WÊREK:

Ma dê di saya serê zarokên min de bibe?

SERPEL:

Welleh xweş e. Şer dê dûlik bixe tu jî hirmiyê. Ji şer sûdê wergire, dema wexta dayînê hat jî baz bide! Li ku ma wêrekiya te hiiiiii? Zarokên te ji te wêrektir in. Natirsin.

EILIF:

Ez natirsim.

SERPEL:

Ma çi tiştê mirov jê bitirse heye? Wekî mînak li min binêrin, ma şer li min nehatiye? Ez di 17 saliya xwe e tevî bûm.

DAYIKA WÊREK:

Tu hêj di heftê saliya xwe de nînî.

SERPEL:

Ez dikarim li bendê bim.

DAYIKA WÊREK:

Di bin axê de.

SERPEL:

Tu dixwazî bêbêjî, tu dê bimirî. Ev heqaret e.

DAYIKA WÊREK:

Ku rast be? Tu dişibî meytê, bi destûr be!

PENÊRÊ SWAZILANDIYÊ:

Her kes ji diya min re dibêje xwediya kerametê. Ji pêşerojê agahiyê dide.

QARQAROK:

Hingê ji rêzdar serpel re jî bêje. Bila piçek keyfxweş bibe.

SERPEL:

Di xema min de nîne.

DAYIKA WÊREK:

Mîxfera xwe bide.

SERPEL:

(Dide) Ji ber ku dê gûyek çêbibe nadim. Ji bo ku em henekên xwe bikin.

DAYIKA WÊREK:

(Kaxezek parşomanê hildide û diçirîne) Eîlîf, Pêxwarina Siwêdê, Kattrîn! Ez ji were dibêjim. Ku em tevli şer bibin, em dê wisa perçe bibin. (Ji serpel re) Haydî, Ez ji bo te bêpere lê binêrim. Ez dê xaçekê li ser vî perçeyê kaxizê. Dê wateya mirinê.

PENÊRÊ SWAZILANDIYÊ:

Lê binêr. Yê din jî vala dihêle.

DAYIKA WÊREK: Ez niha jî qat dikim û tevli hev dikim. Niha bikişîne û pêşeroja xwe hîn bibe. (Serpel ditirse)

QARQAROK:

(Ji Eîlîfê re) Ez herkesî hilnadim. Ez wekî kesek zor beyen dikim tîm zanîn. Lê tu cuda yî. Xwîna min qirijî te.

SERPEL:

(Dema mîxfer tê tevlihevkirin) Bêaqilî. Ji xapandinê zêdetir tiştêk nîne.

PENÊRÊ SWAZILANDIYÊ:

Weyy. Xaçê reş kişand. Karê wî qediya ye.

QARQAROK:

(Ji Êilîfê re) Qet bêzar nebe mêrxaso. Gule nesîbê hemû kesan nîne.

SERPEL:

(Bi dengêk nizim ji Dayîka Wêreka re) Te ev qazix avêt min!

DAYIKA WÊREK:

Te di dem de xwe bi xwe qazix kiriye. haydî ji bo min misade. Her roj şer çêna be. Divê ez biçim ser riya xwe.

SERPEL:

Naaaaa. Hele rawestin. Ez nakevim dafikê. Ez tosunê te hildidim. Ew dê bibe leşker.

EILIF:

Pêxwarina Siwêdê jî dixwaze.

DAYIKA WÊREK:

(Mede nexweş dibe) Yaaa. Demek wisa. Wisa dixuye ku divê ez jî we her siyan re jî falkê vekim. (Ji bo xaçan xêzî ser kaxezan bike, diçe pişt erebeyê)

QARQAROK:

(Ji Êilîf re) Ji bo ku morala me xirab bikin, dibêjin artêşa Siwêdê oldar e. Derew e welleh. Tenê roja yekşemê çarneyek diayê dikarî bixwînî. Ew jî ku dengê xweş be.

DAYIKA WÊREK:

(Bi mîxferê serpel ku perçeyên kaxezan tê de ne, tê) Sefîkno. Diya xwe dihêlin û mîna golikên ji xwê re dibejin, dikevin dû şer ha? Hûn dê bibînin ku cihan rezê gulên nîne. Di şer de nabêjin 'Were egîdo bibe fermandar. Serpel ez bi tirkim ku tu dawiya şer nabînî. Tiştên ku bînin serê we her siyan jî hene. (Mîxferê jî dirêjê Êilîf dike) Hele bikişîne. (Êilîf dikişîne. Dima kaxezê vedike, Dayîka Wêrek jî destê wî dikişîne û hildide) Ha ji te re. Xaçê reş, nîşaneyê mirinê ye. Ah dayîka bêbext. Zarokê te bi hezar janan anî dinê, bi hezar êşan mezin kir, dê bimire. Hem jî di destpêka jiyana xwe de. Mîna

bavê xwe pir zift bû. Lê ku bîaqil be dê di riya goşt û hestî de here. Kaxez dibêje vana. (Diqêre) Tu dê bi aqil bibî?

EILIF:

Ma çima ez bi aqil nebim?

DAYIKA WÊREK:

Hingê divê tu li cem diya xwe bimînî. Bi gotina 'Berxwê dayîkê' henekan bi te bikin jî tu dê guh nediyê.

QARQAROK:

Ku tu bikî nav şelê xwe ez dê birakê te bibim.

DAYIKA WÊREK:

Kanê tu dê bikeniya yî? Kanê were. Niha dora te ye Pêxwarina Siwêdê. (Pêxwarina Siwêdê mîxferê tevlihev dike û dikişîne) Çima te wisa li kaxezê nêrî. Çiye ew? Hene be tu ji destê min neçe. (Kaxezê hildide) Ev jî xaç e. Ku tu mîna di berê de durut nebî, hingê demek roja te hat. Di biçûkahiya te de, dema min tu dişandî nan hildanê, te serê pere dianî. Niha ku tu cardin wisa bî tû dê xelas bibî. Lê binêre serpel, ma xaç nîne?

SERPEL:

Xaç e! Nizanim çawa kêşand. Ez ji wê re matmayî me? Di şer de ez her tim li dumahiyê radiwestim. (Ji qarqarok re) Lêbinêr xapandin nîne, ji xwe re jî dikişînin.

PENÊRÊ SWAZILANDIYÊ:

Yaa! Ji min re jî derket. Lê ez dê li şîretan guhdar bikim.

DAYIKA WÊREK:

(Ji Katrînê re) Tu mayî. Lê ku xaç jî derkeve çi wateya wê heye! Ji xwe derdê herî mezin ji te ye: ji ber ku tu dilsaxî. (Mîxferê dirêjî ser erebeyê dike lê kaxezê xwe ew dikişîne.) Wey, Ez bawer nakim. Qey min xelet tevlihev kir? Ji niha û pêve dilsax nebe keça min. Ji te re jî xaç derket. Bêdeng be. Ev ji te re zor nîne. Ji ber ku tu lal î.

Piyê xwe li gorî lihêfa xwe dirêj bikin. Pêdiviya we bi vê yekê re heye. Eh, divê rewî li ser rîya xwe be. (Mîxferî dide serpel û li erebeyê suyar dibe.)

QARQAROK:

Çareseriyekê peyda bike.

SERPEL:

Ez xwe bêkeyf hîs dikim.

QARQAROK:

Ji ber ku te mîxfer derxist, serê te cemidî. Pîrejinê bi danûstandinê re gîro bike. (Bi dengê bilind) Serpel te çavek avêtiba palaskayê. Zikê van mirovokan bi danûstandinê têr dibe. Hey, li vir binêrin, serpel dixwaze palaskayekê bikire.

DAYIKA WÊREK:

Ji bo wê nîv guldenê dixwazim. Hûn ji duyan kêmtir nikarin bikin. (Ji erebeyê peya dibe) Serpel. Nû nîne kî. Li vira jî pir ba tê. Ez li vir bi rihefî lêbinêrim. (Qawîşê hildide û diçe pişt erebeyê.)

DAYIKA WÊREK:

Zêde jî nayê pa lê.

SERPEL:

Dibe ku nîv gulden bike. Ji ber ku zîv e.

DAYIKA WÊREK:

(Diçe pişt erebeyê) Eyara wê jî xirab nîne.

QARQAROK:

(Ji Eîlîf re) Piştî em dê mîna mêran vexwin. Li cem min wereqe heye. Bi min re were. (Eîlîf bêbiryar e)

DAYIKA WÊREK:

Hingê bide nîv gulden î.

SERPEL:

Min famnekir û çû. Ji serpeleyê bibawerêtir tune ye. Ez her tim li paş dimînim. Yê din dihêlim. Ji bo ku pêşde biçin û navdar bibin. Of be. Roja min bû êbret. Pariyek nan di gewriya min de naçe.

DAYIKA WÊREK:

Bêhna xwe teng neke serpel. Bixwe tişta tu bixwê. Bila cardin jî çavê te li paşiyê be. Ka vexwe firekê ji vir. (şeravê dideyê)

QARQAROK:

(Dikeve milê Eîlîf û wî dûr dixê.) Di siftêde ez dê 10 guldenan bidim destê te. Tu ketî çavê min. Tu dê mîna mêrxasan şer bikî, jin te hevpar nakin. Min bêhna te teng kir. Tu dixwazî şewiya min bişkîne. (Karttrîna lal xwe ji erebeyê diavê û dengên bêwate derdixê.)

DAYIKA WÊREK:

Ez tîm Kattrîn. Hele bila serpel efendî bi awayekê hesabê bide. (Nîv guldenê diqezîne.) Tu baweriya min bi pere re tune ye. Devê min bi şîr şewitî serpel! Neyse xalis e. Em dikarin biçin, Eîlîf li ku ye?

PENÊRÊ SWAZILANDIYÊ:

Bi qarqarok re çû.

DAYIKA WÊREK:

(Piçek radiweste) Ax bêaqil. Ah gêjo. (Ji Kattrînê re) Sûçê te nîne, tu nikarî bi axivî kî.

SERPEL:

Niha jî tu firek vexwe dayîka min. Niha bi kûr dişewite ez bêjim. Çibikim! Wisa dibe. Leşkerî xirab nîne.

DAYIKA WÊREK:

Tu dê bi birê xwe re bikişînê erebeyê Kattrîn. (Her du xwîşk û bira

erebeyê dikişînin û Dayîka Wêrek jî dimeşe.)

SERPEL:

(Li dû wan dinêre) Ku tu bi şer debara xwe bikî, dê xeraca wê jî bidî.

ÇAVKANÎ:

- Dayika Wêrek û Zarokên Wê. Teksta lîstikê. Werger. Îsmet Sait Damgacı û Muammer Sencer. 1967. Çapxaneya Sîralar. Stenbol.
- Dayika Wêrek û Zarokê Wê. Teksta lîstikê. Bertolt Brecht Tevda Lîstikên Wî Berg 8. Weşanên Mitos Boyut. Werger: Ayşe Selen. Kewçêr 1999.
- Mother Courage and Her Children – A Chronicle of the Thirty Years' War. Play. Wergera Îngilîzî Ralph Manheim. Bertolt Brecht: Collected Plays.

DAYIKA WÊREK Û ZAROKÊN WÊ

Notên dramaturjiya episoda yekem.

Bertolt Brecht

Ev tekst ji tereftî John Willet hatiye wergerandin bo Îngilîzyê û bi sernavê "Mother Courage and Her Children" di "Bertolt Brecht: Plays, Poetry and Prose. The Collected Plays -1942-1946-" de (Vol. 5, Methuen-Londra, 1985) hatiye çapkirin.

Çîrok

XÊZÎKA DRAMATÛRJİYÊ

1

Ev sehne dikirpîne ku em hêj di destpêka bûyeran de ne. Hewldanên ku em lê aşîna ne wek karê kantînê yê Dayika Wêrek û şerê nuh (Dest pê dike û berdewam dikin; bi berdewamkirinê dest pê dikin). Pêdivî: enerjî, hewldan, hêviyên qirneya nuh, ticareta ku bi talûkeyên nuh tê. Dayika Wêrek hesreta şer dike lê ji alîkî jî jê ditirse. Dixwaze beşdarî wê bibe, lê weke jinek karker a aşîtperwer naxwaze wiya bi awayekî cengawerî bike. Dixwaze îdara malbata xwe di dema şer de û bi xêra şer bike. Dixwaze xizmeta ordiyê bike lê di heman katî de jî dixwaze ji kontrola wê dûr bimîne.

Zarokên wê: Ji egitiya lawê xwe yê herî mezin çavê wê ditirse, lê bi baqiliya wî bawer e. Ji bêhişiya lawê xwe yê biçûk çavê wê ditirse, lê bi durustiya wî bawer e. Ji merhametiya qîza xwe çavê wê ditirse, lê bi lalbûna wê bawer e. Lê wê derkeve holê ku di tirsên xwe de ne neheq e.

Hêvî dike ku wê ji ticaretê fêde bike, lê ber bi îflasê diçe.

Lîstik bi antreya mirovên şer (yanê bi bendemaniya wan) dest pê dike. Bêrêkûpêkiya mezin a şer bi rêkûpêkî dest pê dike, tevliheviya mezin jî bi organîzasyonê.

Dîmeneke aram a gundewarî û mirovên çekdar. Dayika Wêrek çar tê, sê dere.

2

Şer weke îdîlek ticaretê. Dayika Wêrek, gundiya bi firotina werdekeka stewr dixapîne, lawê mezin gayê gundiyan didize. Law xwedî nav û mal dibe; Dayika Wêrek fêde dike. Ordîyê jî bi awayekê talan dike. Ji bo lawê wê talûke li her derê zêdetir dibe.

3

Hêsîrbûna wê, ji bo karê wê ileh jî ne dezavantajek e. Xuya bû ku ji bo beşdariya lawê wê yê biçûk li ordîyê weke bawermend, tiştêkî bigota tune bû. Li gorî fikra wê tiştê ku tenê lazim e ji bo rewşa lawê wê durustiya wî ye. Sebeba mirina lawê wê jî ev e. Ger lawê wê bi ordîyê neketa têkiliyê nedihat kuştin. Bazara rikînî ya Dayika Wêrek ji bo erebeya xwe, dibe sedema mirina lawê wê. Nahêle qîza wê bibe fahîşe –di dema şer tekane kar ji bo qîza wê fahîşetî ye û ev kar bi Yvetteyê serwetek mezin daye qezenc kirin. Her çibe jî, Dayika Wêrek ne Antigone ye.

4

Dayika Wêrek, bo xatirê karê xwe, reaksiyonên xwe yên insanî (destdirêjî, serîhildan û nirxêyên bi her awayî) divemirîne. Hêvî dike ku wê teslîmîyet ji bo wê fêde bike.

5

Dîsa jî, carinan reaksiyonên insanî ji regezên kar girîngtir dibin. Serfiraziya General dibe sebeba wendakirina malî.

6

Karê ku rihela qîza wê (di dema aşîtiyê wê bikaribe) daye ser hev, dema şer wê kirêt dike. Dayika Wêrek bi dirêjîya şer bawer e, her çiqas şer pere tîne jî tê mana ku qîza wê jî li malê maye. A dawiyê, cara ewil naletê li wî şerî dike ku bi nêrînek ticarî ihtiyaca wê pê hebû.

7

Dema aşîtiyê, her çiqas felaketê bi xwe re bîne jî, dîsa xweş e. Piştî aşîtiyê, ji dêvla lawê xwe bistîne, lê bi sewdaya mal wî bi yek carî wenda dike. Li aliyê din, ji bo qîza wê aşî gelek dereng tê. Lawê wê, di dema şer, ji ber ku serî li quralên şer xistiye dimire. Fahîşeya kevn ya ordîgehê Yvette Pottier, di netîca şer dibe xwediyê mal û mulk, û bi serhengê re dizewice. Şer ji nuh de dest pê dike. Gelo, kar jî wê ji nuh de vebe?

8

Kar baş nabî. Şer ji hedê xwe zêdetir dirêj bûye. Li her derê tevlihevî û bêrêkûpêkî hukum dike. Dayika Wêrek, di stranek xwe de (di qilixê parsekan de) lanet li fezîletên insanî dike ne tenê ji ber ku ew ne-ticarî ne, lê ji ber ku birastî jî bi talûke ne. Ji bo qîza xwe, mecbûr dimîne terka aşpêj bike ku wê malek lê sitar biba bidayê. Merhameta ji bo qîza xwe, wê dike mehkûmê şer.

9

Qîza wê, ji ber merhameta xwe ya ji bo zarokên mirovên din, ji jiyana xwe dibe. Dayika Wêrek bi revê û bi tenê erebeya xwe dikêşe û li paş ordiya belavbûyî rê dikeve. [Ji Werner Hecht (edîtor): *Materialen zu Brechts "Mutter Courage", Frankfurt, Suhrkamp, 1967, r.7-9*]

Modela Dayika Wêrek

Niha, piştî şerê mezin, jiyana li bajarên me yên xirabe berdewam dike, lê ev jiyaneke cuda ye; jiyana civakên ku ji terefî şertên derdora nuh ve –nuh, jiberku her tiştê rûxiyaye- tîr berbestkirin an bi sînokirin, cuda an jî bi şêweyek cuda hatine ser hev. Komên mezin ên xurdikan ketibûn ser binesaziya bajêr ya giranbiha, ser qenalên av û qanalîzasyonê, boriyên gazê û qabloyên ceyranê. Hetta, avahiya mezin ku saxlem mabû jî ji xirabeyên derdora xwe tesîr dibû, ji bo plankirinê asteng teşkîl dikir. Avahiyên demborî lazîm bû ku bihatana avakirin, hertim jî talûka payîdarbûna van

avahiyan hebû. Ev gişt di hunerê de tê deng vedan, çimkî şêweya fikirandina me perçakî şêweya jiyana me ye. Di teatroyê de, ji bo tijekirina valahiyê em modelan bi kar tînin. Ew, derhal li muxalefeta xurt a piştgirên terzên kevn rast tînin, li rûtîna ku xwe li paş maskeyên tecrûbê vedişêrin rast tînin; û li lihevkerina bi derewa ku xwe weke azadiya afirîner bi nav dike rast tînin. Û ji terefê mirovên ku berî bielimin çawa tînin bikaranîn, dikevin nav talûkeyê. Model her çiqas ji bo ku karan rihet bikin hatine saz kirin jî bikaranîna wan tiştan ne rihet e. Modelan, ne ji bo ku fikran bêkêr bike, lê ji bo fitkirinê; ne ji bo afirînera hunerî ji ciyê wê bike, lê ji bo ku zorê bidê hatine sêwirandin.

Tiştê ku berî her tiştî divê bala mirov bikşîne; agahiyên –li vira maceraya Dayika Wêrek û qeybên lê dûçar maye- ku tekstên nivîskî derheqê bûyerên diyar de dest xistine heta dereceyekî hatine temam kirin; çaxa ku meytê lawê Dayika Wêrek tê, rûniştina li cem qîza wê ya lal û rewşên bi vî şiklî êdî hatine saz kirin –weke agahiyek ku çaxa hunermendek ji bo bûyereka dîrokî resm bike, bi ew mirovên ku wê bûyerê dîtine bide ber pirsê, digihêje ye. Hunermend detayên belû bi vî an jî wê sebeba maqûl dikare biguherîne. Hetta ku kopyakirina(û avakirina) modela bi rêyek zindî û jîr bielime, gelekî serî li kopya nexa baştir be. Mîna maqyaja aşpêj, kostumê Dayika Wêrek dibê neyê kopyakirin. Gerek model ji hedê xwe zêdetir neyên bikaranîn.

Resm an tasvîrên pêşangekê tîrê nakê. Heke hewayê hevokê, şêweya herikîna û ajoya li pişt aksiyonê bê dayîn jî –ku ev gelekî zehmet e- bi têderxistina berê karakterekî, mirov nikare zêde tiştan bielime. Kesên ji bo teqlîtekê kêrhatî û modelên(pattern) kesan ne eynî ne, bi van kesan model nabe ku bigihêje jiyane. Kesê ku layiqî navê hunermend e, yekta ye; ew tiştêkî gerdûnî pêşkêş dike lê vî ya li gorî terza xwe ya xweser dike. Ew, ne bi awayakî mukemmel dikare teqlîtekê bibe, ne jî teqlîtekê mukemmel pêşkêş bike. Ji bo hunermendan teqlîta hunerê jî, biqasî teqlîta jiyane ne girîng e. Karanîna modelan celebek taybet a hunerê ye û tiştên ku tu jê bieliminî sînorekî wê heye. Dibê armanc, ne kopyakirina modelê, ne

ji ji wê pir zû dûrketin e.

Çaxa li ser tiştên li jêr hatine nivîsîn -gelek daxuyanî û dîtinên ku di dema provaya lîstikekê de hatine bi destxistin- bê xebitîn, berî her tiştî, ji bo ku li ser pirsgerêkan bi xwe bê sekinandin, divê ku rêberiya çareseriyê pirsgerêkan diyar bê bikaranîn.

Muzîk

Muzîka Paul Dessau ya ku ji bo Dayika Wêrek çêkirbû bi taybetî divê nehata awayekî ku bi rehetî bihata guhdarîkirin; mîna dekora sehneyê wê ji bo temaşevan tiştek dihêla ku temam bike; di dema guhdarîkirinê de temaşevan, mecbûr bû ku dangan bi awazê bike yek. Huner ne erdê Cockaigne ye. Kengî straneke ku bi awayekî rasterast ji aksiyonê nehê, an ji aksiyonê were ji bi eşkerayî ji wê cihê dimîne hebe, ji bo derbaseya beşên muzîkî û ji bo feraseta ku muzîk peyvên xwe bibêje me ji sofîtayê ber bi jêr ve amblemek muzîkî hejand. Ev, trompetekê, daholekê, alayekê û kadên ceylanê yên dibriqîni dihewand: çaxê digihîşt sehneya 9 an bi halekî gelekî xirab derdiket holê ji tiştêkî ku seyra wê kêyf dide û, xefîf û nazik e. Hin mirov vêya weke qirfoka hûr û tiştêkî dûrî rastiye nirxandin. Lê, wextê qirfokî di nav sînoran de bê girtin divê di teatroyê de li qiraxekê neye avêtin, li aliyê din muzîkê, ji ber ku alîkarî ji rastiya aksiyonê cihê digre tiştê em dikin ne bi yek carî ji ne nerastî ye. Me, wê, ji bo nîşanek xuya ku çûna astek din – asta muzîkê- a hunerî û ji bo nêrîna rast, yanî vana bi armanca ku ketinên-navbera muzîkî bide hîskirin karanî, ne ji bo fikirandina mirova ji awayekî gelekî xelet ku muzîk “ji aksiyonê tê” karanîn. Yên îtirazî vê dikin, bi her tiştê ku carekê tê xuyanê carekê wenda dibin, ên ne organîk û ên hatine ser hev dû bi temamî muxalîf in – sebeba sereke a vêya lîdijberiya wanî ku her celebên şikenindina îluzyonê ye. Ev tiştê îtiraz dikin dibê ne nîşana muzîkê a xuya be, lê terza (yanî, ketinên-navberan) tevlêbûna numarên muzîkî di lîstikê de ba.

Muzîsyenan bi rewşek ku bên xuyanê li locayekî li kêleka sehneyê hatibûn bicihkirin –bi vî hawî îcraya wan, bû mîna konserên biçûk û di niqteyên musaîd ên lîstikê de alîkariyên serbixwe. Loca bi sehneyê ve giradayî bû, bi vî hawî wextê ku hewceyî bi trompetê boriya, civînê lêbixista an jî muzîk weke perçayek aksiyonê derdiket hole, yek an du muzîsyen dikarîbû biçe paş sehneyê.

Me bi overture dest pê kir. Ji ber ku tenê ji terefî çar muzîsyenan dihat îcra kirin hebekî qels bû; dîsa jî, ji bo tevliheviyên şer, têra xwe haziriyek rêûresmî bû.

Dîzayna Sehneyê

Ji bo produksiyona ku em niha di Berlîn Deutsches Theaterê de teswîr dikin, me modela tê zanîn a Teo Otto ku di dema şer de ji bo Zurîch Schauspielhaus teswîr kiribû bikaranî. Konên encaq di qerargehên leşkerî ên mezin ku di sedsala 17an de hebe, îskeletekî sabit hebû ku ji malzemeyên mîna rewten bi xilatan bi hev dû re hatiye girêdan hwd. û ji perdeyên gelekî mezin avabû. Him ji aliyê konstruksiyonê him jî malzemeyê ve avahiyên sê firehî ku ji bo temsîliyeta bînayên mîna malên presbitî û gundiyan hebe li sehneyê hatine bicihkirin, lê di hundirê kurtkirina hunerî de, tenê qasî hewcêkirina aksiyonê hatine rêdan. Projeksiyonên bi renk bi ser cyclorama de hate dan û sehneya zîvirokî ji bo dîtinek rêwîtî bê dan hate bikaranîn –me firehî û cihê perdeyan bi çeşît kirin û tenê ji bo sehneyên kampê bikaranî; bi vî awayî me ew ji sehneyên ku di rê de derbas dibin cihê kir. Dîzaynirê sehneyê yê li Berlînê li gorî eynî prensîban ji bo bînayan (ku di sehneya 2, 4, 5, 9, 10, 11 an de) versiyonên xwe tetbîq kirin. Me dev ji projeksiyonên plana dawîn ku li Zurîhê dihat bikaranîn berda û navên curbecur ên welatan, bi tîpên mezin ê reş li jora sehneyê daleqandin. Li gorî tesîsata me dest da, me ronahiyek sade û spî bikaranî. Bi wê riyê, her çeşît “atmosfer” a ku bi rehetî li ser bûyeran rengêkî romantîk bide, me ji holê rakir. Ji xeynê vê me her tişt heta bi detayên xwe yê biçûk (qurmê êzinga dişkîne, ocax hwd.) parast, bi taybetî jî

cîhkirinên erebê ên tê ecibandin. Ev a dawiyê pir girîng e, ji berk u di serî de avakirina gruba û tevgerê diyar dikir.

Bi awayekî ecêb, bi feragatkirina ji azadiya temam a "avakirina hunerî" tiştên pir hindik hatin wendakirin. Li cihekî, bi tiştêkî divê hûn dest bi xebatê bikin û ev, dibe ku tiştêkî hûn ji berê de li ser wê bi her hawî fikirîbin jî. Azadî, bi rêya rêgeza nakokiyê ku di hundirê me de gişta her dem bifaal e û tê zimên wê bê bidestxistin.

Teatroya Rastîparêz û Îluzyon

Goethe, di 1826 an de behsa "paşdemayîtiya sehneya axşeb a Îngilîza" ji bo serdema Shakespeare kiribû. Dibêje "Bi xêra makîneyan, hunerê perspektîfê û pêşketinên di kostumê de, li vir tu nîşana alîkariya xwezayê ku em lê elimîne ne maye." Dibêje "Kî", "dikare îro tehemmulê tiştêkî wiha bike? Di bin van şertan de lîstikên Shakespeare wê bibin çîrokê periyê ên gelekî enteresan û wê bibin çîrok ji terefi hin şexsan ku ji bo têsîra wê zêde bibe jî wê karekterên derxin holê, û wê vê li gorî çîrokê bi hatin û çûn û hereketan bînin cih. Lê wê bibe çîrokên periyê ên enteresan ku ji temaşevan re tahayula cennet û serayan dike li ser sehneya vala."

Ji cergiya ku wî ev peyv nivîsandîye, ev sedsal e tesîsata mekanîk a teatroyên me tîr pêş xistin. Û "alîkariyên xwezayê" hevqas li ser îluzyonê bal kişandin ku, em zarokên doh, ji dêvla Sheakespearekî qet bikaranîna sêwirandinê hewcenake an pêşkarîname, bi Shakespearekî li sehneyek vala pirtir dilxwaz in.

Pêşketinên di îluzyona mekanîk ên di dema Goethe pirtir bê zerar bûn, çimkî makîneyan hevqas di demek nekafî û nuh de bûn ku teatro bi xwe hîn rastiyekek bû û him sêwirandin û him jî hostatî ji bo xwezayê bizîvirîne hunerê dihat bikaranîn. Dekor, hîn weke ekrana teatral bûn ku dîzaynirê sehneyê şeweyek hunerî û helbestî a mekanên pêwendê pêşkêş dike.

Teatroya klasîk a burjuvayê, di rêya ku deri îluzyona naturalîst niqteyek nîvrê a bikêf cih girt. Makîneyên sehneyê ji bo pêşxistina pêşkêşkirina hin hêlên rastiyê, heger danhîskirina ku ji temaşevan re bêje hew ne li teatroyekê ye, ne dabe jî, heta bê bes hemana îluzyonê dan; huner hîn, neketibû rewşek ku mirov bibêje tevda nîşanên ku bi parastina xebatbariya hunerê eleqedar e jê çûne. Ji ber ceyran tune bû, efektên ronîkirinê hîn kevnare bûn; ecibandina bayaxi ku efektên roj avayê dixwest, teçhîseta amiyane ne dihişt sihra tevdeyî derkeve holê. Kostumên otantîk ên Meiningerler taliyê hate; her tim ne xweşik ba jî, pir caran delal bûn û dîsa jî bi terzek peyva ne-otantîk hatin telafîkirin. Bi kurtayî teatro, bi kêmasî li ciyê ku di karê xapandina xwe ne serfiraz dibû, weke teatroyê ma. Îro, restorasyona ku rastiya teatroyê weke teatro şertê yekemîn e ji bo hema yek jê temsîliyeta rastî a têkîliyên mirov. Di dekorê de îluzyonê ji hedê xwe pirtir teksîfkirin bi temaşevan re terzek lîstikvaniya “manyetîk” ku îluzyona demborî û tesadufî di bûyereke “rast” de amadebûnê çêdike. Her wiha, nêrînek xwezayî ku hew kes hukmê xwe, sêwirandin û reaksiyona xwe nikare têxe dewrê û tenê, bi rêya li hevûna parkirina tecrûbê û mecbûriyeta bibe objeyek “xweza”yê çêdike. Îluzyona ku teatro ava dike dibê qismî be, bi vî hawî jî bo her dem hebûna îluzyonê dikare bê ferqkirin. Rastî, ger bi awayekî bêkêmasî jî bê pêşkêşkirin ji aliyê huner divê bê guhertin; bi vî hawî girêdayîbûna guhertinê dikare bê dîtî û bi vî hawî bê nirxandin.

Ha ji ber vê sedemê îro, em daxwaziya xwezayîtiyê dikin –jiberku em dixwazin xwezaya têkîliyên me yên insanî biguherînin.

Hêmanên Îluzyonê?

Bêguman dîtina cyclorama ku bi temamî li paş sehneyek (di pêşlîstikê û di sehneya heft û dawiyê de) vala ye, bi ezmanê li ser weke îluzyona dîmenek çol a rast ava dike. Îtirazek li vê nabe, çimkî ger ku îluzyonek wiha çêbe, divê di ruhê temaşevan de perçek hişyariya helbestî hebe. Bi saya hêsaniya di afirîşa xwe de,

lîstikvan bi rêya terza lîstikvaniya xwe, pêşîn, dikarin nerîna ku li himbera teşebusa kar a malbata erzaqvanê biçûk hawirek fireh dirêj dibe û paşî jî mayînek bi ji hev ketina bê dawî a lêkolînerê serwetê yê bêhal hîskirin bide. Ê her dem, em karin hêvî bikin ku ev nerîna cewherî a lîstikê bi yeka din î formel ve wê bê girêdan: Yanî, temaşevan dema wê sehneya vala ku wê di nêzîk de bê tijekirin dibîne, valehiya pêşîn ku her tişt ji wê/î zayiye wê di karibe wê tevî bibê. Li ser vê tabula rasa , ew dizane ku lîstikvan ji hefteyan ve ye dixebite, ewil detayekê test kiriye, dawiyê jî bi ceribandina yeka din re, di hundirê herikîna dîrokî de tiştên çêbûne bi rêya resmkirinê û vana bi darizandina resmkirinê elimiye. Ê niha lîstik dest pê dike û ereba Dayika Wêrek dikeve sehneyê.

Di rewşên mezin de tiştêkî wek nêzîkîhevkin (approximation) xweş mumkun be jî, di rewşên detayê de ev tişt ne mumkun e. Portreyek rastîbîn di kostum û tesîsata sehneya de detayên xebatek bi balkêş dixwaze, çimkî li vir sêwirandina temaşevan tu tiştî nikare tevî bikê. Tevda amrazên ku derheqî xebat û xwarinê de dibê ku bi evîne hatibin çêkirin. Ê bêguman kostum, nabe ku weke ji bo festîvalek folklorê hatibin dirûtin; divê şopên kesayetî û çîna civakiyê pê re hebin. Demek dirêj an kin hatine lixwekirin, ji malzemeyên erzan an buha hatine dirûtin, baş an xirab hatine nerîn hwd...

Kostumên ji bo ev berhema Dayika Wêrek [Kurt] Palm amade kir.

Tiştê ku pêşaniyek Dayika Wêrek û Zarokên Wê weke prensîpî dixwaze rê bide çiyê?

Ev e ku di demên şer de yê qezencên mezin dikin ne mirovên biçûk in. Ev şer e ku berdwamiya ticaretê bi amrazên wekî din dike û fezîletên insanî ji bo yê xwediyê fezîletan be jî tîne halê mirinê. Ê di tekoşîna hemberî şer de tu fedakarî ne mezin e.

Pêşlîstik

Bi xêra pêşlîstikekê, çaxê ku Dayika Wêrek û malbata wê ya biçûk ber bi devera şer derin, hatin rêdan. Dayika Wêrek strana ticatê a di sehneya I de got (bi vî hawî piştî bersiva “Em esnaf in” a di sehneya I de hema pirsra çawîş hat: “Bisekinin, pîsên dera hanê. Hûn ji kê ne?”). Piştî uverturê, ji bo lîstikvan ji zehmeta gotina stranê ku teqereqa dengê sehneya zîvirok derdixe bixe, qitaya ewil wextê sehne tarî bû ji bandê hate lê xistin. Taliyê dikeve pêşlîstikê.

Rêya Dirêj a Diçe Şer

Nîv-perdeya kitan ku taliyê wê li ser de sernivîsên sehneyê bîn rêdan vedibe û ereba Dayika Wêrek, bi hereketkirina tersa îstîqameta zîvirê ya sehneya zîvirokê dikeve hundir.

Erebe tişteki mîna navbera makineyekleşkerî û dikanek ku tu çi bixazî bêdîtin e. Li aliyekî erebê du tabelayên “Alaya Fîn a duyemîn” û “Dayika Wêrek, Beqaliye” dinivîse hatibû daliqandin. Li ser brandayê sosîsên Swes ku ji goştê domiz çê bûye, li ber serê etîketa fiet ku “Çar Gulden” dinivîse tîn pêşkêşkirin. Erebe her here wê guhertinên curbicur bistîne. Li gorî rewşa kar, li ser wê carna hîn pirtir carna hîn hindiktir mal bê daliqandin, branda wê hîn gemarîtir an hîn pakjir bibe, nivîsên li ser tabelayê carna wê jê here paşê wê wek roja ewil bê boyaxkirin. Lê ewil paqij û ji hêla mal ve dewlemend e.

Erebe ji terefî du lawan tê kişandin. Benda duyem a Strana Ticaretê ya Dayika Wêrek dibêje: “Gelî qumandanan, zîlamê we / Bi zîkê vala nikarin bimeşin mirinê.” Li pêşîn Kattrina lal a li harpa Cihû dixê û Dayika Wêrek rûniştîne. Dayika Wêrek bi rehetiyek betal, bi erebê re diheje û dibênije. Tevî gavekê ku zivirî û li paş nêrî jî, her tişt rê dide ku erebe ji rêyek dirêj tê.

Me stran weke destpêkek dramatik sêwirandibû, zindî û bêhawe – me sehneya dawiyê a lîstikê dida ber çava. Lê Weigel wê weke

stranek kar a rastî dît û stranê ji bo bi armanca resmkirina rêwîtiya dirêj ku ber bi şer de dere bêkaranîn pêşniyazkir. Fikrên wiha encax ji lîstikvanên mezin derdikevin.

Piştî ev neqlekê bi vî hawî hate sazkirin, bi pêşandana rêwîtiya dirêj a jina kar ku ber bi devera şer de dike, em fikirîn ku bi awayekî temamî belû em ê rê bidin ku ev beşdarî şer î bizav û jidil e. Lê belê, hin nixandî û gelek nîqaşên ku bi kesên li lîstikê temaşe kiriye hate kirin rêda ku pir jimarek kesan Dayîka Wêrek weke nûnerê “mirovên biçûk” “Bi zorê beşdarî şer bûye”, “qurbanên bêçare yî şer” hwd. bibînin. Elimandinek mîna reha xwe bera kûr daye, mudavîmê teatroyê, ber bi sitendina pirtir îfadeya coşî ya karakteran û paşçavkirina wekî din her tiştî dike. Mîna tesvîrên dîmenên di romanên de referansên ji bo ticaretê tê kirin jî bi aciziyê tê pêşwazîkirin. “Atmosfera ticaretê” hema bi herî asayî hewa ku em distînin e, ji ber wiha hewceyî behsek taybet nake. Ê bi vî hawî, ligel tevda xebatên me ku ji bo şer weke yekûnek bazara ticarî pêşkêş bike, nîqaş ji nuh de û ji nuh de rêda ku mirov li şer bi çavekî razberkirinê yî dervî zeman dinerin.

Pir Kin, Dibe Ku Pir Dirêj Be

Esa di navbera her du bendên strana destpêkê û dema ku di navbera ev her du bendan çûna bédeng a erebê wextekî diyar distend, ev di provayê de bi me ewil pir dirêj hat. Lê çaxê ku me benda diduya qut kir pêşlîstik hîn dirêj û esa navbera bendan qut kir jî, hîn kintir hat dîtîn.

[...]

Sehne 1

Jina kar Anna Fierling ku weke Dayîka Wêrek tê naskirin li ordiya Swêd rast tê.

Nivîsevanê leşkeriyê li welat li leşkerê ku ji bo di şer de bê xerckirin digeriyan. Dayika Wêrek malbata xwe ya tevlihev ku ji curbecur meydanên şer hatine peydahkirin bi çawîşekî dinasîne. Jina kantînvan lawên xwe ji nivîsevanên leşkeriyê bi kêrekê diparêze. Dibîne ku lawên wê guhê xwe dane nivîsevanên leşkeriyê û qehaneta ku wê çawîş mirinek zû bibîne dawêj holê. Ji bo zarokên wê bitirsin dibe sebaba ku ew jî xaçên reş bikşînin. Dîsa jî ji ber bazarek ticarî ya biçûk, lawê xwe yê wêrek wenda dike. Û çawîş ji cem wê bi avêtina qehanetekê dere.

Ger tu dixwazî şer ji te re bişuxile
Mecbûrî divê tu bedela wê tu bide

Verastkirina Giştî

Nivîsevanê leşkeriyê li welat de li leşkerê ku ji bo di şer de bê xerckirin digeriyan. Çawîşê ku li sehneya vala li ciyê çavnêrkirinê yê pêş rastê disekine û nivîsevanê leşkeriyê bi dengêkî kêr ji bo qomitanên xwe ji zahmetiya dîtina leşkera ku ji bo di şer de bê xerckirin gazine dikirin. Ev bajarê ku çawîş behsa wê dike, li dewsa orkestrayê dihat hesab kirin. Ereba Dayika Wêrek diyar dibe û bi dîtina zilamên xort girêza devê nivîsevanên leşkeriyê diherike. Çawîş ban dike "Bisekine!" û erebe disekine.

Dayika Wêrek malbata xwe ya tevlihev ku ji curbecur meydanên şer hatine peydakirin bi çawîşekî dinasîne. Ticaret û erbabê şer tèn cem hev, şer dikare dest pê bike. Li hemberî menzereya leşkera Fierlingan dibe ku demekê weke tirsiyabin bisekinin: Leşkerên li terefê wan heman wextê dujminên wan e jî; şer çawa dizane bide, dizane bistîne jî. "Roj baş, çawîş" a Dayika Wêrek eynê wek peyva çawîş ê kin û qut û bi monotoniyek leşkerî gotiye "Roj baş, hevalno" tê gotin. Wextê ku ji erebê dadikeve, nêrîna xwe yê ku li rêdana qaxezan weke formalîtek nehewce di navbera profesyonelan de ye diyar dike ("Me fam kir, em ê usûlan gişan bînin cih"). Malbata xwe ya biçûk ku li curbecur meydanên şer hatine peydahkirin bi tewrekî henekî dinasîne: Perçakî tewrê

“Dayika Wêrek” distîne.

Erebe û zarok li çepê, nivîsevanên leşkeriyê li rastê ne. Dayika Wêrek bi qutiya xwe ya tenekê ya tije qaxiz re derbasî aliyê din dibe. Bang lê hatiye kirin, lê ew di heman wextê ji bo li derdorê miqate be û kar bike ketiye êrîşê. Zarokên xwe ji dûr ji aliyê din ê sehneyê dinasîne, tê bê qey wê çêtir biparêze. Nivîsevanê leşkeriyê ji dawiya wê tê cem zarokên wê, wan dixapîne û dikeve êrîşê. Nuqteya herî girîng, di replîkên “Lazimiya tê yî demançeyek baş an toqeyek kemerê tune ye?” û “Lazimiya min û tişteki din heye.” de ne.

Jina kantînvan lawên xwe ji nivîsevanê leşkeriyê bi kêrekê diparêze. Çawîş jinê li ciyê wê ber dide û li paşî xwe bi nivîsevanê leşkeriyê re ber bi lawên wê dere. Li sînga wan dixê, li paqên wan dinêre. Paş ve vedigere û li pêş Dayika Wêrek disekine: “Çira ev ne di ordiyê de ne?”. Nivîsevanê leşkeriyê bi lawan re maye: “Em binêrin hela bê lawê diya xwe ne, ya na?”. Dayika Wêrek direve tê, xwe davê navbera nivîsevanê leşkeriyê û lawê xwe: “Erê lawê diya xwe ye”. Nivîsevanê leşkeriyê (ê rastê) dere cem çawîş û gilî dike: “Gava din ez çavtirsandî kirim”; Dayika Wêrek Eilif ê xwe digre dûr dikeve. Çawîş dixwaze qanî bike lê Dayika Wêrek kêrekê dikşîne û lawên xwe diparêzîne û bi xezebê derdikeve pêşiya wan.

Dibîne ku lawên wê guhê xwe dane nivîsevanên leşkeriyê û qehaneta ku wê çawîş mirinek zû bibîne dawêj holê. Ji nuh de dere cem çawîş (“Mîxfêra xwe bide min”). Zarokên wê devê wan vekirî ji paş wê tîn û dinêrin. Nivîsevanê leşkeriyê bi kêlekê ve hereketekê dike, ji paş ve tê cem Eilif û bi wî re dest bi peyvê dike.

Piştî teredutekê kin çawîş xeca reş dikşîne, zarokên wê bi awayekî tatmînbûyî vedigerin erebê, lê nivîsevanê leşkeriyê dawiya wan bernade. Û çaxê Dayika Wêrek vedigere (“Dibê ez bidim rê”) nivîsevanê leşkeriyê di navbera du lawên xwe dibîne; destên xwe avêtiye piyên lawê xwe.

Ji bo zarokên wê bitirsin dibe sebaba ku ew jî xacên reş bikşînin. Serhildana li hêl wan ji hedê xwe derketiye. Hêrsbûyî direve paş erebê ji bo ji zarokên xwe xecên reş resm bike. Wextê bi mîxferê tê pêşiya erebê nivîsevanê leşkeriyê bi ken zarokan li cem wê ber dide û dere cem çawîş (ê rastê). Meresîma nexweş çaxê xelas dibe, Dayika Wêrek dere cem çawîş, mîxfera wî lê vedigerîne û bi ta sarî bi qoltixa erebê radipêlike. Lawan erebe hazir kirin, erebe dest bi meşê kir. Dayika Wêrek, heqê vê rewşê bûye.

Dîsa jî ji ber bazarek ticarî ya biçûk, lawê xwe yê wêrek wenda dike. Lê çawîş bi tamamî wenda nekiriye; bi tewsiya nivîsevanê leşkeriyê danûstêninê pêşniyaz dike. Dayika Wêrek sorbûyî, ji erebê dadikeve û çawîş wê dikşîne dawiya erebê. Çaxê bazar dewam dike, nivîsevanê leşkeriyê hefsarê Eilif derdixe û wê dibe. Katrin vêya dibîne, ji erebê dadikeve û dixwaze bi derewa bala Dayika Wêrek bi ser windabûna Eilif bike. Lê Dayika Wêrek bi bazarê eleqedar e. Piştî ku cuzdanê xwe digre tunebûna wî ferq dike. Demekê di dest palaskayan li ser dingilê erebê rûdinê dimîne. Paşî bi xezebê tiştên destê xwe davê hundirê erebê û malbat bê yekî, bi acizî dide rê.

Û çawîş ji cem wê bi avêtina qehanetekê dere. Bi ken, kehaneta ku heke ew ji şer fêde hêvî bike, mecbûre bedelê wê jî bide dike.

[...]

Nivîsevanê Leşkeriyên

Sehneya vala a di pêşlîstikê de bi xêra çend heb gîha ku aliyên rêyasereke weke zivistanê tanî bîr, kirin weke deravayek berbiçav. Li vir leşkeran teqteka diranên wan di nava zirxên xwe sekinîne.

Bêrêkûpêkiya mezin a şer bi rêkûpêkiyê, tevlêheviya wê bi saziyê dest pê dike. Ên pirsgirêkan derdixin pirsên wan bi xwe hene. Şikayetên wek ku ji bo şerek dest pê bike jîrbûn hewcêye tê guhên me. Leşker ticar in. Pirtûkek biçûk a çawîş serî lê dixê, a

nivîsevanê leşkeriyê jî xerîteyek ku di ceografiya alîkariya wî dike heye. Pevgîhaştina şer û ticaretê di wextekî kin de ne mumkun e.

Tesnîfkirin

Wê hin zehmet derkevin di îknakirina lîstikvanên çawîş û nivîsevanê leşkeriyê dilîzin ku ji bo li cem hev û li ciyekî bin heta ku erebeya Dayîka Wêrek diyar bike. Di teatroya me de, kom her tim ji bo belavbûnê meylidar in; ev qismek ji ber ku her yek lîstikvan bawer dike ku wê bala temaşevan bi gerînê û bi ciyê xwe guhertinê zêde bike, qismek jî ji daxwaza bi tenê bimîne ku ji bo bala temaşevan ji komê bistîne û bîne ser xwe tê. Lê ji bo leşkeran li ser hev bigre tu sebep tune ye, tersa wê, cih guhertinek him nîgajê him jî argumanê dibe qels bike.

Guhertinên derawa

Derawa, ger ne ji sebebek muchîr be dibê bîn parastin; û daxwaza varyetekirinê ne sebebek muchîriyê ye. Ger yek li daxwaza varyetekirinê bilikume, encam wê ketina qiymeta tevda hereketên li ser sehneyê bibe; temaşevan wê dev ji lêgerîna ku di paş her hereketekê maneyek xweser heye berde qet hişê xwe nade hereketê. Lê bi taybetî di nuqtayên girîng ên aksiyonê divê têsîra xurt ku guhertinek derawayê çê dike neyê qelskirin. Varyeteya meşrû, bi rêya tespîtkirina nuqtayên girîng û plankirina rêkûpêka derdora wan tê dest xistin. Mînak, nivîsevanên leşkeriyê Dayîka Wêrek guhdarî dikin; bi axaftina xwe ya dirêj bala wan dikêşîne aliyê din û wan kêfxweş dike û bi vî hawî di xweşkirina dilê wan de serfiraz bûye; heta wê çaxê tenê bûyerek bêoxir çê bûye: Çawîş qaxizên wê pirsîye, lê li wan ne netiye –tenê armanca wî ew e ku li wir pirtir bimînin. Dayîka Wêrek gava din davêje (bi fizîkî jî; ber bi çawîş dere, toqeya wî ya kemer digre û dipirse: “Tu toqeyek kemer naxwazî?”), ji bo tiştan bifroşe dixebite û ha di wê wextê nivîsevanên leşkeriyê dest bi aksiyonê dikin. Çawîş bi bêoxirî

dibêje “Lazimiya min û tiştêkî din heye” û bi nivîsevanê leşkeriyê re ber bi kurikên li dingilê erebê rûniştîye derin. Nivîsevanê leşkeriyê tê bê qey li belgîra dinêre li kurika dinêrin. Nuqteya herî girîng, bi pîrsa ku çawîş vedigere û li pêşîya Dayika Wêrek disekine “Çira ne di ordiyê de ne?” dibêje tê bal kişandin (Tesîra hereketên wiha, dibê ku çaxê lîstikvan bi hereket be bi axaftinê neyê qelskirin). Ger lazimiya guhertina derawa ji bo ji temaşavan re pêşkêşkirina hin pêşveçûnan be, hereket divê ji bo aksiyonê û îfadekirina tiştêkî ku ji bo vê dema taybet watedar e bê karanîn; ger tiştêkî wiha neyê dîtîn, tevda verastkirina heta ev nuqteya hatiye bê kontrol kirin tê pêşniyaz kirin, îhtîmal e ku wê bê dîtîn xelet e, çimkî tenê armanca verastkirinekê îfadekirina aksiyonê ye û aksiyon (tê hêvî kirin ku), pêşveçûyîniyek mantiqî ya bûyerên duhindirîne ku tenê verastkirin dibê pêşkêşke.

Li ser detayan

Li ser sehneya bi ronahiya dibriqî hatiye ronîkirin, ê biçûk jî tê de, bêguman her detay divê bi temamî heqê wê bê dan bê lîstin. Ev bi taybetî, weke piştî firotinekê pere bê dan, ji bo aksiyonan ku di sehneyên me de tê bincilkirin bûye weke rêgezekê rast e. Li vir Weigel (di sehneya 1 ê de di firotina toqayê kemerê de, di sehneya 2 an de dîkê qert, di sehneyên 5 û 6 an de di firotina vexwarinê de, di sehneya 12 an de çaxê ku perê kefenê dida) li gorî xwe jêstek biçûk dît: Cuzdanê çerm ku li sutiye xwe girêdabû bi teqereq û bi şeqandinê digirt. Di provayan de, li hember derketina bêsebara lîstikvanan ku di elimandinek xeyreta lingen temaşevana ji erdê qut bikin û detayan bi prensîbên – tiştêk bide dû yê din- epîk teatroyê di rêkûpêkê bi awayekî titîz û tenasup dest xistin bi rastî zehmet e. Detayên têgihan jî gelekî raveker e; mînak, wexte ku nivîsevanên leşkeriyê ber bi lawên wê çûn û weke lemlatên belgîran dipelînin ên zarokan pelandin, Dayika Wêrek ji bo demekê xurûrek ku di dayika de taybet e hîs kir, lê pîrsa çawîş (“Çira ne di ordiyê de ne?”) talûka lawên wê ketine nav ku ji ber wesfên wan bi xwe rê dide: Wê çaxê di navbera lawên we û

nivîsevanên leşkeriyê dibeze. Ji bo pêkana dest xistina detayan leza xebatê a di provayan de gerek hêdî be; tespîtkirina leza pêşandanê pirsek cuda ye û taliyê tê.

Detayek

Wextê kêrê dikşîne, Dayika Wêrek tu wehşîtiyê rê nade. Tenê ji bo parastina zarokên xwe dikare çiqas here rê dide. Lîstikvan, gerek rê bide ku Dayika Wêrek bi rewşên wiha aşîna ye û dikare di derheqê wê de were.

Dayika Wêrek bi zarokên xwe qurhayê dan kişandin. Penêrê Swês çaxê ku ji mîxferê qaxizê xwe dikşîne Dayika Wêrek axaftinek nîrxê ya biçûçik dike û bi ew rûyê xwe yê belagatî dizivîrîne –bi gotinek din bi pêşandanek bê terefî ku pir hindik hatiye mezinkirin (tu bi xwe bibîn, dest zû bûn, ne marîfet e) lîstikvan, rê dide ku dizane Dayika Wêrek tevî karê qederê bûye- ji aliyê din, bi her tiştên ku dibêje yanî di rewşên belû dibe ku belû wesf û qusûrên zarokên wê bibe sebeba mirina wan, bi tamamî bawer e.

Dayika Wêrek kehaneta ku wê çawîş mirinek zû bibîne davêj holê. Me kêşkir ku gerek Dayika Wêrek beriya ber bi çawîş ji bo qurayê dan kişandin here li dora Eilif bigere. Yan na vêya ji bo lawê xwe yê heyranê şer ji şer vegeirîne kiriye nedihat famkirin.

Bazara toqayê kemerê. Dayika Wêrek, nikarîbû bi xwe ku ji bo firotina toqayê kemerekê lawê xwe ji nivîsevanê leşkeriyê ber dide. Piştî ji erebê jêr, ji bo ji çawîş re toqayê bîne daket, ewil bi diltirsiyê ji bo nivîsevanê leşkeriyê seh bike divê li dora xwe binêre û hinek pêneewletiyê rê bide. Çaxê ku çawîş gurzê toqayê xist destê xwe û ew kişand dawiya erebê, pêneewletiya Dayika Wêrek ber bi warê ticariyê dere. Wextê deri schnapps ji bo çawîş tîne toqayê ku hîn perê wê ne hatiya dan ji destê çawîş distîne; her wiha quruşekê bernade. Çawîş ji pêneewletiya wê çavê wî şikestiya.

Ger pêneewletiya ewil bihata berteraf kirin, wê di destê me de jinek bêhiş, ku tu taybetiyên wê tune an jî kesek ku hewesa wê li ser ticaretê heye lê bêtecrube ye wê heba. Pêneewletî divê neyê wendakirin tenê, lê belê divê weke ku ji tiştê re nabe qels bimîne.

Pandomîm

Nivîsevanê leşkeriyê li sehneya ku hefsarê Eilif derdixê bi jestan bilîze (“jin wê ji bo te ser û porên hev dû rakin”). Wê ji bindestiya xwe xelas dike.

Wê dide zorê ku ew guldenê daye wê bistîne; li pêş wê guldenê di hundurê buqsa xwe waat dike, Eilif tê bê qey di transê de ye derdikeve.

Hevgirtî

Weigel, wextê reaksiyona bo revandina lawê Dayika Wêrek yê egît dilîze hisiyatek bi hevgirtî rê da. Ji dêvla ecebmayiyê betilandin rê da. Bi leşkerbûnê, hîn lawê wê ne hatibû wendakirin, tenê di talûkê de ye. Û wê zarokên xwe yê di jî wenda bike. Ji bo çî Eilif ne bi wê re ye ku baş dizane rê bide, destê toqayê kemerê li erdê xişikand û çaxê ku ji bo bêhna xwe berde li ser dingil rûnişt, taliyê navbera çîqên xwe girt bi qehrê firiya hundirê erebê. Û çaxê Kattrin wê bi hefsarê Eilif ve girêda Dayika Wêrek li rûyê qîza xwe nanere.

ÇAVKANÎ:

- Dayika Wêrek û Zarokê Wê xêzika dramaturjiyê û notên dramaturjiya episoda yekem. Bertolt Brecht. Mimesis Kovara Werger-Lêkolîna/Teatro. Hejmar 6. Weşanên Zanîngeha Boğaziçi. 1997.
- Bertolt Brecht: Plays, Poetry and Prose. The Collected Plays (1942-1946) di hundirê hejmar 5a de Mother Courage and

Her Children. Wergera Îngilîzî John Willet. Methuen-
Londra, 1985.

www.arsivakurdi.org

KUÇEŞANO

Werger: Ergîn Opengîn

MÎNAKA BINGEHÎN JI BO SEHNEYEKA ŞANOYA EPÎK

Panzde salên li dû şerê cîhanê, di hin şanoyên Elmanan de, şêweyeke nû ya leyîstinê bi navê epîk hate ceribandin. Bi navê *epîk* bû, ji ber ku bi awayekî aşkera vedigot û teswîr dikir, projeksiyon û koroyên raveker bi kar dianî. Lîstikvanê ku teknîkeke dijwar bi kar tîne, mesafeyek di navbera xwe û yê ku tê lêsîstin de diparast, û mumkun dikir ku temaşevan rewşên cur bi cur rexne bike. Alîgirên şanoya epîk digotin ku mijarên nû, ango pêvajoyên tevlihev ên ser pevçûnên çînî ku di civata îroyîn de gelek geş bûne, bi teknîka nû bi hêsanî dê bêne leyîstin; ji ber ku li gorî wan, di nava pêwendiyên sedemî (di çarçoveya sedemî de) de pêşkeşkirina rûdanên civakî, tenê bi rêya epîkê mumkun dibû. Herwiha, ceribandinên di wî warî de, birrek zehmetî ji bo estetîkê (zanista cuwanîyê) derdixistin.

Zêde zehmet nîn e ku mirov ji bo şanoya epîk mînakeke bingehîn tespît biket. Min, her gav di xebatên xwe yên li ser sepandinê de, mînakeke hindî ku bêjî sade, hema bêje “xwezayî” hilbijart ku mirov di her kuçşanoyekê de lê rast têt: Yekî ku qezayeke trafîkê dîtiye, ji civatekê re dibêje ka ew qeza çawa pêkhat. Mirovên dora şahidê qezayê, belkî qeza nedîtibin, belkî wekî şahidî nefikirin, an jî qeza dîtine lê ji şahidî cudatir hizr kirine. Meseleya esil ew e ku vebêj, hereketên şifêrê erebeyê an jî yên yê bin erebeyê de mayî an jî yên her duyan wesa bibêje ku yên derdora wî li ser qezayê bikarin qirarekê bidin.

Di vê mînaka ewqas kevn û arkaîk de tu tişt nîn e ku mirov fêm neket. Lê tecrube diyar dikin ku ne guhdar ne jî xwîner, wesa bi hêsanî nikarin kuçeşanoyê wekî şeweyê bingehîn ê şanoya mezin û şanoya serdema zanistî binirxînin (bibînin). Yanî ez dixwazim wiya bibêjim, dibe ku şanoya epîk di warê detayan de zengîntir, têkeltir, pêşdetir be; lê ji bo ku di aliyê prensîban de bibe şanoya mezin, bilî hêmanyên sehneya kuçeşanoyê hewce naket ku tu hêmanyên dî jî di nav xwe de bihewîne. Lê, şanoya ku çi hêmanyên sehneya kuçeşanoyê tê de nebin jî nabe şanoya epîk. Niha pê de, ji bo ku gotinên me baş bêne şopandin divêt ev xal gelek baş bête famkirin. Bêyî ku taybetiya nû, fêrnebûyî, û muhtacê rexneyê neyê zanîn, ku dibêje sehneyeka kuçeşano mînaka bingehîn e bo şanoya mezin, gotinên me yên niha pêdetir nayên famkirin.

Balê bidinê: Bêguman, di şano- vegotina kuçeşanoyê de xisusiyeteke artistîk a wekî em dizanin nîn e. Mecbûrî nîn e ku vebêj hunermend be; merîfeta ew pêdivêt, di pratîkê de herkesê heye. Em bêjin, vebêj nikare hereketekê qasî qurbanê qezayê bilez bike. Di rewşeke wesa de, dê rave bike, û dê bibêje ku hereketa qurbanê qezayê sê caran ji ya min bileztir bû, û dê derbas bibe. Ji bo ku wesa kir jî, tiştê ji qîmeta vegotinê kêm nabe. Pirtir, sînorek dê bo mukemmeliya vebêj bête danîn; çinku heke vebêj merîfeteka guhorîna kesayetiye ku bala yên derdorê bikşîne hebe, dê vegotinê xerab bike. Vebêj, xwe ji hereketên ku dê bibine sebeb ku yek li vê derê rabe û bêje “ Way way! Zilam çi qas xweşik şifêrî dileyîze!” dûr têxe. Çi kesê ji jiyana rojane de nakêşe û nabete nav “ciyeke berzîr”, kesekê ku “efsûn bike û dû xwe re bikêşe” nîn e, mecbûr nîn e ku hêzeke pir mezin bo telkînê hebe.

Zor muhîm e ku îlluzyon, yek ji taybetiyên sereke yên şanoya kevneşopî, di *sehneya kuçeşanoyê* de nebe. Di vegotina vebêjê kuçeşanoyê de karakterekê dubarekirinê heye, rûdan di paş de maye lê niha dubareyeka rûdanê tê kirin. Çawa ku sehneya kuçeşanoyê wesfa vegotinê veneşêre (çinku xwe wek rûdanê li

wê demê pêk tê nade diyarkirin), şanoya ku ji xwe re wê mînak digire jî tê naxebite ku wesfa xwe ya şanoyê veşêre. Hêmanya provayê, hêmanya ezbera deqê, bi kurtasî tevahiya mekanîzma û amedekariyên ji bo pêşkeşkirina lîstikê bi awayekî aşkera têne pêşandan. Wêca *jiyîn* li ku derê ma? Ma êdî mirov dikare behsa jiyandina rastiya tê pêşkeşkirin bike?

Sehneya kuçeşanoyê, nîşanî me dide ka jiyîna ji temaşevan re tê amadekirin dê wesfeke çawa hebe. Bêguman “jiyîneke” ku hatiye serê vebêjê kuçeşanoyê heye. Lê, armanca wî ew nîn e ku vegotina xwe bike jiyîna temaşevên. Û tenê parçeyeke jiyîna şifêr û yê qurbanê qezayê, ji yên derdora xwe re vedibêje. Her çend bixwaze jîndariyekê (ruhiyet) bidete vegotina xwe jî, wê, wek jiyaneke tijî xweşî nade diyarkirin ji yên derdora xwe re. Mesela, heke tîrsa yê qurbanê qezayê neleyîze, qîmeta vegotina wî hîç kêmtir nabe; berevajî, heke wê tîrsê bilîze *dê qîmeta vegotina wî kêmtir bibe*. Armanca vebêjê kuçeşanoyê, ne ew e ku temaşevanan bêxe nav heyecanên bilind(!). Şanoya ku dê vegotina kuçeşanoyê ji xwe re wek mînak (model) bigire, bêguman dê guherîneke bi tevahî karîgerî pêk bîne.

Yek ji hêmannên sereke yên sehneya kuçeşanoyê, ku divêt sehneya şanoya epîk jî wê hêmannê bihewîne, di pratîkê de qîmeta vegotînê ya ji terefê civakê ye. Vebêjê kuçeşanoyê, hez biket bila bibêje ku piştî ev an ew hereketa şifêrî an jî rêvingî qeza jênager bû, û bi hereketekê awayekî dî ew qeza dibû ku rê lê bihata girtin; hez biket jî bila di armanca ronîkirina pîrsgirêka sûcê de be, di her du rewşan de jî vegotina wî li ser jiyana rojane ye, û wesfeke teşebbusa civakî tê de heye.

Armanca vebêjê ya derheqê vegotina xwe de diyar dike ka vebêjê dê di şano-vegotina xwe de mukemmeliyê heta kîjan astê bibe. Helbet hewce nake ku hemî hereketên kesên di rûdanê de pêşkeş bike; ji wan yek duyan, da ku derheqê qezayê de hinekê fikran bide

pêşkeş bike bes e. Di *sehneya şanoyê* de jî, ji ber ku çarçoveya eleqeyê fireh e, tabloyên ku zêdetir bitûnî ne tên pêşkeşkirin. *Kuçe û sehneyên şanoyê*, di wê niqtê de, dê çawa pêkve bêne têkildarkirin? Em detayekê bigirin û bibêjin, bila ewil dengê qurbanê qezayê di qezayê de çi rol nebe. Dubendiya şahidên qezayê ya li ser ka “hişyar be” ya hatiye bihîstin, ji qurbanê qezayê an rêwiyekî dîtir derket, belkî dê vebêjî mecbûr bike ku wî dengî teqlît biket. Di rewşeke wesa de, heke bête diyarkirin ka deng ji mêreke kal an jineke pîr derket, an jî deng tîz bû an bi wesfeke “pes” bû, dê pirsgirêk bête çareserkirin. Lê belkî çareseriya pirsgirêkê pêwîst biket ku bête diyarkirin ka deng, dengê yekî rewşenbîr an dengê yekî nezan bû. Li rexê dî, hêdiyatî an bilezbûna dengî, bo çareserkirina pirsgirêkê dibît ku roleke mezin hebe, ji ber ku dê sûca şifêrî ya di qezayê de tespît biket. Divêt birrek wesfên qurbanê qezayê ji temaşevanan re bêne gotin. Qurbanê qezayê yeke wesa bû ku her dihênijî û kûr difikirî? Rewşeke ku ew mijûl dikir hebû? Heke hebe çi bû ew? Di hereketa wî de nîşaneke wesa hebû ku mirov pêdihesand ku rewşeke wesa heye û ew rewş wî mijûl diket? hwd. Wekî ku aşkera ye, di vegotina kuçeşanoyê de kes, bi awayekî pîralî û bi reng tene pêşkeşkirin. Belê dîsa jî şanoyeka ku di hêmanyên sereke de naxwaze ji sehneya kuçeşanoyê bibore, divêt di pêşkeşkirinê de hinek sînor hebin. Mesela, heke gelek caran “teqlît” bête bikaranîn, divêt li ser armanca xwe wiya wek tiştêkê durust (mafdar) nîşan bidet. (1)

- (1) Em gelek caran rastî vegotinan tên ku em dikarin (ji wan re) bêjin teqlîtên ji vegotinên me yên kuçeşanoyê rêk û pêktir in. Piraniya van vegotinan, wesfê qerfî heye. Cîranê me yê mêr an jin, belkî me dawet biket ku em hereketa çavbirsî ya xwedanê xaniyê me temaşê bikin. Di vê rewşê de, hêmanna teqlîtê pîr tê karanîn û naveroka wê jî pîrcure ye. Lê wextê bi hûrbînî lê dinêrî, têdigihî ku ev teqlîta ewqas têkel jî tenê yek aliyê hereketa xwedanê malê ji xwe re “hedef” digire. Teqlît kurte an jî beşek e; wesfên ku dê xwedanê mala me di nezera cîranê me de bikete “miroveke

bi hiş", ku bêguman ew wesf hene, bi dîqqat û hewldanê ve, ji derveyî vê beşê hatine hêlan. Cîranê me nafikire ku xwedanê mala me bi her awayan binirxîne; çinku çi tesîra qerfî namîne heke wesa bike. Sehneya şanoyê, ku pêwîst e çarçoveyên pitir bitûnî bidete temaşevên, di vê niqtê de rastî gelek zehmetiyan tê. Sehneya şanoyê jî, mecbûr e derfetên fireh bidet bo rexneyê. Lê belê, ji bo rewşên gelek têkeltir dê wiya biket, derfetê bidete rexneyên erênî an neyînî, dê ew karê navborî di nav yek û eynî vegotinê de pêk bîne.

Divêt bête zanîn ka "bi rêya rexneyê bidestxistina raya temaşevên" çi ye. Di sehneya me ya kuçeşanoyê de, ango di her çi vegotîneka karakterekê rojane de, em dikarin mînakan ji bo wiya jî peyda bikin bêguman. Cîranê me û vebêjê kuçeyê, dikare herwekî hereketên "dijî eql" ên mirovê babeta vegotinê, hereketên wî yên "baqilî" jî pêşkeşî temaşevanan biket. Lê di dewama vegotinê de, wextê ku mirovê maqûl dibe mirovê nemaqûl, an jî rastî rewşekê li dijî wiya têt, gelek caran ravekirin dest pê dîkin, û di wan raveyan de dîtînen xwe yên ji bo vegotina xwe wek bingeh danandî diguhurînin. Wek me got, sehneya şanoyê di wî warî de rastî astengiyan têt. Lê em nikarin wan astengiyan li vir binirxînin.

Mesela, ji bo tazmînat an pirsgirêkeka bi wî rengî mirov dikare vegotinê bi kar bîne. Şifêr ditirse ku dê ji karê xwe bête derxistin, ehlîyet dê lê bête standin, û dê bikeve girtîxaneyê; qurbanê qezayê jî ji qiyametê mesrefên tedaviyê, nivîşkaniyeke daîmî di bedenê xwe de, heta ji rewşeke ku êdî nekare bixebite ditirse.

Belê, vebêj dê hewl bidet ku şiklê karakterên xwe di vê çarçoveyê de bide: Belkî nik qurbanê qezayê yekî dî jî hebû. Belkî nik şifêrî

destgirtiya wî rûdinişt. Di wê rewşê de, *aliyê civakî* dê bi tesîrtir be, û karakter bi awayekî zengîntir dê bêne bikaranîn.

Yek ji hêmanyên sereke yên *sehneya kuçeşanoyê* jî ew e ku, vebêj, hemî wesfên kesên ku ew bi xwe pêşkeş dike, ji hereketên wan derfîne. Vebêj, bi pêşkeşkirina hereketên kesên ku ew bi xwe dilîze ve, mumkun diket ku li ser wan biryar bêne dan. Şanoya ku dê ew wesfa şanoya kevneşopî ku hereketan ji karakteran derfîne ber dide; nabêje ku hereketa ji karakterên eleqedar bi mecbûrî peyda dibin û bi tu awayan ber li wan nayê girtin. Xwe, ji “parastina hereketan ji rexneyê” rast û rast dût têxe. Di *sehneya kuçeşanoyê* de, karaktera kesê ku dê bête pêşkeşkirin “mezinahiyek e”, û vebêj ne mecbûr e ku wê mezinahiyê bi tevahî pêşkeş biket. Di nav çarçoveyê diyar de, karakterê mevzubehs bi vî an wî awayî dibe, û ew e tu tiştêkê îfade nake. Tiştên ku vebêjî eleqedar dikin, wesfên karakterî yên bûne sebeb an jî berbandên qezayê ne.(1) *Sehneya şanoyê* herwiha dikare kesên diyartir derêxe holê. Lê belê, divêt wan mirovan wek “rewşa taybet” pêşkeş biket, û derdora ku di warê civakî de herî bi tesîrtir e jî diyar biket.

Di destê vebêjê me yê *kuçeşanoyê* de, bo vegotinê gelek kêr derfet hene. (Jixwe ji ber vê hindê me mînakê *kuçeşanoyê* hîlbijart.) Zengîniya *sehneyeka şanoyê* ku naxwaze li ser hin hêmanyên sereke ji *sehneya kuçeşanoyê* derkeve, tenê bi rêya hûrlênêrîna hêmannên navborî pêktêt. Lê belê, li vir jî mesele ew e ku vebêj heta kû derê dê bikare here (lê bikole).

Mesela, em detayekê bigirin. Vebêjê me yê *kuçeşanoyê*, dê bişê bi dengêkê bi telaş derbibire ku şifêr zû da ye, ji ber zêde xebitîne bêhal ketiye? Çawa ku balyozek nekare axaftina xwe ya bi Qralê welatê çûyê re bi destpêka: “Min Qralê bi ridîn dît” re bo hemşehriyên xwe veket, wesa jî vebêjê me yê *kuçeşanoyê* jî nikare tiştêkê wesa bike. Ji bo ku wiya bike, ji bo ku mecbûr bimîne wiya

bike, divêt ku li kuçeşanoyê rewşeke wesa hebe, da ku di rewşa navborî de telaş (xisuseten jî li ser vî aliyê muşkuleyê) xwedî roleke muhîm be. Bo nimûne, di mînaka balyozê li jorê de, rewşeke wek "heta ku wesa wesa dibe qralî sond xwariye ku ridîna xwe nebire" derdikeve. Wextê ku wê telaşê berdide nav destên rexneyê, vebêjê me mecbûr e ku dîtinek (boçûn) hebe da ku ji xwe re biket armanc (an jî jêder). Tenê dema ku wî dîtineke rêk û pêk hebe, dê bikare ew tona bi telaş a di dengê şifêrî de diyar biket. Mesela dê bibêje ku şifêr hîç hewl nadin ku kêmtir saetan bixebitin, û bi wî awayî dê bavêje ber piyên şifêran: (Hêj endamê sendîkayekê jî nîn e. Lê dema ku qezayek çêbû, were temaşaya telaş û hewarê: "Deh saete li ser dîreksiyonê me!")

Ji bo ku bigihe wê rewşê, angû ji bo ku dîtinekê bidete lîstikvanî, divêt ku şano ji birreke tedbîran îstîfade biket. Şano bi raberkirina şifêrî di rewşên cuda cuda de , parçeya rûdanê ku dide ber temaşevanan mezintir diket. Û wesa, bi tu awayan ji modela xwe ya sehneya kuçeşanoyê dûr nakeve, tenê hin rewşên dî yên karakterê model der tîne. Em dikarin *sehneyeka şanoyê* bifikirin ku wesfên sehneya kuçeşanoyê hebe, û telaş û heyecanên mîna yên şifêr, bi sebebên baş ve têkildar biket, an jî perdeyên dangan berhev bidet. Ji bo ku ji sehneya mînak dûr nekeve, divêt ku şano, teknîkeke wesa bi kar bîne ku rewşên telaşê bike mijara rexneyên temaşevanan. Ew e, wek prensîb, nahê wê wateyê ku temaşevan, dê ji heyecanên tene pêşkeşkirin bêne dûrxistin. Lê belê, jiyîna telaş û heyecanan a ji aliyê temaşevanan ve jî, tenê wek şeweyeke (merhele, encam) rexneyan diyar dibe. Vebêjê şanoyê, angû lîstikvan divêt ku teknîkeke wesa bi kar bîne ku dengê kesê ku bi xwe dileyîze bigihîne hevgirtinekê, ji dûratiyeke diyar bikare vî dengî bidet; heta ku temaşevan bikare gotinên wek, " bi hêrs bû (kerbên wî vebûn)- bêçineyî, çima paşî, zor şukur!" hwd. bêje. Bi kurtasî, divêt lîstikvan wek vebêj-şanoger bimîne, mirovê ku ew bi xwe dileyîze wek yekî biyanî nîşan bide, û wextê dewamê li vegotina xwe dike ji teknîka "wî ew kir, wî ew got" dûr nekeve. Bi tevguherînekê, xwe bi tevahî neşibîne kesê ku tê vegotin(leyîstin-bercestekirin).

Yek ji hemayên sereke yên sehneya kuçeyê jî, du tevgerên xwezayî yên vebêjî ne. Vebêjê kuçşanoyê her gav li ser wan her du rewşan disekine: herwekî ew bi xwe ji tevgerên xwezayî dûr nakeve, hewl dide ku kesê ku ew vedibêje jî bi tevgerên xwezayî pêşkeş biket. Çi caran ji bîr nake ku ew bi xwe, kesê ku vedibêje ye, ne kesê ku tê vegotin; û nahêle ku ew rastî bête jibîrkirin jî. Ew e tê wê maneyê, vebêjê ku pêşberî temaşevanan e, wek di lîstikên şanoya kevneşopî de, (1) ne sentezeka vebêj û yê tê vegotin e, û ne kesekî sêyem ê serbixwe û bînakokî ye ku di encama windabûna xisusiyetên vebêj û kesê tê vegotin de derketiye holê. Navbera hizr û fikrên vebêj û kesê tê vegotin de nakokî çênabin.

Niha jî em têne Efekta- B (Efekta Havîkirinê) ya Şanoya Epîk ku hêmaneke karakterîstîk a şanoya epîk e. Bi kurtasî, ew efekt in ku rûdanên navbera mirovan de qewimî û li sehnê tîn pêşkeşkirin, ji bo rexne û gazindeyan guncaw dikin; ew efekt ji ber ku bi xwe baş nayên famkirin tê diyarkirin ku pêdivî bi raveyê heye, û di wan efektan de, ber li ber temaşevan tê girtin ku rûdanan bi awayekî xwezayî têbigihîjin. Armanca wan ew e ku di temaşevanan de rexnegiriya civakî hişyar bikin. Gelo Efekta B, ji bo vebêjê kuçşanoyê jî muhîm e?

Heke vebêjê me efekta B yê bi kar neîne, em dişên bisêwirin ka dê bigihe encameke çawa. Mesela rewşeke wiha mumkun e pêkbêt: Yek ji bîneran dibît ku rabe û bêje: "Heke qurbanê qezayê, wek we nîşan da, ewil pêyê rastê biavêta ser cadeyê, wê gavê..." Vebêjê me yê kuçşanoyê jî, dikare gotina temaşevên bibire û wiha bersîvê bidetê: "Lê belê min wesa nîşan da ku qurbanê qezayê ewil pêyê xwe yê çepê avête ser cadeyê." Hema gava ku niqaşek li ser "ka vebêjî ewil bi rastî pêyê rastê an yê çepê avête ser cadeyê" û xisuseten li ser tevgera qurbanê qezayê derket, guhertineke di vegotin-şanoyê de dibît ku efekta- B yê pêk bîne.

Ewcar vebêjê me, dê tevgera qurbanê qezayê bi hişyarî û baldarî, belkî ji cara ewil hêdîtir pêşkeş bike, û efekta- B yê bileyîze. Yanî parçeyeke rûdanê havî (biyanî) dike, wê parçeyê dikirpîne û, wesa lê dike ku balkêş be. Bi rastî efekta- B yê, bo vebêjê me yê kuçeşanoyê jî fayde diket. Bi gotineke dî, di sehneya şanoya biçûk a xwezayî de jî, ku di kuçeyan de herroj rast lê tên, û zêde têkilî bi hunerê re nîn e, efekta- B yê tê bikaranîn. Yek ji karakterîstîkên şanoya Epîk, ji lîstîkê bo raveyê derbasbûna rasterast heye; di hemî vegotinên kuçeşanoyan de, mumkun e em wê taybetiyê wek hêmaneke xweser bibînin. Vebêjê kuçeşanoyê, gava derfet jê re çêdibe, navberê dide lîstîka xwe û dest bi raveyan dike. Koroyên şanoya Epîk, belgeyên bi projeksiyonan tên pêşkeşkirin û berê xwe ber bi temaşevanan ve vedana lîstîkvanan jî dîsa raveyên bi wî awayî ne.

(1) Rêzikên di vî warî de herî sereke û aşkera ji aliyê Stanîslavkî ve hatine pêşxistin

Wesa difikirim ku hûn ê biheyirin ku ez behsa hêmanên bi xisusiyetên hunerî yên ku kuçeşanoyê, lewre jî sehneya şanoya epîk diyar dikin nakim. Madem ku vebêjê kuçeşanoyê, dikare vegotina xwe “bi merîfetên herkesekê” bi serfirazî pêk bîne, vê gavê çi nirxa hunerî ya şanoya epîk heye? Pirseke bi wî rengî dibe ku bikeve hişê mirov.

Şanoya Epîk, sehneya kuçeyê, yanî hindî ku tu bêjî şanoya sade, ji xwe re model digire. Sebeb, alav û armancên wek teşebbuseka civakî ya ber bi pratîk û cîhanê, modela bingehîn a wê şanoyê ye. Hebûna wê mînakê jî, wek lîstîkên şanoyê, ne bi xêra “xweajo (xwesteka bêhemdê mirov) ya xwe vegotinê”, “pejirandina qederen biyanî”, “jiyana ruhî”, “xwesteka lîstîkkirinê”, “xwesteka

çîrokîkirinê” hwd. ye. Belam, têkiliya Şanoya Epîkê bi hunerê re nîn e?

Ez bêjim, berê em pirsê bi awayekî dî bipirsin dê baş be: Gelo, pêdivi bi merîfetên hunermendan heye ji bo ku armancên me yên sehneya kuçeşanoyê pêk bînin? Bêyî xwe bêxin zehmetê, em dişên bi erêyekê wê pirsê bibersivînin: Di vegotina kuçeşanoyê de hêmanên hunerî hene. Her insanekê hin merîfetên hunermendan hene. Divêt di Şanoya Epîk de ev neyê jibîrkirin. Bêguman, em dikarin merîfetên ku em jê re artistîk dibêjin, deynin nav mînaka *sehneya kuçeşanoyê*. Her çend ji sînorên têkildar nebore jî (heke vebêj rasterast xwe ketina nav kesayetiya mirovê ku vedibêje dûr bêxe, ew sînor nayên borandin.), ew dê dîsa jî wek merîfetên artistîk diyar bibin. Birastî jî, Şanoya Epîk, yekser karekê hunerî ye û, bêyî merîfeta artistîk, xeyalkirin, mîzah û beşdariya hizrî qewî pêk nayê. Ev û gelek tiştên dî yên bi wî rengî nebin, di pratîkê de nayê karanîn. Divêt Şanoya Epîkê, taybetiyên qerfî û hînker hebin. Gelo bêyî ku hêmanek bête derxistin û yeke nû lê bête zêdekirin, divêt çawa hereket bikin ku ji sehneya kuçeşanoyê berhemeke hunerê bête afirandin? Em çawa dişên ji hêmanên *sehneya kuçeşanoyê*, bi mijar, hunermendên ehîl, zimanê wê yê şîrîn, makyaj û lîstika komê ve derbasî sehneyeka şanoyê bibin? Wextê ji şanoyeke “xwezayî” derbasî şanoyeke “çêkirî(suxte)” dibin, hewce diket ku em hêmanên xwe yên heyî ligel yên dî tamam bikin (bikin yek)?

Berfirehkirinên ku em dê di vegotina kuçeşanoyê de, ji bo ku bigihin *Şanoya Epîk* bikin, birastî jî taybetiyên hêmanî nahewînin? Lênerîneke kurt dê nîşa me bide ku berfirehkirinên navborî, taybetiyên bi wî rengî nahewînin. Em li ser *mijarê* bisekinin: Qezaya me ya kuçeşanoyê ne derew e. Lê şanoya em dizanin, ne tenê bi mijarên derew (çêkirî) re mijûl e; mesela lîstikên dîrokî bifikirîn. Layê dî, di sehneya kuçeşanoyê de jî, rûdaneke derew dibe ku bête pêşkeşkirin. Vebêjê me her gav dikare bibêje: “Şîfêr di wê qezayê de sûcdar e, çinku qeza wek ku ez dibêjim çêbû. Lê

heke wek ku ez dê niha nîşanî we bidim bibaya, çî sûcê şîfêr di wê hindê de nedibû.” û dikare qezayeke dî bisêwire, û wê vebêje û pêşkeş bike. Niha, li ser deqa di şanoyê de *hatiye xebitîn* û *hatiye jiberkirin* bifikirin: Vebêjê me yê kuçeşanoyê jî, wek ku dê li mehkemeyekê şahidiyê bike, gotinên kesên mijara vegotinê li ciyekê not dike, wan yek bi yek ji ber dike, yanî dibe ku ew jî deqeke jiberkirî pêşkeşî yên hemberî xwe bike. Lîstikên ku bi provayên ji yekê zêdetir kesan hatine amadekirin, bifikirîn: Xebateke wesa bi hevkarî tê çêkirin, her gav ne ji bo armancên artistîk in. Bo nimune, wê rêbazê bînin bîra xwe ku polîsê fransî hin sehneyan, bi hin gumanbarên têkildarî cînayetekê bûyî dide dubarekirin. Berê xwe bidine *maskeyê*: mesela, hin guherînên biçûk ên şeklê mirov de, wek hilweşîbûna por, ji aliyê vegotinên ku çî nirxa wan a hunerî nîn e jî têne bikaranîn. Makyajê jî ne tenê lîstikên şanoyan bi kar tînin. Mesela, mumkun e ku simbêlên şîfêr di sehneya kuçeşanoyê de pir muhîm bin. Dibe ku li rex şîfêr jinek rûniştibe û, ew simbêl tesîrê li îfadeya jina ku şahidiyê dike, bike. Vebêjê me jî, dema wê jinê dide axiftin, dikare wesa bike ku şîfêr simbêleke xeyalî bibade û, wê tesîrê bi wî awayî bîne ziman. Ji ber wê hindê, dikare qîmeta îfadeya jinê gelek daxîne. Lê belê, ji sehneya kuçeşanoyê derbasbûna di sehneya şanoyê de bikaranîna simbêleke rastîn, hinek zehmetiyan derdixe ku ew zehmetiyan em *cilguhorînê* de jî dibînin. Vebêj di hin rewşan de, mesela ji bo ku diyar bike ku şîfêr serxoş bû (kasketa şîfêr ketibû rex wî), dibe ku kasketê bigire û danê serê xwe. Lê bêguman, di hin rewşan de dikare wiya bi fedîkokî bike (bnr. Gotinên pêşdetir yên li ser *rewşên sînor*). Lê belê, di lîstekek ku dê ji aliyê yekê zêdetir kesan bête çêkirin de, ji bo ku mirovên têne pêşkeşkirin ji yek û du bêne cudakirin, cilguhorîn mimkun e. Li vir jî kinc guhorîn divêt heta sînorekê be, îlluziyona ku “lîstikvan kesên ku têne leyîstin in”, di temaşevanan de divêt neqewime. Şanoya Epîk nahêle ku ew îlluziyon, bi pir zêde kinc guhorînê, an jî bi kincên ku aşkera ye ku tenê ji bo lîstikê hatine amadekirin, pêkbê. Li vir, em dikarin mîna keke dî ya bingehîn tesbît bikin ku ciyê sehneya kuçeşanoyê bigire: Şanoyên etaran li kuçeyan. Ew etar, em bêjin wextê stûbandan difroşin, hem mirovên cilên xerab lixwekirî hem jî yên

şik dileyîzin; bi yek du tişt û yek du hereketên destan sehneyên biçûk dileyîzin, bi rêya îmayê gotinên xwe vedibêjin. Dema wiya dikin jî, çi caran ji wan sînoran dernakevin ku sehneya me ya qezayê ji bo vebêj danîbûn. (Qaşo stûbend pêçaye, kûm û lepik li xwe kirine, bi gopal rê ve diçe; bi wî awayî bi terzeke nediyar xwe dişibîne begzadeyekî. Dema behsa wî mirovî dikin, wek vebêjê kuçeşanoyê, cînavka kesê sêyemîn, “wî”, bikartînin.) Layê dîtir, di axaftinên xwe de etarên kuçeyan, dîsa di nav çarçoveya me ya bingehîn, zimanê nazimê jî bi kar tînin. Hez bikî, bila rojnameyan, hez bikî bila hilawistokên pantolonan bifroşin, qewlêrkên qalibgirtî û bêrêzik bi kar tînin.

Gotinên me nîşan didin ku mînaka li holê ya bingehîn, gelek rihet têrê dike. Navbera Şanoya Epîk a Xwezayî û Çêkirî de ferqeke bingehîn nîn e. Şanoya me ya kuçeşanoyê xwedî karaktereke kevn e. Ji aliyê sebeb, armanc û alavan (navgînan) “qewî kûratî” lê nîn e; lê belê teşebbusek e ku wate û girîngiya wê teqez e, erkeke wê ya civakî û aşkera heye, û hemî hêmanên wê, wê erkê aşkera dikin. Rûdana ku dibe sebebê vegotina kuçeşanoyê, rûdanek e ku mirov dikare hin biryaran derbareyê de bigire, û dîsa rûdanek e ku di jiyana rojane de bi terzekê tê dubarekirin; hêj kuta nebûye, ji ber vê hindê jî dibe ku paşî hin encaman derxe holê, û girîng e ku biryarek li ser bête girtin. Armanca şanoya kuçeşanoyê ew e ku nirxandina rûdanê hêsan bike, û alavên di pêşkeşkirinê de tene bikaranîn jî xwediyê taybetiyên wê armancê ne. Şanoya Epîk, herwiha, şanoyeke hindî ku bêjî artistîk e ku bi hîmên têkeltir dixebite û erka wê ya civakî berfirehtir e. Bi ferzkirina *sehneya kuçeşanoyê* wek modela bingehîn a *Şanoya Epîk*, em erkeke civakî ya aşkera li wê şanoyê bar dikin û, hin pîvanan tesbît dikin ji bo ku bête diyarkirin ka lîstikên epîk nirxek heye an na. Nirxeka pratîk a mînaka bingehîn heye, dema lîstikek tê amadekirin ku li ser detayan hin xebatên çetin dihewîne û, hin pirsên hunerî û civakî tê de tene binkolkirin, mînaka bingehîn pêkan dike ku hem derhêner û hem jî lîstikvan, her gav lê venêre ka erka civakî ya di tevehîya lîstikê de bi awayekî rast û durust, û aşkera li ciyê xwe de ye an na.



Edebiyat

PELÊ DAWÎN

O Henry

Wergera ji îngilîzî; Sîdar JÎR

O Henry bi navê xwe yê rasteqîne William S. Porter di sala 1862an de li North Carolinayê hatiye dunyayê. Yek ji çîroknivîsên herî berhemdar e. O Henry çîrokên xwe li ser mirovê asayî hûnandine û berhevokeke çîrokên xwe bi navê `Çar Milyon` weşandiye. Hostayê xelasiyên sûprîzî ye. O Henry di sala 1910an de li New Yorkê koça dawî kir. Piştî wefata wî sê pirtûkên wî yên din hatin weşandin.

Li taxeke biçûk a rojavayê Washingtonê, kuçe bi gelek qozî û fetlonekan ji hev diqetin û kuçekorên tewromewro derdikevin ber mirov. Wan kuçekoranan carekê du caran li hev têne badan. Rojekê hunermendek li taybetiya wan kuçeyan hay bû. Deyndarekî ku bixwaze deynê xwe yê kaxed û boyaxê berhev bike û çend caran li dora xwe bizîvire û dîsa destvala derkeve heman ciyî, karê wî tamam e.

Ji bo wê yekê, hunermendan qefle bi qefle berê xwe didan vî gundê entîke yê Greenwhichê, çavên xwe li sibarneyên sedsala hijdehan û şibakeyên li bakurî û karîteyên li ser avahiyê yên holendî digerlandin û her wiha çavên wan li xaniyên ku kirêya wan erzan bûn. Dûre çend surehiyên paxir û firaqek an jî du heb ji bo germkirinê ji Kolana Şeşemîn anîn û hatin li wir bi cî bûn.

Li qotê xaniyekî sê qat, studyoya Sueyê û Johnsyê hebû. Johnsy nasa Joanna bû. Yek ji Maineyê bû ya din jî ji Californiyayê. Wan li tabldota 'Delmonico' ya li Eight Streetê hev nas kiribûn. Wekî ku

nêrîna wan a li ser hunerê, cilên ku zenda wan fireh ên mîna yên pîskoposan jî wekî hev bûn. Ji ber ku xuyê wan li hev dikirin bi hev re li studyoyekê dixebitîn.

Meha gulanê bû. Seqemeke meha Sermawezê ku tixtora jê re digot Firik (zature), tiştêkî nedîtî, li serê taxê dibû bela û carê diçû virde wêde belaya xwe di hinekan de digerland. Ew mahlûqat li Eight Sideyê bi wêrekî tevdigeriya û cangoriyên xwe ref bi ref dibir, gava diket nava kuçekorên teng û kevzînê zû bi zû pê li kevîrê şil nedikir, hay ji xwe hebû.

Firik beg ne kesekî ku mirov bibêje yekî narîn û kubar bû. Ev ê bêhnfisek û lepgirdik dikarîbû jinikeke pîr ku xwîna wê bi hewayê Claiforniyayê ya sakîn geş dibû jî bixista. Li Johnsyê jî wiha kir, kir ku Johnsyê encax bikaribe di şibakeya biçûk a holendî re li tûxleyên dîwarê hember temaşe bike.

Sibehekê tixtor bangî Sueyê kir û bi wan birûyen xwe yên boz bûbûn û her du digihîştin hev got;

“Rewş xeternak e. Encax yek ji... Belê ji dehan yek îhtîmal heye.”

Termometreya di destê xwe de hejand, ji bo ku ciwayê daxîne û got; “û ew îhtîmal jî bi xwestek û vîna wê ya jîyanê ve girêdayî ye. Xwezaya mirovan gelekî xerîb e. Hew te dît ku xwe gihandine kefenfiroş an jî gorçêkeran. Di wê rewşê de civaka tixtoran jî dikevin tev. Delala biçûk xistiye serê xwe ku ew ê baş nebe. Ma tiştêkî hişê wê tevlihev dike heye?

Sue got; “ Wê – wê dixwest rojekê wêneyê Kendava Napoliyê saz bike.”

“Wêne? Ehhe! Tiştê vik î vala. Tu tiştêkî din tunebû ku hiş û aqilê xwe pê re mijûl bikira. Wekî mînak, xortek?”

“Mêrek? Ma ji bo mêrekî hêja ye? Na, tixtor na, tiştêkî wiha tune.”

Gava bersivandibû dengê wê mîna yê herpeke cihû dilerizî.

Tixtor got; “Wê gavê bedena wê qels e. Tiştê ku ilmê tixtoriyê dayê min, ez ê hemûyan bikar bînim. Lêbelê gava nexweşa min

dest bi jimartina hejmara erebeyên ku wê beşdarî merasîma cenazeyê wê bibe kir, ez ê ji sedî pencî hêza dermanan dabixim jêr. Lêbelê heke we, pirseke der heqê zivistana îsal de, ku wê kîjan cûre sakoyê bibe mode pê da pirsîn, ez ê di şûna ji dehan yekê ihtîmala başbûna wê bibêjim ji pêncan yek e.”

Piştî ku tixtor çû, Sueyê çû odeya xebatê û heta ku destmaleke japonî kir mîna hevîr giriya. Dûre bi texteyekî xebatê derbasî odeya Johnsyê bû û bi awayekî ku kêfa wê li cî ye bi fikandin çû wê odayê.

Berê Johnsyê bi paceyê ve bû û di binê çarşevê de xwe tevnedida, dirêjkirî bû. Di cî de deng ji Sueyê biliya, got qey Johnsyê di xew de ye.

Texteyê xwe yê wêneyan bi cî kir, rahişt hubir û penûsa xwe, ji bo çîrokekê ku wê di kovarekê de bihata weşandin, dest bi xêzkirinê kir. Wênesazên ciwan ji bo ku şekalên xwe deynin cem yên hunermendên din, ji bo nivîsên nivîskarên ciwan ên ku dixwestin şekala xwe deynin nava yên pênûsa wan xurt e, neçar bûn ku wêneyan saz bikin.

Gava Sueyê ji lehengê xwe yê ku gavanekî Idohoyî bû re berçavkek û pantorekî binexş xêz dikir, dengê lawaz û çend caran li ser hev bihîst, rasterast ber bi ciyê nexweşê ve çû.

Çavên Johnsyê pahn bûbûn, li ser hev dilîstin. Di paceyê re li derve dinihêrî û li ser hev hejmar beropaşkî dijimart.

“Dozdeh” Johnsyê got û dewam kir, “Yazdeh, deh,... neh” lê zêde kir. “Heşt...heft” wekî ku bi hev re bibêje.

Sueyê bi miraq li derve nihêrt got hela bê çi heye. Ji bilî hewşeke vik î vala û tarî û diwarekî şêst pêyî li pêş û kerpûçên dîwêr tu tişt nexuyabû. Û lavlavkek hişkbûyî ku heta nivê dîwêr rapelikîbû û heta ku tu bibêjî qert bûbû hebû. Seqema payizê pelên wê weşandibû, çeçelîkên wê yên mîna îskeletan, hema mîna ku şût î tazî be li dîwêr mabû.

Sueyê pirsî; “ Ew çi ye, delala min?”

Johnsyê wekî ku binewhirîne got; “Şeş.” Û berdewam kir, “Êdî zû diweşin. Beriya sê rojan jî bi sedan bûn. Gava min dijimart serê min gêj dibû. Êdî hêsan e. A j ite re, yeka din jî çû. Bi tenê pênc heb man.”

“Çi pênc heb? Ka ji Sueya xwe re bibêjî.”

“Pel. Pelên lavlavkê. Gava pelê dawîn jî biweşe ez ê bimirim. Ev sê roj in li min eyan e. Tixtor jî te re negot?”

Sueyê bi awayekî heta ku tu bibêjî tinazkar bû got; “Min qet titşên wiha jî nebihîstibû lê. Çi têkiliya pelên dêliyê bi başbûna te re heye? Û te ji vê dêliyê jî gelekî hez dikir. Çi bûye ji te? Wekî qazan nekî lê. Hîna tixtor vê sibehê gotibû tu yê baş... bisekine... çî gotibû? Gotibû ku îhtîmala başbûna te ji yekê deh e. Ya te tu çî dibêjî lê? Talûke ne ji ya gava ku em li New Yorkê li tramwayê siwar dibin an jî gava em di ber avahiyekê re derbas bibin û em pê re rû bir û bimînin zêdetir e... Ka hinek şorbe vexwe û bisekine Suecana te hinekî bixebite, ji bo ku wêneyê çêkiribe bifiroşe û ji bo ku ji zaroka xwe re bikaribe şirûbê bikire û ji xwe çavbirçiyê re jî çend parçe nermegoşt bistîne.”

Johnsyê berê xwe ji paceyê neda alî û got: “Ne hewce ye ku tu şirûbê bikirî. Yeka din jî çû. Şirûbê jî venaxwum. Dilê min naçê. Man çar. Beriya ku tarî têkeve erdê, ez dixwzim weşîna ya dawîn jî bibînim, piştî wê ez ê jî herim.

Sueyê bi ser wê de daqûl bû, “Johnsya delal. Johnsya şêrîn, daxwazeke min ji te heye. Heta ku ez karê xwe biqedînim, tu yê sozê bidî min ku, tu yê çavên xwe bidî ser hev û qet di paceyê re li derve nenihêrî? Divê ez wêneyê xwe heta sibehê bigihînim ber destê wan. Divê perde bikêşe, lêbelê pêdiviya min bi roniyê heye.

Johnsyê bi awayekî sar jê re got; “Ma tu li odeya din bixebitî nabe?” Sueyê got, “Ez xebata li cem te dibijêrim û naxwazim tu li wan pelên bêyom binihêrî.”

Johnsyê çavên xwe girt û rengê xwe yê spîçolkî ku mîna peykerekî ku hatibe xwarê nedilivîya, dirêj kirî got; “Te çawa qedand haya min pê bixî. Ez dixwzim weşîna pelê dawîn bibînim. Ez ji sekinê aciz bûm, ji fikirîna bêzar bûm. Ez li her tiştî borîm. Ez dixwazim

xwe mîna pelên hejar ên westiyayî serbest berdim. Dixwazim xwe lê berdim û berjêr bişûşikim.”

Sueyê got;” Hela tu hewil bidî ku rakeve. Ji bo madenvanekî rebenokî bidim xêzkirin divê ez herim bangî Beherman bikim. Bila modeliyê bike. Ez ê niha vegerim. Nebe nebe ku tu xwe tev bidî!”

Behermanê kal, boyaxkarekî li qatê binê wan dima. Temenê wî şest derbas kiribû. Yekî mîna Musayê Michel Angelo bû ku rîha wî bi ser gewdeyê wî ye ku li ber serê wî qinikek dima ve li ba diket. Beherman yekî ku di hunerê de biserneketî bû. Çel salan firçeya ku bikar dianî qet nêzî pêşmala xwedawenda xwe ya hunerê jî nekir. Her dem ji bo ku berhemeke bêhempa biafirîne dixebitî, lê heta niha tu tişt tune. Ji bilî çend wêneyên ji bo bazirganiyê û çend mînakên ji bo danasînan hîna tu tişt xweşikî çênekiribû. Li taxê ji wênesazên cîran re modelî dikir û çend pere bi dêst dixist. Her dem cîn vedixwar û qala şahesera xwe ya ku wê çêbike dikir. Digel wê jî qet ji kubarî û narîniyê hez nedikir. Kalepîrekî bi eks bû û ji bo ku wênesazên qatê jora xwe biparêze xwe mîna cangoriyekî wan dihesiband. Sueyê, Beherman li şikefta wî ya qata jêrîn dît. Li quncikeke odayê li ser maseyêke biçûk , tuwala wî ya spî ya şahesera wî ya ku ev bîst û pênc sal e li benda firçeya yekemîn bû disekinî. Sueyê ji wî re qala Johnsyê kir. Ku pelê keçika ciwan bi vê cîhanê ve girê dida yê dawîn jî biçûya, got ku heger pelê dawîn jî here tîrsa wê ew e ku ruhê wê yê mîna wî pelî sivik û rindik jî wê bifire here. Behermanê kal bi çavên xwe yê sor ku dilop bi dilop hêsir jê dibariya, kir barebar û henekê xwe bi van xeyalan kir û bi devoka xwe got;

“Şi! Ji po ku têliyeke pêyom belên xu tiweşîne, pêaxilên ku xu si po mirinê amate tîkin hene qey? Min tiştê wiha şî nepihîstiyê! Na; ez ê wêneyekî çêpikim. Nikarim ji bo te modeliyê pikim. Di fê rewşa Yohnsyê de tu çi jahrê belav dikî û tu xwe pi van tiştan re mijûş tîkî” û qîrînê jê hat, “Yohnsya reben!”

Sueyê got; “Pir nexweş e û zeîf e, sincirandina bedena wê bandor li hiş û giyanê wê kiriye û di nava ramanên tewşomewşo de ye. Ê baş e, Beherman beg, hey tu naxwazî ji min re modeliyê bikî, neke. Jixwe tu ji bilî kalepîrekî bizdihîn û xurifî ne tu tişt î.”

Beherman bi xeyd got, "Hah şî te re! Jin wiha ne ha! Kê kotiyê ku ez ê şî te re moteliyê nekim. Here ez tēm. Ev nîv saet e ku qirik li min peritî, hingî ku ez dibêşim, ez amade me. Xwetêyo! Nabe ku em bihêlin keçikeke mîna Johnsyê delal bi nexweşiyê here. Rojekê ez şaheserekî çê bixim û em hemû pê bividitin. Xwedêyo! Erê!"

Gava di pêlikan re hilkişiyar jor Johnsyê razayî bû. Sueyê perde kişand û îşaretî Beherman kir ku derbasî odeya din bibe. Ji wir bi tirs li dêliya li devre nihêrîn û bêdeng li hev nihêrtin. Şilopeyek bê rawestîn li devre dibariya, hewa sar sar bû. Beherman bi îşlikê xwe yê kevin ê şîn li ser qûşxaneyê bernixûm rûnişt. Wê qûşxaneyê ya ku madenvanê terk î dinya li ser rûniştibû temsîl dikir.

Sueyê wê şevê encax bi qasî saetekê veketibû. Serê sibehê gava hişyar bû dît ku Johnsyê çavên xwe yên ku ronîya wan çimlisî û pahnbûyî li perdeya kesk a girtî dinihêrî.

Bi dengekî nalînî got, "Veke! Ez dixwazim bibînim."

Sueyê bi bêzarî daxwaza wê anî cî.

Wehhh!!! Digel barana bişid ku heta sibehê bariyaye û bayê dikir fîzînî jî pelê dawîn ku li ber dîwarê kerpîç bû, hîna jî li ciyê xwe bû. Pelê dawîn bû. Digel ku koka wî hîna jî hêşîn bû, serê pel êdî rengê ku ew ber bi rizînê ve dibir, êdî zer bûbû li çeçeliyê ku bîst mîtroyan li hewa bû, birik pê ve hilawestî dima.

Johnsyê got, "Ew pelê dawîn e. Min digot teqez ew ê bi şev biweşe. Fîzîna bayê dihate min. Ew ê îro biweşe û ez ê jî pê re bimirim."

Sueyê serê xwe bi ser balîfê de xwar kir û bi bêzarî got, "Delal, delalê hiş be! Gunehê te bi te nayê bila bi min bê. Ez ê bêyî te çî bi halê xwe bikim"

Lêbelê Johnsyê nebersivand. Li dinyayê tiştêkî mîna giyanekî ji bo wê rêwîtiya dûdirêj û efsûnî amadehiyê bike mirovrevok tune. Her ku tiştên ew bi vê jiyanê ve girê dida yek bi yek ji ber hev de diketin, bi pelê dawîn re jî fikra mirinê êdî di hişê wê de tam ciyê xwe girtibû.

Roj bi wî awayî boriya. Di qemika êvarê de jî pelê wê dêliyê wisa bi rik bi dîwêr ve zeliqandî dîtin. Gava bû êvar bayê kur dîsa kir fîzînî. Baranê li paceyê dixist û ji serbaneyên holendî dişurikî erdê.

Bi berbanga sibehê re Johnsyê xwest ku perde ji ber paceyê bê alîdan.

Ew pel hîna jî liciyê xwe bû.

Johnsyê demeke dirêj ziq bû lênihêrî. Dûre bangî Sueya ku li ser sobeya gazê şorbemirîşk li hev dixist kir.

“Suecanê, ez keçikeke gelekî xerab bûm. Hêzeke efsûnî, ji bo ku xerabiya min eşkere bike, ew pelê hanê li wir hişt. Mirinxwestin gunehbarî ye, ka tu dikarî hinek şorbe û şîr ji min re bînî îcar, na bisekine, destpêkê neynikekê bînî. Dûre du balîfan bidî ber piştî min. Ez ê li te temaşê bikim gava tu amade bikî.

Saeteke şûnde jî got;

“Suecanê, ez hêvî dikim ku rojekê ez ê wêneyê Kendava Napoliyê saz bikim.

Tixtor bi destê Sueyê yê tenik û diricifî girt û got, “İhtimal nîvenîv e, heger tu baş lê binihêrî, tu lê miqate bî, tu yê bi ser bikevî. Niha divê ez herim ser nexweşekî xwe yê din, li qata jêrîn e. Navê wî Beherman e, ez bawer im wênesaz e. Bi firikê ketiye. Yekî kal e, rewşa wî gelekî nebaş e, nexweşiya wî dijwar e. Tu hêvî tune ye ji bo wî, lêbelê dîsa jî em bibin nexweşxaneyê wê jibo rehetiya wî baş be.”

Roja din tixtor ji Sueyê re got, “Tu bi ser ketî, tu talûke nema. Êdî tenê xwarinê baş hilibijêrî ji bo wê, ew qas e.”

Wê rojê piştî nîvroyê, Sueyê hat ber nivînên ku Johnsyê di nav de bû ku bi kêf milikekî şînik î rîs ku bêkêr bû çêdikir û di paş balîfka wê re milê xwe da ber piştê û got;

“Mişka min a spî, tişteki min î ku ez ji te re bibêjim heye; Beherman beg, li nexweşxaneyê bi firikê miriye. Ev du roj bûn ku nexweş bû. Roja pêşîn dergêhvan ew li odeya wî ya qatê jêrîn ji ber jana canê wî bêzar dîtibû. Solên wî, cilên wî şil bûne û mîna

cemedê sar bûne. Di we şeva tirsnak de kesî fêm nekiriye ku çûye ku derê. Fanosek dîtine, gava fanos dîtine hîna jî vêketîbûye, dîtine ku pêlik ji ciyê wê bi dûr e, ji nava bexçe jî çend qirş û qal jî li nava hev ketine. Û paletêk jî dîtine, boyaxa kesk û zer li ser bûye. Di paceyê re binihêrî Johnsîyê, tu pelê dawîn ê wê dêliyê dibînî şêrîna min. Tu qet nefikirî ku çima nalive gava ba tê. Ax, şêrîna min, ew şahesera Beherman e. Şeva ku pelê dawîn weşiyaye ew çêkiriye.

www.arsivakurdi.org

DIYARÎ

Ne guleke sor an jî dileke ji saten e
 Pîvazek e ez didim te.
 Heyv e ew, pêçayî bi kaxezên gewr
 Ronahiyê direşîne
 Mîna evîna hêdî hêdî tazî dibe
 Fermo.
 Ew ê te kor bike ji rondikan
 Mîna hezkiriyekî
 Wê dûmenê te bike
 Wêneyekî hejhejok ê xeman
 Bes dixwazim rastiyan bibêjim
 Ne karteke şîrîn an jî pîrozbahiyeke sûprîz e
 Pîvazek e ez didim te.
 Maça wê ya xurt dê bimîne li ser lêvên te
 Bestî û dilsoz
 Mîna me
 Mîna hindî ku em hene
 Bigir.
 Ku te bivê
 Çerxên wê dê bibin gustîla nîşanê
 Kujende.
 Bêhna wê dê biçespe tiliyên te,
 Dê biçespe kêra te.

Carol Ann Duffy (1955-)

Wergera ji îngilîzî: Ergîn
Opengîn

www.arsivakurdi.org

ŞEKER DÜRÜMÜ

Hesenê Silêvanî

*Kürtçe'den
çeviri: Ergin
Öpengin*

Hesenê Silêvanî, 1957 yılında Zaho'nun Tirkija köyünde doğmuştur. 1975'te Irak hükümeti köylerini yakar ve Arapları yerleştirir köylerine. Böylece mecburi olarak Musul'a göç etmek zorunda bırakılırlar. 1975'te şiir ve öykü yazmaya başlayan ve bu güne kadar şiir öykü ve roman dalında dört eseri yayımlanmış olan yazar ayrıca çeşitli gazete ve dergilerde de yazmıştır. Kürt Yazarlar Birliği üyesi olan yazar halen Irak Kürdistan'ında yaşamaktadır.

Uzun bir süre sessiz sakin kaldı öylece, mağaranın kuytu köşelerini ve duvarlarını düşündü. Ta ki korku ve karanlık bir olup ona dalaşincaya kadar. Dört yaşındaki Helok aniden kendini annesinin kucağına attı, dağınık, kıvrıkcık saçlarıyla başını annesinin göğsüne sıkıca yasladı.

-A... ana ben acıktım. Şeker dürümü isterim.

Yanında duran babası dönüp kızgın bir sesle:

-Sus kız, sırası mı şimdi? Helok ağlamaya başladı, elleriyle gözlerini ovuşturup kafasını annesinin göğsünden kaldırdı ve umutla baktı annesine, gözyaşları içinde dedi:

"Acım ben anne." Nazlı kızının açlık gözyaşları ve çaresizliği karşısında annesinin içi yanıyordu.

-Helocan... Anan kurban olsun sana, yeter ağlama, yüreğimizi dağlama. Bak gidiyorum şeker dürümü yapıp getireceğim sana, ne oluyorsa olsun artık.

Kocası tütün tabakasını kuşağından çıkardı ve sakat olan sağ ayağının düşüncesine daldı. O andan üç yıl öldürdü:

-İsif, bir darbelik iş bu, kimsenin yanaşmasına izin verme yeter. Sana göre değil... Uzak dur ondan... Beladır.

-Bela olduğunu, düşman olduğunu biliyorum ama evin önünde çakılı o patlamamış kurşunu gördükçe içim daralıyor... nasıl olursa olsun...

-İsif... İsif.

-Ha ha Alya... Ne oldu?

-Kıza göz kulak ol, ben gidiyorum! Ne söylerse kar etmeyeceğini biliyordu. Kimse karısının dik kafalılığını kendisi kadar iyi bilemezdi. Bununla birlikte yine de:

-Allah'ın delisi gitme... Gitme... İtoğluların uçaklarının seslerini duymuyor musun... Neredeyse burda bile sağır edecekler bizi.

-Beni tanımıyor musun İsif? Boşuna yorma kendini.

-Sen ölümün... neuzu billah...

Yakınında duran aksaçlı, buruşuk yanaklı yaşlı bir kadın:

-Dur, gitme, kızın nasıl olsa ölmez açlıktan.

Elinde kara tesbih olan adam da:

-Alya... Allah'ın adını an ve yanlış yapma... Sen çıkar çıkmaz yerimizi bulurlar ve uçaklar mağarayı bombaya tutar...

Alya, Helo'yu her iki gözlerinden öptü ve yaşlı adama dönüp sert bir üslupla cevap verdi:

-Korkma Sofu Eli, korkma, ölmezsin... Bizler böyle oldukça halimiz hiç değişmeyecektir... Bu boynubükük yaşam yetmedi mi sofu? Alya daha çocukken bile akıllı ve çalışkandı... Babası ile Bexeri dağına gider, odun keser, odunları bağlayıp sırtladıktan sonra evin yolunu tutardı...

Köyün kadınları ona şaşırıyor, afallıyorlardı onun karşısında. Alya'nın korkusu sarmıştı herkesi.

Başındaki yazmayı iyice sıktı... Levendilerini* birbirine tutturdu...

Entarisinin eteklerini beline doladı, hızlıca mağaradan çıkıp köye yöneldi. Yolunun üzerinde hangi engellerin onu beklediğini hiç bilmiyordu. Dikenleri dert etmiyordu hiç.

“Senden başka kimim var ki bu dünyada, canfeda olduğum Helo'm. Teri, ot ve çiçeklerin üzerine düşen bahar çiği gibi ıslatmıştı yüzünü ve bedenini ... Bazen elleriyle bazen de eski beziyle kuruluyordu... Daha uzaktayken köyün üzerini toz ve dumanın kapladığını gördü... Gayrı ihtiyari, derin bir ah çekti.

Vay başıma gelenler... evlerimizi de yaktılar... ödleğlerin gücü bir bize yetiyor.

Silahsız ve güçsüz bizlere... Allah canınızı alsın sizin.

Adımlarını sıklaştırdı... Varıncaya kadar gözlerini köyden ayırmadı... Köyün evleri yerle bir olmuştu... Kışlık yiyecekleri yanıyordu... Kuş ve hayvanları kanlar içinde sürünüyorlardı... Köyün sokakları doşka kovanları ve top saçmalarıyla dolmuştu. Yılgın kalbi, yanık bağı ve yaşlı gözleriyle yavaş yavaş evine yöneldi... Kışlık gıda odası yerle bir olmuş. Eğreti kırışlerin her biri dört beş parça olmuş.

Dam silindiri bahçe içinde bölük bölük... Gelinlik sandığını yerin dibine geçirmiş bombalar... Halen o yürek yangınıyla viran olmuş evini düşünürken uzaktan gelen uçak sesleri kalbini ürpertti... Ruhsuz adımlarla köyün sağ tarafına düşen kadınlar çeşmesine doğru koştu ve bir taşın arkasına atladı. İki uçak gördü, alçaktan uçuyorlardı birlikte... Rahatsız edici keskin bir sesi vardı uçakların. Bir süre köyün etrafında dolandılar, ardından ölüm yükünü köyün harabelerine döşeyip yeteri kadar yemiş iki kartal gibi hoşnut bir şekilde göğe yükselip merkezlerine yöneldiler. Alya köye döndü, bir bombanın isabet ettiği yerde dört-beş gez genişliğinde bir çukur gördü... Ne yapabilirdi, her iki elini göğe doğrultup yüksek bir sesle haykırdı:

“Allah’ım... mübarek Kuran’ının hatırına bu dünyada rahat görmesin onlar, ne hakla bizi evsiz barsız bıraktılar? Ey Allah’ım sen biz çaresiz garibanların hakkını onların yanına koma... Allah’ım... Ey Allah’ım... Helocan, sana şeker dürümü yapacaktım...” Şeker kutusunu aradı, darmadağın haldeki kap kacak içerisinde buldu.

Bir ekmek sofrasına ekmek ve simit doldurdu. “Şimdi çocukların hepsi senin gibi acıkmuşlardır Helocan, senin sayende onlar da yesin... Bu ekmek hepsine yeter!” Mağaraya varmasına çeyrek saatlik yol kalmamıştı ki üç tane uçağın gürültüsü yankılandı derin vadide ve gök çalkalandı seslerinden. Alya vadiye yetişip saklanmak için hızla koştu ama uçaklardan biri hemen peşine düştü ve beş yüz gezlik bir aralıkta, başının altındaki vadide... Her seferinde bir taş kaldırıp fırlatıyordu ona, nafile... Yeterince eğlenip bezdikten sonra Doşk’un ağzını ona doğrultup erkekliğini ıspatladı... Bedenini paramparça etti... Ve doğu yönünü tuttu, diğer ikisi de onu takip etti... Şeker kutusu yere dökülmüş al kana bulanmıştı, bir sofraya ekmek kendisine bağladığı haliyle kalmıştı... Uzaklardan gittikçe yaklaşan bir ses geliyordu: “Alya...Alya Umerpira’nın gülü... n’ettin kendine n’ettin bana... Helok ne yapacak artık... Alya...”

Alya... Helok kadınların bağrıışma sesiyle uyandı, arkadaşı Çino’ya:

“Şimdi annem gelecek ve bana şeker dürümü getirecek... İkiye böleceğim, yarısı bana yarısı da sana, tamam?”

* Geleneksel kürt kadın giysilerinin kollarının ucuna dikilen uzun kumaş parçası, kol bağı.

Seyd Elî Esxerî Kurdistanî

Hîwa Qadir

Êsta êwareye û tarîk dahatûwe. Le pencerekewe spêti kilûwe befrekan ebînîm. Gêjelûlkeyek lûliyan edat û be nabadillî ber rûyî pencerey ew jûre ekewin ke min lemdîwîyewe le berdem kompûterekeda daniştûm û enûsim. Gwê le Seyd Esxerî Kurdistanî egirim ke le nêzîkey sed sall lemewberewew ta êsta aşiqane eçîrîkênê herkesê hat û wûtî min aşiqim birwa meke. Emewêt cigereyek dagîrsênim û çerxekem nadûzmewe. Le sermanda mûçirrkeyekim piyadêt, hewakêşe piçkolekey pencereke daexem ta dway henase qullekanî Seyd Elî Esxer minîş henaseyekî qul legell goraniyekeda hellmijim.

Ekewmewe seyrkirdinî kilûwe befrekan û naw rûnakî sardî ber pencereke. Êsta layî min şewêkî direng e. Şewêkî sard û sirr. Bellam wek ew insaney yekem xanûy durust kird le mêjûda, lem dîwî pencerekewe hest bew destellatey xom ekem ke etwanim xom le hêzî têkşikênerî sirûşt biparêzim.

Dway dubare lêdanewey ew goraniye bedemxomewe qise ekem: pêçêt eşq tenha ew hêze nihênî û şaraweye bêt ke wek Xwa neyewêt le naw êmeda xoy pêşan bidat, nihênîyek bêt û pirr bêt le temenakirdin û xewnbînîn. Min êsta wamlêhatûwe rrûberrûbûnewey aşqanem zor pê zehmet bêt legell kesêkda, ke çî bedîwêkî tirîşda hemîşe hest ekem aşiqim. Hemîşe hest ekem le dûrî me'şûqekem tenham û çawerrêm. Ew heste zîndûweş pillpêwenerêkî gewrey mine bo nûsîn. Pêçêt hêşta min her ew kurre kaley naw 'sefername' bim! Be xom elêm: to billêy dway

têperrbûnî temen çendeha peşîmanî lewdîyû temenakan û henase qullekanî Seyd Elî Esxerewe ebêt, ke way lêekat awa be şeydayîwe qoranî billê?! Kê elêt wa niye, çozanîn! Ke elêt le pîrî da ténageyn ke hemû ew şerraney eşq pêykirdûyn hellbûn, şerrî teqînewey hormonekan bûn le naw cestemanda, lebirî ewane ebû komellê şerrîtirman bikirdaye ke taze êdî temen rrêgeman pênatat bigerrênewe biyankeyn, kê ellêt wa niye?! Kêş ellêt şikestî ew şerraneş waman lênaken ke asantir mirdin qibûll bikeyn.

Min êsta hergîz natwanim bawerrim be eşqêkî mîsalyane hebêt, bellam beşêk le şerrî eşqîş eweye ke qet natwanêt be tewawetî bête naw zanînewe, dena hemû kes destî bew zanîne egeyşt û lêzanane aşiq ebû. Pêşimwaye hêndey allozî însan eşqîş allozî têdaheye, çunke eşq wurujandinî alloziyekanî însane, we herçî katêkîş rreceteman bo eşq nûsî, nêşaney eweye ke ême basî hemû şitêk ekeyn eşq nebêt.

Min kesêkim guman beşêkî gewreyî le jiyanim xwarduwe, çunke şitêk niye nawî rrastiyekî ebedî bêt û qabilî pirsyarkirdin û gumankirdin nebêt, her ew gumankirdineye hêzî ewem edatê cuwaniyekanîtir bidozmewe, çunke تنها heqîqetêk bûnî niye, dena dena zor piçûktir ebû lewey ke heye. Hîç şitêkîş hinde pîroz niye ke gumanî lênekeyn û derbarey pirsyar nekeyn.

Min zor lewe mandûtirim ke êsta awa em qisane bo to ekem. Zor caran xom be alltungerrêk dête ber çaw ke çomekanî dinya be bêjing ebêjêtewe ta rrojêk kute alltunêk ekewête naw êjnekeyewe û hawarekat dozîmewe, minîş herwa ekem, bellam carê min lem çomewe destimpêkirdûwe ke xomim, hajey kefçirî guman, tirs le çetekanî naw serim hîlakyan kirdûm ke ewanîş her xomin, her ebêjmewe her ebêjmewe, her enûsim û enûsim, ta ew parçe altûne, ew dêrre sîhrîye edozmewe û emgeynêt be kanêk le alltûn, be çendeha şewaz le nûsîn û bîrkirdinewe.

Bimbure min lem dûrewe bê ewey pirsit ekem emewêt to le berdemî xom da dabinêm û hekayete swawekanî xomit bo bigêrrimewe, hikayetî nûserêk ke eyewêt sîhrî serkewtinî nûsîn bo xwêner bigêrêtewe, be bê ewey dozîbêtîyewe.

Em wênane ke min bo toyan basekem wêney hemîşeyî û te'rîfkirdinî xom niye le berdemî toda, emane تنها wênekanî çend dîwêkî naw minin, wêney em bîrkirdinewaney êstamin, min pirrim le wêney nadiyarîtir ke xoşim bedwayanda egerrêm û nayandozmewe, leberewe hergîz hewll mede min le naw çend dêrrêk da te'rîf bikeyt û nawî binêyt nasînî min, hergîz wa nekeyt, dena ew kate le lêkdanewey şitekanda behellada eçît û xot le berdem تنها wêneyekda ebênêtewew pêtwaye ew wêneye minim.

Min le wilatî spêtî befr û to le wilatî spêtî nêrgizewe, min bem hemûû wirrênaney xomewew toş bew waqurrmane sadaney xotewe le berdem bawkêkî hîlak û daykêkî mêhrebanda. Min bem hemû zexmaney xomewe bem hemû parçe şikawaney ser destmewe ke hî xewnekanimin, toş bew hemû xeyallaney naw baxçe şî rîyekanî firuqewe ke wek kiçêk eteweêt hemû şitek cuwan bêt. Ke nabêt!

Minîş wek to wa bûm, boye wêney to min bîrî xom exatewe, êsta daykek dillî lay kiçênî toye, minîş rrojanêk bawkêk dillî lay piyawbûnî min bû, çunke min wek hemûwan nebûm. Nîştimanekey min û to dijî hemû ciyawaziyekane, dijî ew fentaziyanekeye ke ciyat ekatewe le 'ewam. Hemîşe pelkêştetekatewe naw ba'e ba'e dubarebuwekanî naw mêgelêk ke sizakanyan qurstire le sizay gurg.

Ême hemûman giriftarîn be fêllekanî jîyan. Aya ewane pêyan wa ye nihênîyekanî jîyanyan dozîwetewe birawen? Yan ewane

birawen ke her ewdallin û nagen be asûdeyî?! Pêm wa ye ême hemûman bew corey ke xoman emanewêt be dway asûdeyda egerrêyn. Bellam asûdeyî le kwêye?

Jiyan le satî dakirmandinî sêwêk eçêt û legell tewawbûnîda tewaw ebêt.

Tîpguhêziya ji tîpên erebî: Ergîn Opengîn

Têbînî: Ev name, ji kitêba Hîwa Qadir û Seher Resayî ya bi navê “Bonî Şerab Le Henasem Dê” (2006) (Bêhna Şerabê Tê ji Henaseya Min) hatiye wergirtin.

Bêrîvanek di Kakilê Xewnê de

şivanekî gul firidand
 nav şîrê nûdotî. ez nedîtîm
 ketibû bara heyvê
 min heyv danîbû wir!
 wê gavê ku çiya di xew ve diçûn li ser lêva min
 min şev reşandibû ser vî qelaçî
 da bikeve û bişike asîman
 bêlivtirîn stêrê hiştibû ez û seyê serê banan
 bixwin pelên gula nûçînî berfa xwêkirî
 yek ji me gula firidî
 yek şîrê rijiyayî
 navbera me şivek e li pişta şeytanokan dikeve
 nava me pezekî dizê bi dizî
 şivan bi ser zanîna batirsokê vebûye
 ji sêncan derbas nebûye bi qasî pelê gwîzekê jî
 lê va ye nava me gulekê dizê
 û mar e dixwe firo
 ez im dibezim qelêç
 se ye didire piyê şkestî yê asîmên
 şivanekî ku gul firidand nav şîrê nûdotî
 û şîr rijiya û ew tewiya û heyv tefiya
 min hew ew dît
 ketibûm bara xewnê
 xewn.. wî danîbû wir!

wê gavê ku ramûsanek dizivirî li çiyê
guleke din bi dizîka difiridî nav valahiyê
valahî.. min danîbû wir!
wê gavê ku bêrîvanekê xwe germ dikir li pelikên çavên min.

Osman Mehmed

www.arsivakurdi.org

KASEYA CAM³⁶

F. Scott Fîtzgerald

Ji Ingilizî: Şerîf Derînce

Nivîskarê mezin ê edebiyata emerîkî ya sedsala bûrî F. Scott Fîtzgerald di sala 1896an de li Minnesotayê, li Emerîkayê ji dayik bûye. Fîtzgerald zêdetir wekî berdevkê Çaxa Jazz a (The Jazz Age) dehsalên 1920an tê nasîn. Di şerê cîhanê yekemîn de cih girtiye û yekemîn pirtûka wî di wan salan de der çûye. Duwayî şerî jî dev ji nivîskariyê bernedaye û çîrok û novelên gelek bi navûdeng nivîsandine. Pirtûka wî ya bi navê "The Great Gatsby" tê nasîn, wekî baştirîn xebata wî tê pejirandin. Jina wî Zelda Sayre jî nivîskar bû. Berî kû bimire, li Hollywoodê bo filman deq amade kirin û di 44 saliya xwe de, di 1940an de, koça dawî kir.

Wexta Pîper Beg û Pîper Xanim zevicîn, diyariyên pê camê dihatine çêkirin, gelek mode bûn. Gelekî ji van diyariyan di demeke kurt de yan diderizîn yan jî dişkestin. Lê belê piştî heft salên deweta wan, kaseya cam a ji wan re hatî, hêj jî li malê bû. Ev kase di odeya xwarinê li ser bûfeyê bû.

"Çîrokeke vê kaseyê heye" got Pîper Xanim bo hevalê xwe Fairboalt Xanim.

³⁶ Navê çîrokê di eslê xwe de "The Cut-Glass Bowl" e û ji pirtûka Fitzgeraldê ya bi navê Flappers and Philosophersê hatiye standin. Ev werger ji versiyoneke hêsankirî ye.

“Ji bo demekê, ez û Carlton Canby hevalên hevdu bûn.” got Pîper Xanimê û berdewam kir “ Ew tê bîra te? Wêca, dema wî bîhist ku ez bi Harold Pîper re dizevicim, Carltonê tişteke acêb ji min re got.”

“Evylyn” got wî “ Ez ê diyariyeke hingî te bidim te. Ev xweşik û vala û wekî te ronahî ye.”

“Paşî jî ev kaseya cam gehişt malê.” got Evylyn Pîper bi bişîrînekê. “ Spehî ye, ne? Lê gelek mezin e. Nêzîkî metreyekê ye.”

Fairboalt Xanim kenî.

“ Min ji hemû tiştên di mala te de hez kir. Te ev qas tişt da nîşa min, spas.”

Ez gelekî kêfxweş bûm ku te mala min begen kir.” got Evylynê. Divê tu carek din bê vê derê. Ez hema hema her roj piştî êvarê li malê, vala me.

Lê belê hemû kesan dizaniya kû Fred Gedney Begê her roj telefon dikire mala wê.

“Divê tu Pîper Begî der barê serdanên Gedney Begî de agahdar bikî.” got di dilê xwe de Fairboalt Xanimê. “Lazim e, Harold wexta xwe zêdetir li malê biborîne!”

Fred Gedney Begî piştî nîvro telefon kir bo Evylynê.

“Divê ez te bibînim. Min nota te girt. Gelo Harold ev not daye nivîsandin?”

Evylyn Pîperê bi xemgînî serê xwe hejand.

“Xelas Fred” got wê. “Xwîşka Harold ji wî re behsa me kir. Hemû kes behsê dikan. Dilê Harold şikest û ji min xeydî ye. Lê belê ew ji min hez dike û ez jî ji wî hez dikim. Yan jî ez wiha difikirim.

“Bawer bike, ez te fehm dikim.” got Gedney hêdika. “Lê, ev ne ya dilê min e. Tu jî vê dizanî.”

Bi çavên xwe yê reş, Evylynê lê nihêrî. “Divê tu niha biçî.” Got Evylynê. “Min soz daye Harold kû ez êdî te nebînim. Divê me liha bi hev re nebîne.”

Wexta dengê deriyê pêşiyê hat, ew hêj di odaya kitêban de, şipiya bûn. Evylynê montê Fred girt û ev kêşa odeya xwarinê ya bêceyran.

“Ez ê Harold bibime qeta jorê” got Evylynê. “Paşî jî tu ji deriyê pêşiyê derkeve û bi lez dûr bikeve.”

Û Evylyn bezî çû salonê kû pêşwaziya mêrê xwe bike.

Harold Beg niha ji xwîşka xwe neh sal mezintir, bi gotineke din sih şeş salî bû. Mêrekî ciwan bû lê her du çavên wî gelekî nêzîkî hev bûn. Vê şevê gelek kêfxweş bû. Biryara xwe dabû kû jina xwe bibexşîne, wê ji bo tekiliyên bi Fred re biborîne. Harold bi awayekî germ peşwaziya jina xwe kir.

“Ji bîr neke, em ê îşev bo şîvê derkevin derve.” got jina wî. “Tu biçî jorê û xwe amade bike dê baştir be.”

“Bo çi?” Harold pirsê. “Ez ji xwe amade me, delala min.” Çû kitêbxaneyê, rûnişt û dest bi xwendina rojnameya xwe kir.

Miraza wê di dilê wê de ma. Fred Gedney di oda xwarinê de bû û ji nişka ve dikariya biçe wir, tiştêkê vexwarinê ji xwe re rake. Paşî mêrê wê ji cihê xwe rabû, rojnameya xwe avêt û hate rex wê.

“Evî, delalê” got wî. “Ez te fehm dikim. Hevaltiya te bi wî mêrikî re tenê xeletiyekî hîssî bû.”

Ji nişka ve dengê çirçireke denggirs ji qata xwarinê hat. Fred Gedney hewl dida kû bigehe deriyê paşiyê. Îcar dengê zengilekê hat. Milê Fred kaseya mezin a cam ketibû.

“Ew çi bû?” qîr da Harold. “Kî ye li wir?” Harold bezî oda xwarinê û gehişt mitbaxê. Evelyn jî ket dû wî.

“Şeytanê biçûk!” got Harold. Milê Gedney girtibû. Berê xwe da jina xwe û got “Te gotibû êdî tu wî nabînî. Te sûnd xwarîbû.”

“Ev ne xelatiya Evelyne ye.” got wî bi dengeke nizm. “Ez bi xwe hatim vir. Wê negote min ‘were’.

Evelyn bi êş û xema çavên mêrê xwe ciniqîbû. Ji nişka ve hêrs bû.

“Derkeve!” kire qîr Evelyne û dehfeke da Fred Gedney bi destên xwe yên nazik. “Te kir. Te mêrê min aciz kir. Derkeve! Derkeve! Derkeve!”

8 sal derbas bûn. Roja jidayîkbûna Evylynê bû. Bi vê rojê, gav diavête sih û pênc saliya xwe. Hêj jî gelek spehî bû, lê belê wekî berî bala hemû mêrên derdora wê li ser wê nebûn. Her çiqas çavên wê hêj jî mezin û reş bûn, kenîna wê qeşengiya xwe ya berî winda kiribû. Evîna Harold û Evylynê wekî berî geş nebû. Evylyn ji bo xatirê hevalên xwe, beriya vê jî ji bo xatira zarokên xwe Donald û Julie'yê dijiya. Kurê wan yê mezin li dibistanê, dûrê malê bû.

Evylyn li ber pencereya oda razanê sekinîbû. Ew mêrê wê şeva berî di ezîmeyeke şîve de bûn û gelek qerimî bûn. Çawa ku Evylynê çavên xwe bo razanê girt, ji qeta jorê qirînek bilind bû.

“Çi bû?” ba kir Evylynê.

“Julie Xanim destê xwe birriye.” got xizmetkar Hildayê. Evylynê destmalek girt û bezî jorê.

“Min tiliya xwe birrî.” got Julie'yê bi girînekê “Gelekî diêşe dayê!”

“Destê xwe bi vê kaseyê birriye.” got xizmetkarê. “Min kase danîbû erdê ca ez bûfeyê paqij bikim. Paşî jî Julie hat li vir û destê xwe birîndar kir.”

Evylynê destmal pêça li ser destê keça xwe û paşî wê dev ji girînekê berda.

Roja eyînê bû Harold di seet 5an de zivirîbû mala xwe. Çawa jîna xwe dît, ew girt maçî kir. Ji bo pêncih û pênc salên wê pêncih û pênc ramûsan!

“Te vexwariye!” got Evylynê û dehfek da mêrê xwe “Tu dizanî ez çiqas ji vê tiştê aciz dibim, Harold!”

“Evie, divê ez tiştê bo te bêjim.” got Harold piştî demekê. “Tu jî dizanî, kar û barên me baş nînin. Xwediyê karê me yê

nû Clearence Ahearn tê bîra te? Ev ji bo min û birayê min Mîltonê mirovekî gelek baş û eqilmend bû. Lewma, piştî yekê Rêbandan'ê Birayên Pîper bûn şîrîkên şîrketa Clearence Aheranê. Navê şîrketa nû dê bibe 'Şîrketa Ahearn û Pîper'

- Ev tiştêkî baş e? Min fehm nekir.
- Ev mesela pereyan e. Ji bo berdewamkirina karê me, pêwistiya min û ya birayê min bo pere heye. Birayên Pîper nikarin bi tenê serê xwe, vî pereyî qezenc bikin. Min û Clearence bi hev re firavîn xwar îro û me li ser vê meselê li hev kir. Wê nîva şîrketê bigehe wî. Lewma min ji bo îşev gazî wî û jina wî kir bo şîvê. Mîlton û hin kesên din jî tîn. Ez ê hinek panç³⁷ (punch) amade bikim. Em ê neh kes bin, lewma eger ez di kaseya mezin a cam de çêkim dê baştir be."

Harold li ber bûfeyê ve gavên xwe avêtin.

"Ax ne. Ev kase gelek mezin e." got Evylynê "Tu dizanî dê çawa çêbe. Hemû kes ê zêde vexwe. Min li malê ev qas kesên serxweş navê. Di vê kaseya biçûk de çêke.

Harold kenî û serê xwe hejand.

Bi awayekî tund got: "Ez ê di ya mezin de çêkim." Destê jina xwe da rexeke. Wê jî hilmekê kûr kêşa û bi kenekî westiyayî ji odê derket.

Di seet 7an de, Evylyn hat xwarê û mêhvanên xwe pêşwazî bo hundir ve kir. Makyaja wê zor cuwan bû û pirça wê jî dibiriqiya. Kêfa Evylynê ji jina Clearence re nehat lê belê Clearence bi xwe ber çavên wê şîrîn bû.

³⁷ Cureyeke vexwarinê ye ku ji ava çend fikiyan û dozêk alkolê tê çêkirin.

“Ez bi nasîna Pînter Xanimê kêfxweş bûm.” got Clearence Ahearn bi dengê nizm û dewam kir “Ez û merê we îsal bi hev re kar dikin. Ji vir paş ve em ê hev zêdetir bibîn.”

Evylyn bi bişirînekê berê xwe da ber mêhvanên xwe yê din. Ev mêhvan jî ji malbata wê û ya Haroldê bûn.

Harold rêya oda xwarinê da nîşa wan. “Em ê îşev panç vexwin” got Harold bi dengê berz. “Min bi destên xwe amade kiriye û tama wê gelek xweş e. Ez dizanim ji ber ku min ev ceribandîye. Bo hemû kesan noşîcan be.”

Heta şev xelas bû, panç vexwarin. Piştî şîvê jin ji oda xwarinê derketin û pênc mêrên mayî berdewam kirin. Dema mêr çûn oda runîştinê, rûyê Harold sor bibû. Dengê wî jî bilind bibû. Birazayê wê Tom Lewrie nedikariya bimeşe. Tenê Milton Pîper û Clearence Ahearn bi rehetî diaxaftin.

“Hûn nû hatine vî bajarî.” got Harold. “Mirovên vî bajarî kesan gora mala wan dinirxînin. Divê hûn maleke mezintir li ser vî girî ji xwe re bikin. Paşî kesên din ê bixwazin we nas bikin. Paşî, dê ji we hez bikin.”

Birazayê Harold, Tom xwe da pêşiyê. “Divê karmendekî wekî we beşdarî Klûba Bajêr bibe.” got. “Neke xem, ez ê te bikim endam. Harold gote min mirovek dixwaze we li derveyê klûbê de bihêle. Min bihîst hûn lewma aciz in.” Clearence û jina wî bi hev re sor bûn. Milton Pîper rabû ser xwe, ew jî aciz bibû.

“Bawer im wexta çûnê hat, Tom....” got Milton.

Ji nişka ve Evylynê bihîst yekê destê xwe gihand milê wê. Xizmetkar Hîlda bû.

“Ji kerema xwe werin, xanima min. Destê Julie’yê gelek werimiye. Bi ya min jehrî ketiye. Kela wê zêde bûye û dike qirîn.” got Hîldayê.

"Julie!" got Evylynê. Berê xwe da mêhvanên xwe û got: "Divê hûn min bibexşin. Ez ê biçim jorê. Keça min nexweş e.

Evylyn, bi lez merdîvan xilas kirin gehişt oda keça xwe. Rûyê wê germ bû. Laşê wê werimî bû û li ser tiliya wê deqeke sor derketibû.

Evylyn wiha fikirî ku jehrî ketiye xûna wê. Julie'yê di seet 3an de destê xwe bi kaseya cam birrîbû. Seet niha 11 bû. Evylyn bezî ca telefon veke bo doxtor û zivirî hat oda Julie'yê.

Dengek ji oda pêşiyê hat. Dema Evylyn vegeerî xwarê, tenê Harold û birayê wî di odê de rûniştibûn. Rûyê Haroldê zer bibû û ew qas serxweş bû ku nedikariya biaxive.

"Ew zilam, Ahearnê birayê min biçûk xist...hem jî, di mala min bi xwe de..." got Harold.

"Mesele çi ye?" pirsî Evylynê bi dengê tûj.

"Meseleyek hebû" got Milton," Tom dilê Ahearnê hêlişt û wan dest pê minaqaşeyekê kirin. Harold hewl da ku wan bisekinîne."

"Diviya te jî tiştê bikira, Milton." got Evylynê bi hêrs. "Lê belê mesele ne ew e niha. Julie nexweş e."

Evylynê li mêrê xwe nihêrî.

"Û tu serxweş î, Harold." got bi dengê tûj. "Wî bibe ser cihê wî, Milton."

Evylyn çû oda xwarinê. Kaseya mezin, ji xeynî perçeke cemedê di bin de mayî, vala bû.

"Ev kaseya naletî ya kevn" got Evylynê bi dengê nizm.

Doxtor nêzikî nîvê şevê gehişt malê. Destê Julie'yê tîmer kir û soz da ku dê sibehê di seet 6.30an de careke din bê mala wan.

Evylyn heta nîvro neçû oda Harold. Harold bi çavên kul û sor li jina xwe nihêrî.

- Ez duh şevê bêhiş bûm." got "Ew pança...."

- Niha vê nefikire" got Evylynê. "Keça me gelek nexweş e. Jehr ketiye xwûna wê. Dibe ku doxtor destê wê jê veke ca ku nemire."

- Çi?"

- Julie ji ber kaseya pançê destê xwe birî. Tu têngahî?

- Ez ê cilên xwe li xwe bikim, got Harold hêdika.

- Belê, lazim e tu li xwe bikî, bersivand Evylynê bi dengekî sar.

Evylyn Pîper di 30 saliya emrê xwe de spehî bû. Di 45an de ne. Li ser rûyê wê xît hebûn û hey hey bê kêf bû. Edî qelew jî bû.

Êş û kêşeyên mala Pîperan hebûn. Harold baş nebû. Ew jî kêfxweş nebû. Welat di nav şer de bû û kurê wan Donald jî li Ewropayê di şer de bû.

Julie êdî 13 salî bû. Keçeke bê kêf û rûzer bû ku ji dîtina miravan qet hez nedikir. Doxtor destê wê yê birîndar jê kiribû û li şûn de yeke çêkirî lê xistibû. Ji ber ku dibistan gelek dûr bû neçû dibistanê jî. Wexta li malê jî bû destê xwe yê çêkirî xef dikir.

Şevêkê, Evylyn di salonê de tenê serê xwe bû. Axînek kêşand. Wexta ku ciwan bû, çiqas kêfxweş bû. Niha, di van rojan de jiyana wê çiqas nexweş bû. Deriyê pêşî vekir û çavek avêt derve. Heyveronê wextên wê yên xweş anî bîra wê.

Ji pişt ve dengek bihîst û zivirî.

“Çi ye, Hilda? pirsî Evelylnê. “Meseleyek heye?”

“Ne Pîper Xanim.” bersivand xizmetkarê. “Lê belê nameyek bo we hatibû. Wê demê ez mijûl bûm. Min danî cihekî. Lê belê niha li tu deran nabînim.”

- Tiştêkî çawa bû?
- Di nav zerfekî dirêj û teng de bû, Pîper Xanim. Ez bawer im, nameyekê der barê kar de bû.

Rûyê Evelylnê ji tirsî zer bû. Alikariya Hildayê kir ku nameyê bibînin.

“Belkî li oda xwarinê be.” got Hildayê. “Wê gavê dengê ji deriyê paşiyê hat û ez mecbûr mam ji oda xwarinê derketim çûm mitbaxê.”

Bêhna Evelylnê çû û di cih de rûnişt. Dizaniya esehî name li kû ye û dizaniya ev name der barê çî ye. Di hişê xwe de zerfa dirêj û teng didît. Baş dizaniya ku ji Beşa Şerê bû û dê bigota kurê wê Donald miriye.

Bi hewaşî Evelylnê rabû ser piyan. Di nav oda xwarinê de diçû û dihat. Ceyran vemirand.

Kaseya cam şewqek vedibeya û bi hezaran rengan dibiriqiya. Evelylnê ber bi sehpayê ve hêdî hêdî çû. Nav kaseyê nihêrî.

Da ku zerfê hilgire, destê xwe dirêjî nav kaseyê kir. Hêdîka zerf vekir. Lazim nebû nameyê bixwîne, lê belê xwend. Çawa ji serî ve dizaniya, kurê wê Donald miribû.

Di destî de nameya kanbax, Evelylnê cih de ma. Zîq li kaseya pançê ya hişk û biring nihêrî. Wekî hezaran çavan, wekî çavên şeytanekî dibiriqiya.

Mirov digot kase dibêje: “Tu dizanî ez çiqas zalim û sar im, eynî wekî te. Niha ez kurê te ji te distînim.”

Hingî Evelyne lê dinihêrî, kase ber çavên wê mezintir dibû. Çawa mezin bûyî, ervaz bû. Niha wekî gomîzeke mezin ê bi şewq li ser cihanê disekiniya. Hemû mirovên cihanê di bin vî esmanê hişk û bi şewq bûn. Hemû tişt guherîn. Her tiştêkî berî reş niha ronahî bûn. Hemû tiştên ronahî jî beravajî.

Dengê zengilekê ji kaseyê hat. Dengêkî zelal û bilind, wekî zîlekê bû.

Wekî ku kaseyê digot: “Ez qeder im. Ez ji we hemûyan diwartir im. Min mirina ciwanîyê û dawîbûna hemû hêviyan da nişa we. Desthilatiya min we qontrol dike, niha û heta hetayê!”

Bêdengiyek çêbû. Gomîza cam a mezin hingî diçû zêdetir dihate ser jina tirsîyayî. Paşî, ji nişka ve, kase dîsa diçû ser bûfeyê. Kaseya cam dibiriqîya û şewqa ronahiyê jê dihat.

Bayekî sar ji deriyê oda paşî ya vekirî dihat. Evelyne dizaniya çi bike. Divêya lez bike. Divêya xurt be!

Destê xwe dirêjî kaseya cam kir û li ser laşê xwe yê nerm de dewisand. Bi zehmetî kase rakir. Heta ji oda xwarinê derket, milên wê êşan. Ji oda xebatê derbas bû, çû ber deriyê paşî yê vekirî.

Diviya lez bike. Diviya xurt be. Milên wê diêşîyan û lingên wê bê quwet mabûn, hêdika dimeşîya.

Niha Evelyne li ser koçeya kevir a deriyê paşî bû. Hewl da ku kaseya cam bavêje. Lê belê ber serma nekarî tiliyên xwe veke. Evelyne şelipî û bi qîrekî bêhêvî ket erdê. Wexta ket, destên wê li kaseyê pêçayî bûn.

Şerqînek bilind bû. Ceyranên li ser rê vemirîn. Hemû kes bezî da ku bizanin ev şerqin ji çi derket.

Heyv li ser sîluetê jinikê dibiriqiya. Bê hereket dirêj bibû. Li derdora wê, ji perçeyên camê, ronahî vedibeya. Kenarên caman xweyî hezaran rengan bûn. Rengê heşîn, kesk û qurmizî li gel reş...

www.arsivakurdi.org

Bîrgerrdan

kuçeyek e digindire

bereks

bêtoz in êdî

darikehspên bê zîn ên zarok li ser cadeyan

lê hîna jî pîjk in ew

car axê

car çerxê

dikêlin

berew paş

berew bîr

boş dibe hingî azar

kuçeber diqepişin hingî

ligel kûçikekî nûhatî

nûketî hîna li dû gûstêrkan

şîn hatî cot û ga li ser karoyan

pê lê mekin

xayîntî nabe li bêriyan

bîr dibin lewre

bîrgerrdan dibin

lê jîn jî

li bin pûşkên pîjkeke dîtir

car boş

Ergîn Opendîn

www.arsivakurdi.org

FİTRE

Hesenê Qizilcî

Kürtçe'den çeviri: Şerif Derince

1914'te Batı İran (Doğu Kürdistan) bölgesinde kalan Bokan ve Mahabad arasında bir köyde dünyaya gelmiştir. Mahabad Cumhuriyetinin kurulduğu dönemde, Helale dergisinin başyazarlığını yapmış ve ayrıca Kürdistan dergisinde de yazıları yayınlanmıştır. Cumhuriyetin yıkılmasından sonra Irak'a geçmiş ve daha sonra İran'da şahlık rejimi bitince doğduğu yerlere geri dönmüştür. Çeşitli gazete ver dergilerde çalışmaya devam etse de 1984'te tutuklanmıştır. Tutuklandıktan sonra kendisine ne olduğu bilinmemektedir.

Hacı Ali büyük bir zengindi, alış-veriş işleri o kadar canlıydı ki başını kaşırıyordu; ne bir kumaş satıcısı, ne bir çakal ne de bir hurdacıydı. Aksi takdirde işlerini asla yetiştiremezdi. İşi iyiydi. Çeşit çeşit eşyalar satıyordu ve tek başına yetiştiremiyordu. Aylık 7,5 dinar ücretle akrabası olan Mirza Salih'i hesabını tutsun, bankaya gidip gelsin, bakkal ve kumaşçılardan parasını alsın diye yanına almıştı.

Başı ne kadar dolu da olsa - Allah var – akli başından gitse namazı kaçmazdı ki Ramazan oruçlarından bahsetmeye bile gerek yok. Uyanık ve akıl sahibi biriydi. Dünya ve ahiret hesabını iyi bilirdi. İnce ince hesabını yapmıştı; Ramazan hem ziyarette hem de ticaret. Hem Allah kendisinden razı oluyor hem de üç öğün yemeği kendisine kalıyordu. Allah Hacı Ali'ye uzun ömür versin, bir insanın fakir olması gerekmiyordu yardım etmesi için. Tüccar bir adamdı, alış-veriş erbabıydı. Ticarete de hesap-kitap olmalıydı. Sermayesi çok olsa da toplandığında, kuruşu kuruşuna hesaplandığını görürdünüz. Her bir kuruşu hesap defterindeki

yerini almıştı. Hacı Ali'nin evinin masrafları böyle bir hesapla ayda en az 15 dinar ediyordu. Bu öyle ufak bir miktar değildi; Mirza Salih'in iki aylık maaşı cebinde kalmış olurdu ya da işleri için 5-6 kere Bağdat'a gidip gelebilirdi. Kısacası oruç ve Ramazan her açıdan onun için karlıydı.

Hacı, Ramazan ayını dört dörtlük geçirmiş, bütün teravih namazlarına katılmıştı. İmamdan duyduğu kadarıyla Allah kendisine şükreden kullarının malını artırıyor. Böylece her akşam teravih esnasında nefesi bitene kadar Allah'a şükrediyordu. Allah da kabul ediyordu ki gün be gün üzerine daha çok döküyordu.

Ramazan'ın 28. günü Hacı camide ikindi namazını cemaatle birlikte eda etmiş ve eve dönüş yolunda aheste aheste dualarını ediyordu. Eve varana kadar duaları da bitmişti. Besmele çekip akşam yemeğine başladı. Can sağ olsun, çalışmasının neticesiydi. Sünnetmiş gibi baklava dizilerinin önüne geçti, şiresiyle birlikte yarı ısırlıklarla mideye indiriyordu ki üç-dört parça boğazına takılı kaldı, nefesi tıkanı. Boğazını bir kadeh ayranla ıslattı ve ardından bir iki öksürdü. Şimdi sıradaki yemek için midesini tamamen ayarlamış oldu ve pirinç tepsisine geçti bu sefer de. Bamya ve etle birlikte daha da güzel görünüyordu. Hacı Ali'nin bıyığı ve sakalı arasından rahatlıkla ağzının içine giriyor sonra da aşağı doğru iniyordu.

Arada bir kadeh ayran içiyor – Allah, Hacı Ali'den ve yemeğinden uzak tutsun- bir karpuzu da yanında meze yapıyordu. Tıpkı akli başında bir işçi gibi tepsiyi iyice temizliyordu. Elini sakalının üzerinden geçirdi: "Elhamdülillah, Şükürler olsun Allah'a". Yönünü karısına doğru çevirdi:

- Bana çabucak bir çay doldur, cemaate ve teravihe yetişeyim.

Namaz için örttüğü namaz örtüsü başında, karısı Hacı'ya bir bardak çay getirdi.

- Hacı, fitreleri verdin mi?
- Hay hayır içinde olasin. Allah senden razı olsun hanım, iyi ki hatırlattın. Ey havar! Hepsi kör şeytanın işi, hepimizin alıp götürecekti. Az kalsın oruç ve namazlarımız suya karışıp gidecekti. Bence tüm fitrelerimizi Mirza Salih'e verelim. Sen ne dersin?

Hacı'nın karısı: "Mirza Salih senin adamın. Ayrıca maaşı da var. Ona fitre olur mu?"

Hacı:

— Diyene bak! Karısı ve üç çocuğu var, neden olmasın. Birkaç gün önce camide imam dedi ki, fitre ve sadakalarınızı akrabalarınıza verirsiniz daha makbule geçer. Mirza Salih akrabamız hem de.

Hacı'nın karısı:

— Bayramlık olarak iki dinar verirsin, hem hayırdır hem de büyüklük olur senin için. Fitreni de muhtaç, ihtiyacı olan birine verirsin.

Hacı:

— Sen bu eli bolluğunla benim yerimde olsan, ne ben Hacı Ali olurum ne de sen onun karısı! Hep Mirza Salih vardı aklımda. Ona iyilik de yaptım. İstiyorum ki daha da çok yapayım.

Hacı'nın karısı:

— İyi öyleyse, öyle yap. Hayırlarının önünde durmam.

Hacı yüzünü büyük oğluna doğru çevirdi:

— Abdurrahman, git de Mirza Salih'i çağır!

Mirza Salih gelip alçak bir sesle selam verdikten sonra aşağıya doğru oturdu.

Hacı cemaate yetişmek için acele ediyordu. Hemen yüzünü Mirza Salih'e doğrultarak:

- Fitrelerimiz bu sene sana vermek istiyorum.

Öbür yandan da karısına seslendi:

- Fato, çabuk, iki okka kadar buğday getir!

Hacı'nın karısı:

- Buğdayımız yok. Sadece pirinç var evde, olur mu?

Hacı:

- Ne fark eder? O da yiyecek. Çabuk iki okka pirinç getir.

Mirza Salih: "Eğer mecburiyet olmasaydı almazdım. İnsan çaresiz olmaya görsün, hayır sadaka da alır artık."

Hacı: "Ağzında yel alsın. Mirza, sen okumuş adamsın, böyle şeyler söyleme. Ne mecburiyeti? Sağ salımsın ve ayda 7,5 dinar alıyorsun. Allah'a şükret.

Pirinç geldi. Hacı, Mirza Salih'e seslenip öne doğru yaklaştı.

- İşte, Allah'ın bize farz koştığı fitremiz olan bu pirinci sana veriyorum.

Mirza Salih:

- Ben de kabul ettim ve sana borç verdim.

Pirinç yedi sefer Hacı, karısı, üç oğlu ve iki kızı için Hacı ile Mirza Salih'in elleri arasında gitti geldi.

Hacı istiyordu ki cemaate yetişsin, ayağa kalkıp:

- İnsan fitresini fazla fazla verirse daha makbule geçer. Mirza Salih'e de gitmesi zarar değildir. Her birimiz için çeyrek dinar fazladan vereceğim ki bu da toplamda iki dinardan çeyrek dinar eksik eder.

Hacı cemaate gitmek üzere çıktı. Mirza Salih de çıkmaya yeltendi ki Hacı'nın karısı kalmasında ısrar etti ve kendisine bir çay doldurdu. Hacı'nın karısı, Mirza Salih'e karısı ve çocukları hakkında sorular sorarken o da şaşkınlık içinde cevap veriyordu. Kafası fitre parasına takılıp kalmıştı; nasıl değerlendirseydi acaba, bayram için mi kullansaydı yoksa karısı ve çocukları için bayramlık mı alsaydı? Çayını içti ve çıkmak için müsaade istedi.

Şafak sökerken, çarşı esnafının yaptığı gibi, kepenklerini açtı. Ortalığı süpürdü, öteberiyi hazırlayıp oturdu. Kısa bir süre sonra da Hacı Ali görünmeye başladı.

Hacı:

- Mirza, henüz vakit erkenken ve kimse gelmemişken, kalem kâğıt getir de hesabımızı yapalım.

Mirza:

- Ne hesabı?

Nasıl ne hesabı? Bende iki dinar kadar paran duruyor.

İyi de bunun için hesaba gerek var mı?

- Sanki çarşıya yeni gelmişsin gibi konuşuyorsun. Nasıl hesaba gerek yok? Her şey için hesap gereklidir. Kardeş kardeşir çarşı da burası.
- İyi öyleyse, hadi buyur. Al sana kalem al sana kâğıt.
- Yaz. İki dinar eksi bir çeyrek.
- A ha yazdım.
- Peki, benim sende ne kadar param var?
- Vallahi bilmiyorum. Bende hiç paran olduğunu hatırlamıyorum.
- Sen hatırlamıyorsun ama ben hatırlıyorum. Bir kış günüydü, ayakkabın delikti ve dükkânı kirletiyordu, ben de sana bir çift ayakkabı vermiştim. Merak etme senin için bir dinara sayacağım. Yaz.

- Neden, sanki sen kaç almıştın ki? Öyle ikinci el bir ayakkabıyı bana bir dinara sayıyorsun?
- Kardeşim sen esnaf adamsın. Ne kadara alındığından bahsetmiyoruz, bugünkü değerini hesaplıyoruz. Ne eskisi? Sadece bir kış kullanmıştım o ayakkabıyı. Daha yepyenydi.
- Neyse öyle olsun. A ha bir dinar yazıyorum.
- Geçenlerde Pencevinli³⁸ Hacı Fetullah bizden bir sandık çay almıştı, numunelik çaydan bir çeyrek kadar dökmüştün. O da 300 fils³⁹ eder.
- Numune çayı toplayıp sandığa boşaltmıştım.
- Ne toplaması? Sadece birazını topladın, gerisi taşta toprağa karıştı gitti. Ama neyse hadi 200 fils olsun.
- O da öyle olsun. Etti bir dinar 200 fils.
- Bir de iki sandıktan tahta götürmüştün, sandalye yapmak için. Onlar da her biri yarım dinardan eder bir dinar.
- Sen bugünkü ederleri üzerinden hesap yapıyorsun. Şuan sandıklarının tahtaları kaç para eder?
- O dönemde kıştı, daha da fazla ediyordu. Ama neyse bugünkü değeriyle hesaplayalım o da 800 fils eder. İşte sana oldu tam iki dinar.
- Tamam, öyle olsun.
- Senin de bir dinar 750 fils paran var bende fitrenin karşılığı olarak. Onu iki dinardan çıkar, o zaman çeyrek dinar bana borçlu oluyorsun. O da bu bayramda sana bayramlık olsun. Hesabımız tamamdır.

Mirza yarı alaylı:

- Peki, neden o çeyrek dinarı da gelecek senenin fitresi için ayırmıyorsun?

³⁸ Irak Kürdistanı'nda, Süleymaniye vilayetine bağlı bir yerleşim merkezi. ç.n.

³⁹ 1000 fils bir dinara denk gelmektedir. ç.n.

Hacı:

– Gelecek senin hesabını o zaman yapacağız. Hem seni nasıl bu bayramda harçlıksız, eli boş gönderebilirim çarşıdan!

www.arsivakurdi.org

nedinivîsî penûsê ji xeynî mirinê

û vegirtî bû her behostê biharê
 ku ji wan çaxan re şaristanî digotin
 hemdemi bû navê çaxê
 lê berçavkên rengê reng bûn ber çavan
 rex behrê bûn hucre
 mirovek di hucreyekê de
 ango zimanek
 cihaneke cuda
 bedelê bûna "ê din"
 tenê deng ji qaqlîbazan dihat
 digiriyan
 malum e, ji sorê hez nakin
 nabihîsin qîrînê yên ku dibînin

herî reş
 ango herî xweş
 herî bêguneh
 ango wextê herî germ de hate kuştin kurê wê
 di rojên serhildanê de
 hêvî li dil
 bo biharên dahatu
 demên din
 hêvî;
 ew bendêmayîna kespênezan

lê hewa ne xweş bû
û zîrepoşan dipelixand
zarokên bi cemedanî
di nîveka dilên wan de
û çavê cîhanê kor bûn

Şerîf Derînce

www.arsivakurdi.org

TEWTEM

Kirdim be mang ke dilim xoş bû şikandim
 Kirdim be dirext ke hetaw hat helimpaçî
 Peristgayêkim le gunah bo helnayewe
 Baxêkî le nûrim bo wêran kird
 Xwênim kirde perdaxê le spî spêde
 Çepkê reşebam xiste naw sefa
 Le her parçêê rohêk balî girt
 Le her gelaê melê helfirî
 Le niwêjêkî em peristgaye rikatêk werî
 Le her tîşkêkî em nûre ciwane momêk dagîrsa
 Le her dilopê lem xwêne sûre gulêk geşawe
 Le her tewijmê lem reşebaye pirûşeê girya

Parçekanî mangî şikawim ko kirdewe
 Dirextekem çandewe
 Peristgakem pak kirdewe
 Baxî nûrim aw dayewe
 Reşebam nardewe şwênî xoy

Ne mang bowe mangî caran
 Ne dirextîş liqûpoçî da
 Ne peristga xawên bowe
 Ne baxî nûr geş helgera
 Ne reşebaş gerayewe
 Ewey min kirdim tewtem bû
 Ke tewtemîş wîrd û xaş bû
 Çemkî caranî namênê..

Kerîm Deştî

TOTEM

Ay yaptım, kırdım mutlu olduğumda
 Ağaç yaptım, budadım güneş ışık saçınca
 Günahtan bir tapınağı kirlettim uğruna
 Işıklı bir bağı uğruna viran ettim
 Kanı tan ağartısından bir bardağa koydum
 Bir demet karayel koydum sefanın içine
 Her parçasından bir ruh kanatlandı

Her yapraktan bir kuş havalandı
Bir rekat döküldü bu tapınağın bir namazından
Her ışınından bu güzel ışığın bir mum yandı
Her damlasından bu al kanın kırmızı bir gül açtı
Her esişinden bu karayelin ince ince yağan kar
ağladı

Kırık ayın parçalarını topladım
Ağacı diktim
Tapınağı temizledim
Işıklı bağı suladım
Karayeli yerine yolladım
Ne ay eski ay oldu
Ne de ağaç dal budak saldı
Ne tapınak temizlendi
Ne ışıklı bağ ışık saçtı
Ne de karayel geri döndü
Benim yaptığım totemdi
Totem de tuz buz olunca
Yitiriyor eski anlamını..

Kerim Deşti

Kürtçe'den çeviren: Osman
Mehmed-Mazlum Dođan

www.arsivakurdi.org

DILÊ ÇÎROK-BÊJ

Edgar Allan Poe

*Wergera ji
Îngilîzî: Ergîn
Opengîn*

Edgar Allan Poe`yê ku pitir bi helbest û kurteçîrokên xwe tê nasîn di 1809an de li Bostonê, li Amerîkayê, hatiye dinyayê û di 1849an de koça dawî kiriye. Di warê kurteçîrokê de yek ji girîngtirîn kesan e li seranserê cîhanê. Çîroka dedektîfî afirandiye û di çîrokê de heyecana psîkolojîk gihandiye asteke herî bilind. Ligel vê, bi rexneyên xwe jî dîsa tesîreke zor kiriye li ser edebiyatê bi giştî.

RAST E! — BI HÊRS— gelek, gelek zêde bi hêrs bûm û bi hêrs im; lê çima hûn dê bibêjin ku ez dîn im? Nexweşiyê hişên min tîj kiribûn -ne herifandibûn- kor nekiribûn. Ya ji hemiyan muhîmtir, hişê bihîstina tîj bû. Min hemî tiştên li erd û esmanan bihîstin. Gelek tiştên li cehnemê bihîstin. Çawa, wêca, gelo ez dîn im? Guh bidê! û bibîne ka ez çend bi rehetî—çend bi aramî tevahiya çîrokê ji te re dibêjim.

Ez jî hîç nizamim ka yekem car ew fikr çawa çû di serê min de; lê piştî ku fikr kete serê min, şev û roj hate sera min. Mal? Ne ew bû armanc. Ku tu bêjî hewes, ew jî nebû. Min hez ji pîremêrî dikir. Tu carî neheqî li min nekiribû. Min tu xerabî ji wî nedîtibûn. Çavê min hîç li zêrên wî nebû. Bi min, çavê wî bû! belê, çavê wî bû! Çavekî wî şibê yê bazekî bû -çavekî şînsivik, bi perdeyeke zirav li serê. Çi gava ku ew çav bi ser min diket, xwîna min dicemidî, û lewre roj bi roj -gelek hêdî- min qîrar da ku rihê pîremêrî lê çik bikim, û bi vî awayî heta hetayê xwe ji wî çavî xelas bikim.

Niha hûn hizr dîkin ku ez dîn im. Dîn çî tiştî nizanin. Lê diviya ku we ez bidîtama. Diviya we bidîta ka ez çend bi şarezayî

pêş ve diçûm –çi bi hişyarî- çi bi rastbînî- çawa dizî ve çûme kar!
 Ez tu caran bo pîremêrî, ji tevahiya wê hefteya berî ku wî bikujim,
 baştir nebibûm. Û her şev, dora nivê şevê, min feraşa (kilîd) deriyê
 wî badida û vedikir- erêê, gelek nazikî! Û paşî, wextê ku min
 navbereke têra serê xwe çêdikir, min fenereke tarî bi cî dikir, giş
 vemirî, vemirî, ku tu ronahî jê nediweşî, û paşî min dehf dida serê
 xwe. Wehh, hûn dê bikeniyana heke we bidîta ka min bi çi fêlbazî
 serê xwe dirêj dikire hundir! Min serê xwe hêdî hêdî dilivand-
 hêdî, gelek hêdî, wesa ku min ê xewa pîremêrî têknedaya. Saeteke
 min çû heta ku min tevahiya serê xwe li navberê bi cî kir da wî di
 nav nivînan de dirêjkirî bibînim. Haa!— tu bêjî ku dînek dê ewqas
 zana bibaya? Û paşî, wextê ku serê min bi tevahî nav odayê de bû,
 min bi hişyarî fener pêkir, -oo, gelek bi hişyarî— bi hişyarî (ji ber
 ku qirçên ji menteşeyan hat)— Min fener tenê ewqas vekir ku
 hebek tîrê zirav kete ser çavê bazî. Û ev kar, min heft şevên dirêj
 dubare kir— her şev dora nivê şevê— lê min her gav çavekî girtî
 didît; lewre mumkûn nebû karî pêk bînim; çinku ne pîrêmer bû
 tiştê ku ez şepirze dikirim, Çavê wî yê Şeytanî bû. Û her sibeh,
 dema ku roj dihilat, ez bi wêrekî diçûme odeya wî û bi rihetî pê re
 diaxiftim, min bi dengêkî jidil bi navê wî hîtap lê dikir, û dipirsî ka
 şeva wî çawa borîbû. Va ye hûn dibînin, bi rastî diviya ku ew
 pîremêrekî pir hişyar bûya, da guman bikira ku her şevê, tam di
 danzdehan de, wextê ku ew dinivist min çavên xwe li wî dikutan.

Şeva heştê, êdî ji rojên normal pitir hişyar bûm gava ku
 min derî vedikir. Xulikjimêra saetê bileztir hereket dikir ji destê
 min. Berî wê şevê min tu carî hest bi gewretiya qudreta xwe,
 jîrîtiya xwe nekiribû. Min gelek kêman caran hay ji hîsên xwe yên
 serkeftinê dibû. Fikra ku li wê derê ez, derî vedike, misqal bi
 misqal, û ew kirin an fikrên min ên razber bi xwe jî di xewnê de
 nebîne. Li pêş wê fikrê qît qît keniyam; û belkî wî ez bihîstim;
 çinku wek ku bizdiyabe, niwirdî hatinê di nav nivînan de û liviya.
 Niha hûnê bifikirin ku ez vekîşiyam—lê na. Odeya wî, bi tariya
 qasî qîrê reş bû (ji ber tîrsa dizan, derwazeyên wî gelek qahîm girtî
 bûn), lewma min dizanî ku wî nedikarî vebûna derî bibîne, û min
 hêdî hêdî derî pal da.

Serê min di hundir de bû, û da fenerê pêkim ku paniya min li ser zemînê teneke xuşiya, û pîremêr ji nav nivînan peşî, bi qêrîn—“Kî ye li wê derê?”

Ez bêliv mam û min tişteke negot. Saeteke tevaw min masuleyek jî nelivand, û di heman demê de min nebihîst ku wî xwe dirêj kir. Hêj li nav nivînan rûdinişt û guhê xwe bel dikir; - tam wek ku min kiribû, şev li dû şevê, guhdana li saetên mirinê yên li dîwêr.

Bu öykü Helîm Yûsiv'in *Mêrê Avis* (Hamile Adam) adlı kitabından alınmıştır (Avesta Yayınları, 1997). Helîm Yûsiv 1967'de Amûdê'de (Başûrê Biçûk, Suriye) doğmuştur. Kürtçe ve Arapça dillerinde yazdığı romanları var. Helîm Yûsiv'un *Mîrî Ranazin* adlı romanı Türkçeye (Ölümler Uyumaz) çevrilmiş olup, yazar halen hayatını Amûdê'de sürdürmektedir.

Teşekkürler bu kıskançlığa

O olmasaydı

Sevda bu kadar

Parmaklarımı kemirmezdi

Zînê Memo'nun mezarının üzerine eğilmişti. Onu kucaklıyordu ve kendini mezarın toprağına sürüyordu. İnsanlar ona doğru gitti, onu kaldırmak istiyorlardı. Ama Zîn donmuş bir beden gibi kala kalmıştı. Mîr Zeyneddîn kız kardeşinin donmuş bedeni üzerine yığılmış, feleğe yakarıyordu kara fermanından dönmek için. Kızın cesedini, vasiyet ettiği

gibi uğurladılar. Mem'in mezarını açtılar. İki acı dolu gözle, mir kız kardeşini kaldırdı, onu mezara indirdi ve Mem'in yanına uzattı. İçinde çığlıklar kopuyordu: "Senin olacak Memo, hayatayken onu senden uzak tuttuğumuz yârin, başıyla beni, dünyada sana çok zorluk çektirdiğim için." Beko Ewan, o da, onların kenarında gömülmüştü. Mem ile Zîn'in mezarı ağaç ve gülerden bir surla çevrilmişti ancak Beko'nun kabri pörtlek dikenlerle örtülmüştü.

Mem ile Zîn

Ve birkaç ay önce

Bir olay oldu

Hiç kimsenin dikkatini çekmeden

Ağır bir rüya Memo'yu uzun ölümünden uyandırdı. Memo elini salıyordu, kabrin içinde, Zîn'i arıyordu. Eli sert bir duvara çarpıyordu. Bir anda döndü:

— Hani Zîn nereye gitmiş, kim onu kaçırmış? Beko mu, hayır, Mîr Zeyneddîn mi hayır, öyleyse kim yaptı?

Memo afallamış bir şekilde yeryüzüne çıktı. Etrafına baktı, her şey tuhaftı; mezarının etrafındaki ağaçların viran oluşu, mezarın üzerindeki dikenlerin çoğalması. Mezarının kalesi üzerine yazılı ismi toz ve sineklerden, oradan hızla geçen kimselerin sidiği altında kaybolmuştu ve Beko'nun mezarı bütün ihtişamıyla duruyordu. Mezarı bir gül bahçesinin kalbindeydi ve kalenin üzerinde altın harflerle ismi Beko Ewan yazılmıştı. Gözyaşlarını sakladı, ağır bir sızı göğsünü kaplamıştı. Kısa bir zaman sonra anladı ki yüzlerce sene geçmişti ölümünden... Üstündeki bu süslü giysiyi değiştirmesi gerekiyordu ki hiç kimsenin dikkatini çekmesin. Ve her nasıl olursa olsun Zîn'i görmesi gerekiyordu. Sırtını mezarlığa dayamıştı ve geçmiş olaylar aklında bir birine karışıyordu, sanki bu olay daha dün yaşanmıştı. Tacdîn, dost ve

değerli arkadaşı, onun karısı Stî, Zîn'in ablası. Acep ne oldu bunlara? Her iki kardeşi Arif ve Çeko, ne çok özlemişti onları? Ama... Acep burası Cizîra Botan⁴⁷ mı? Hani Dijle nehri? Newroz bayramında, o taşın kenarında, o ve arkadaşı Tacdîn'in akılları başlarından gitmişti. Her biri bir cariye'nin giysilerini giymişti. Stî ve Zîn de her biri bir uşağın giysilerini giyinmişlerdi. Zînê üzerinde kendi ismi yazılı yüzüğü Memo'nunki ile değiştirmişti. Stî ve Tacdîn de aynısını yaptılar. Bu o taş, tabii, ama hani büyük Dijle? Memo, bir zamanlar bu suyun kenarında, özellikle de Tacdîn ve Stî'nin evliliğinden sonra, aşkının sızısını derinden hissetmişti. Memo kalbi yaralı bir şekilde yürüyordu, bir adama rastlamıştı ve ona sordu:

—Acep buradan Dijle geçiyor muydu amca?

Adam her iki gözüne bakıyordu:

—Sanki bu diyardan değilsin?

—Evet, ben bu diyardan değilim. Ben yabancıyım.

Bu söz (yabancıyım) adeta bir bıçak gibi saplanmıştı ciğerine, adam ağzını yaklaştırdı Mem'in kulağına:

—Onu içtiler oğul!

—Kim içti? Ne diyorsun?

—Şaka yapmıyorum. Bunlar onu içti.

Ve parmağını başları kapalı insanlara doğru doğrulttu. İnsanlara benzemeyen varlıklardı bunlar. Memo onlara doğru yöneldi. Onlardan birisine sordu:

—Burası Cizîra Botan değil mi?

Yamuk gözlü ve başı örtülü bir adam ona bakıyordu. Memo anladı ki dilini bilmiyor ve sorusunu tekrarladı. Yabancı bir dille cevabını verdi adam. Sırtını çevirdi ve yürüdü, düşünüyordu,

⁴⁷ Cizîra Botan: Günümüzdeki Cizre şehrinin merkez olduğu geniş bir bölge. Bu bölge Mardin, Batman ve Hakkâri illerinin belli bir kısmını da içine almaktadır. Kürtler bu geniş coğrafik bölge için "Botan" ismini kullanırlar. Ve yine Kürtler için önemli bir politik bölge konumundadır. (ç.n.)

demek oluyor ki bir sürü karışıklık ve sorun var. Yabancılar, nehirleri tamamen içebilecek yeni insanlar, çöl, güçlü kimseler, bomboş bir gökyüzü. Derin bir sessizlikle Memo, bir ömür korku ve sorularla sarılmış meydana ağır ağır gelir ve sorar:

—Mîr Zeyneddîn, Cizîra Botan miri?

Cevap da kalbe saplanmış bir hançer gibiydi:

—Böyle bir isimde kimseyi tanımıyoruz.

Birkaç gün sonra Memo kendini insan kalabalığının arasına atmıştı. Bir şalvar ve gömlek giymişti. Bir ev kiralamıştı. Ev sahibi iyi kalpli bir yaşlı amcaydı. Yaşlı amcaya her aybaşı, kirayı vereceğini söz vermişti. Memo, delirmiş gibi Mîr Zeyneddîn'in kalesinin olduğu yere doğru yönelmişti. Mir ve adamları avdan döndüğünde, Zîn'i kendi giysisinin altında sakladığı ormanı aradı Memo. Tacdîn evini yakmıştı, Mem ve Zîn o harap halden kurtulsun diye. O gününün gürültü patırtısını hatırlamıştı. Bugün de kimsesiz bir harabenin önünde duruyordu. Yıkık bir duvara doğru koştu. Tırnaklarını duvara sapladı, açlıktan inleyen bir köpek yavrusunun önünde. Alnını toprağa koymuş ağlıyordu. Sert bir dokunuş sırtına saplandı, döndü, bir askerin silahının namlusu alnındaydı, asker bağırmaya başladı. Memo anlamamıştı ne dediğini fakat el ve ayak hareketlerinden büyük bir tehlikenin varlığını sezinlemişti. Memo geri döndü. Viran olmuş mirin kalesinin yanında bir bina vardı. Üzerindeki yazıyı okumak istedi, yapamadı. Kuşku dolu gözlerle bayrağa bakıyordu. Binanın üstünde büyük bir bayrak dalgalanıyordu ve her yere yayılmış resimler vardı. İyice resimlere baktı. Dona kaldı şunu fark edince: Bu resimlerin hepsi Beko Ewan'ındı -Mîr Zeyneddîn'in uşağı, acımasız, fesat, vicdansız olan, Mem'in mirin damadı olmasına mani olan kişi, fesatlık ve ara bozuculukta akıl almaz planların sahibi, iki yüreği birbirinden uzak tutmak için her şeyi yapmaya hazır olan kişi. Satranç oyununu hatırlamıştı Memo. O gün Beko, Memo'nun gözleri Zînê'nın gözlerine değsin ki akli başından gitsin, arka arkaya beş kez oyunu kaybetsin ve sonunda iki eli kelepçeli ve kalbi kırık onu hapse götürsünler diye mirin yerine değiştirmesini akıl etmişti. Beko zaferle gülüyordu, ha... ha. Tüm

bunları düşünürken, Memo'yla bir kadın çarpıştılar, kadın onu küfürlerle boğdu. Memo, kendisini seven ve güzel delikanlının hayatında derin bir giz olduğunu bilen iyi kalpli yaşlı amcanın yanına geri döndü. Bu delikanlı dağılmış bir vaziyete ve dertli duruyordu. Çok az sefer söylediklerini tamamlayabiliyordu. Günlerce sessiz kalıyordu. Gizlice ağlıyordu. Bir kadına seslenerek: "Seni benden uzak tutular... mezarda bile" diyordu. Sonradan yaşlı amca anlıyor ki bu evinde kalan genç Memê Alan'dır, başkası değil. Onu her gördüğünde sarılıp öpüyordu. Ama kalbindekini de saklıyordu:

—Söyle bana oğul... Baban sayılırım.

Memo yüreğindeki volkanları saklamak için, sessizce cevap veriyordu. Yaşlı amca devam ediyordu:

—İki oğlum ve karım vardı oğul... Eğer ölürsem bu evim senin olsun Memo, sen...

- ...

Memo'nun keyfi yerine geldi, gülesi geldi. Yaşlı amca da, kendisi gibi cümleleri bitiremiyordu.

—Karım sizlere ömür, oğlum Şêxo uzun zamandır hapiste ve diğer oğlum Azad dağda Cizîra Botan'ın özgürlüğü için savaşıyor.

Ey yerin ve göğün Yaradan'ı

Bu nasıl yaşlıdır?

Memo bir anda kendine şunu soruyordu:

—Zîn çok sevinecek...çok...

Yaşlı amcanın dona kaldığını gördü. Memo, cümlesini bitirmeden sustu. Oturuşunu düzeltti. Yaşlı amca'yı daha çok dinlemek istedi. Yüzlerce yıl öncesine götürdü, Memo'yu. Yaşlı amca durmadan konuşuyordu:

— ...Ve Cizîra Botan. Adeta solucanlar kalbini kemiriyorlar ve çürütüyorlar. Görüyorsun suyunu içtiler. Onu kurutular ve çürümüş bir paça gibi atılar unutulmuş bir köşeye. Çok ama çok şey gitti elimizden. Aramızdaki iyiliğin bedeli, akılsızlık ve

düşmanlık iyice ağırlaştı. Ewanîler⁴⁸ her yerdeler ve eğer onlardansan kâfidir, her şey senindir. Mevki ve para, kadın ve güzellik ve her şey. Şan ve namus fazlasıyla ucuzlamış, saman daha pahalı olmuş. Ataları Beko'nun kabrini altınla süslediler ve Mem ile Zîn'in kabri ise fare ve solucanların diyarı olmuş. Zîn'i kabrinden çıkarıp, goturdular. Tanrı bilir, ona ne yaptıklarını oğul, o yüksek binalarda. Bilesin ki eğer onlardan birisi bu dediklerimi duyarsa, beni sağ koymazlar yarına kadar. Ewanî. Ewanîler, yarasalar gibi evimizin her tarafındalar, her köşede, abdesthanede, uykuda, dükkânla sokaklarda ve çarşılarda, meydanlarda, yastıkların altında, Cizîr'i fare ve köstebeklerin diyarı yapmışlar, köstebek, köstebeklik ve kötülük, kötülük Cizîra Botan'ın başını sarmış gidiyor.

Yaşlı amcanın yüzündeki kırışıklıklar gittikçe derinleşiyordu:

—Geldiğin günden bu yana, yirmi kereden fazla beni gözaltına alıp sonra da bırakıyorlar. Hayatın tehlikede oğul, haberin olsun. İyi birisin ama iyiliğin burada yeri yok. Umarım ki Yaradan seni onlardan korur. Yaşlı amca titriyordu. Memo elini tuttu. Onunla teselli oluyordu. Odasına doğru yöneldi, seraplar deryasına dalmıştı. Mir, asker, uşak, cariyeye, ewanî, tavuk, tavukların silahlı güçleri, tavukların yetiştirilmesi, resim, yabancı yazılar, ezik halklar sürüleri, silah, yabancı, at ve...

Zîn'in Memo... Zîn?...

Sanki hiç aklına gelmiyor artık. Hayır, Zîn hayatımdı ve hayatım olarak kalacak, ama ... lazım.

Korkuyla yataktan kalktı. Pencereden insanlara bakıyordu. Konuşmaları bitmek tükenmek bilmiyordu. Sanki hiçbir şey yok. Bu nasıl bir beladır? Birisine bakıyordu. Sokağın ortasında dinleniyordu. Diz üstü çükmüş, eğik bir şekilde ve yüksek bir sesle soruyordu kendine:

Ey Yaradan

niye

⁴⁸ Ewanî: Beko Ewan'nın fikirlerini savunan kimse. (ç.n.)

bu diz çökmüş,
ben diz çökmem

der.

Memo yaşlı amcanın yanına geldi.

Yerinde yoktu. Memo dona kaldı, gitti komşusuna sordu, cevabı aynen şuydu:

—Belli ki uykun ağır. Ewanîler onu götürdüler...

Memo birçok acı gerçeğe yüz yüze kaldığını anladı. Ne zaman ki, Ewanî birini gözaltına alırsa, herkesin gözü önünde onu götürürler ve artık... Bir kaç saat insanlar onun ismini telaffuz eder ve sonra arkasından:

—Gitti gitti, bahtsız adam.

Ve bir zamanlar birlikte yaşadıkları bu ismi unuturlar. Bazıları da alay eder onunla. Kim ki Ewanîlere karşı çalışır ya da bir Ewanîye düşmanlık ederse, sonu ölüm ya da kaybolmak oluyordu -hangi baba yiğit ki onu arasın sorsun. Ne yani, durum bu muydu? Memo başını yaşlı amcanın yastığına gömdü. O yaşlı bir adamdı, ey halk. Yaşlıydı ey taşlar, tahtalar. Zîn'e sevdası yüzünden hapse atıldığı zamanı hatırladı. Tacdîn, Arif ve Çeko, halkın hepsi haykırıyordu. Nerde o halk? Evet. Güzel bir şey bırakmamışlar ki insan Cizîr'e bağlansın, birçok insan onu bırakıp gitmiş. Birçoğu korku ve ödlelikten Cizîr'i Ewanîlere bıraktılar ki kimse niye diye soramasın, üstüne işediklerinde. Sen tek başına kalmış bir Cizîr değilsin ey Botan, sen yaşayan bir ülkesin, ama çukur ve çöl, toz ve korku, kuraklık ve köstebeklikle dolmuş. Ne bir arkadaş kalmış Tacdîn gibi, ne de herhangi bir haber geliyor Zîn'den. Zîn'im, yüreğim, acep bu güçlüler ne yapıyorlar sana bu kapalı kapılar arkasında?

Çalışmaktan başka bir yol gözükmüyordu önünde ve kötü bir fikir sarmıştı başını; yaşlı amcanın evini satmak. İş bulmak için çıktı,

kendini sigara arıyor bir halde buldu. Arkadaşlarından borç aldı. Tacdîn hiçbir şey sormuyor. Arif ve Çeko gece gündüz içmekle meşguller. Kendinden nefret etmeye başlamıştı Memo. Büzüşmüş rüyalarında düşünüyordu. Bir parça ekmek hayal olmuştu. En zor ve en ucuz işleri bile aradı, bulamadı, yollar kapanmıştı. Kendini bir meyhanede oturmuş içerken buldu, arkadaşları da bugün cömert görünüyorlardı. O da arkadaşlarına yürekten teşekkürlerini sunuyordu, halen dostların olduğuna inanmıştı:

—Hala dünyada iyilik var. Öyle değil mi Tacdîn?

Gülerek cevap veriyordu:

—Tabii Memo tabii.

Arif cevap veriyordu:

—Savaşın ve kötülüğün yeri sadece aptalların kafasında kalmış.

Çeko şakayla devam ediyordu:

—Güç, iyilik ve hak, güzellik ve domates ve çürük kozalakdır.

Yeni arkadaşları Elîkê Betê. Ona “Güvercin hırsızı” lakabını takmışlardı. Bu ismi esprili bir şekilde ona takmışlardı, çünkü bu isim yiğitliğin emsaliydi:

—Konuşmuyorum, bırakın da düşüneyim.

Gülüyordu. Memo iğneleyici bir şekilde:

—Bırakın onu, akli güvercinlerde kalsın.

Ve gülüyorlardı.

Memo acılarını onların önüne seriyordu. Onlar da, gerçek dost gibi Memo'nun etrafını sarmıştı. Yarasını, sevdiğini, Zîn'i deşiyorlardı -son demlerini Memo'nun vücudunda bırakmıştı.

Zehir olmuştu. Yüzü sararmıştı. Artık, canı ne yemek ne sigara istiyordu ne de evde oturmak istiyordu. Eskiden Zîn'i görmek zordu. Ama bilindik bir yerdeydi. Ewanîlerin hapsinde değildi. Kardeşi mirin, hapsindeydi. Fakat bugün Memo geceliyor, sokaklar boşalıyor. O ve köpek yalnız kalıyorlardı. Cizîra Botan'ın bütün köpeklerini tanımıştı. Onlarda Memo'yu tanımıştı. Köpek

yanına yaklaşıyordu. Köpek kendini Memo'ya kaşındırtmak niyetindeydi. Onu koklamasını istiyordu. Memo, sokakları karartan ve gecenin bitişinin habercileri olan işçileri görünce seviniyordu. Sigaraları topluyorlardı. Çoğu kes Zîn'i soruyordu. Cevap yerine, işçi, karısının aptallığı ve beceriksizliğinden, çocuklarını doyurmanın zorluğundan bahsediyordu –o çocuklar ki "Simirmir"⁴⁹ gibi. Gülerek diyordu:

–Önden yiyiyor arkadan atıyorlar... Ve doymak bilmiyorlar.

Memo her zaman sarhoş, kalbi kırık ve yalnız bir şekilde bomboş odasına dönüyordu. Ama bu sefer meteliksiz arkadaşları yolunu gözlüyorlardı. Memo selam verdi, selamı karşılıksız kaldı. Gözleri tilkilerinki gibi parlıyordu. Oturdu. Tacdîn söze girdi:

–Seni bekliyorduk aramızdaki sorunu çözmek için.

–Ne sorunu ya?

–Yalanların, Zîn'i sevdiğin ve kendini sevdalı Memo göstermen.

Hep beraber güldüler, duvar ve ağaçlar, komşuların kapıları ve Beko Ewan'ın kabrinin olduğu kale.

Arif'in de söyleyeceği bir şeyleri vardı:

–Yaptığın şeyler pis. Büyük bir günahkârsın. Ve hala kendini ... yapıyorsun. Ama işte ne olduğun ortada?

Çeko konuştu:

–Borcumuzu ver bize, eğer bunun için mal ve mülk satmak yetmiyorsa yüreğini de sat. Ey zamanın sonunun sevdalısı, hala yalan da söylersin. Tabii eskiden demişler ki "Yavaş akan sudan felaketler gördüm."

Bir tek "Elîkê Betê" konuşmamıştı, o da konuştu:

–Eğer Zîn'den, küçük ve güzel hanımımızdan vazgeçmezsen biz de sana göre ve başka bir yola... hallederiz.

⁴⁹ Simirmir: Çekirge yiyen bir kuş.

İçki mayasının etkisi Memo'nun başında kalmadı. Vücudunun eski bir kumaş gibi parçalandığını düşünüyordu. Dün arkadaşlıklar... Bugün hepsi hâkim ve hesap sorandılar!

Tek tek gözlerine bakıyordu. Yere bakıyordu. Tükürdü. Kandan bir halka, birbirinin aynı ayakkabılarının yanında oluştu. Koşarak çıktı. Ertesi gün akşam gördü ki Zîn, onun yolunu gözlüyor.

Zîn... tanrısal güzelliğiyle

ateş ve kardan zülüflerle

allı pullu yanaklar ve katil dudaklarla

Öyle, bir güzellikle kendini Memo'nun kollarına attı. Dona kaldı. Nefesi açıldı. Yüreğini önünde serdi. Fakat Memo her şeyi söylediğinde, Zîn dört köşe bir demir çıkardı, uzun bir şiş çekti içinden. Birkaç düğmeyle oynadı. Şakayla zırvaladı ki onurlu fermanları yerine getirilsin. Memo burada neler olup bittiğini soramadan, Ewanî ve askerler etrafını sardılar. Sesiz bir çığlık attı. Kendini kaybettikten sonra, oturulamayacak kadar dar bir odada buldu kendini. Zorlukla nefes alıp verebiliyordu. Kapıyı açtılar. Onu kapkaranlık bir yere sürdüler. Dizlerini oynattı, anladı ki ayakları yerinde. Demir anahtar ve asma kilitlerin patırtısı karanlığın gövdesini yarıyordu. Demir bir yumruk onu yüz üstü yere sermişti. Dar odayı aydınlattılar. Bir komutan masanın arkasında oturuyordu. Masa temiz bir bezle örtülüydü. Komutan örtüyü çekince demir diken, kerpeten ve sivri uçlu, insanın etini ve tırnaklarını kaldıracak aletler gözükte. Komutan bir tanesini aldı ve güzel parmaklarıyla oynamaya başladı. Memo'yu soydu. Memo soğuk bir iskemlenin üstünde oturdu. Telleri topladılar ve birbirinden söktüler. Tellerle oynuyordu. Başka bir asker su kovanını tutuyordu. Teli ucunu duvara soktu. Teli Memo'nun oyluğuna yaklaşıyordu. Bacaklarının arasına sokuyordu ve... ardı ardına yakarışlar dilsiz gökten kurbağa düşürüyordu... Bu "ölü kurbağalarla göçünden" sonra, uyandı Memo. Gördü ki asker su kovanını üstüne boşaltıyor. Hemen yani başında duruyordu:

— Bu ikinci hayatındaki son günün senin Memo.

Hüzün Memo'nun yüreğini parçalıyordu, kendisini ve askerin dışları arasındaki o sakızın aynı olduğunu düşününce.

–Tarih, Tacdîn'i büyük atamız Beko Ewan'ın öldürülmesinden dolayı yargılamamalı. Öyle ki, Tacdîn bizim tarafımıza geçtikten sonra, o ve etrafındakiler de bize katıldı. Çobanların, aptal ve açgözlülerin zamanı geçti Memo. Zaman bundan sonra ve sonsuza kadar Ewanîlerin zamanı. Bizim zamanımız. Tacdîn, Arif ve Çeko'nun dostun olduğunu mu sandın. Onlar bizim gözümüz kulağımızdı. Uğurlu mezarından çıktığın günden yarın son gününe kadar. Onların gözetiminde olacaksın.

Ertesi gün, sabahın seherinde Memo'yu askeri bir araçtan, toprak rengi olmuş bir halde indirdiler. Her tarafa yayılmış resimler ve sözlerle (Eşitlik – Özgürlük – Kardeşlik – Adalet – Paylaşım) ve süslü yazılarla (Hak geldi, haksızlık eziliyor. Kutsal Kuran), (Adaletin eli her zaman yukarda ve güçlüdür), (Günahların ipi kısadır) süslenmiş bir meydanda ve binlerce sessiz halkın önünde Zîn bütün güzelliğiyle herkesin önündeydi. Tacdîn, Arif ve Çeko etrafındaydılar. Memo darağacına ölü asılmıştı ve şişmiş dili adeta ağzından çekilmiş bir kalp gibiydi.

EVÎNÎ

Hey gîdî heyyyy!!!
 Mala li ser pişta,
 Mîna agirê li tufikê
 Êş e ji hineka re.
 Evînî dibe ba
 Û lê dixê xerîbîye,
 Geş dike,
 Disoje,
 Mehf dike.

Bêhna otobosên kevn,
 Dikeve li cila
 Û jiyana bê mala.
 Barana derve, hênîkayî ye,
 Şil dike ,
 Pak dike,
 Azad dike.

Şûna birîna evînê ne xuya ye.
 Here ji wira.
 Bifire ji qefesê laşê.
 Ciyê we ne dunya ye,
 Êka hez dike,
 Dil dide,
 Sor dibe.

Pênûso!!!
 Negrî ji min re.
 Nebê min bilekîne.
 Kaxez spî,
 Tu reş î.
 Berê sor bibe,
 Dawîyê binivîsîne,
 Binivîsîne....

Ronahî,
 Mîna gedêkî şên,
 Dikeve oda min
 Şiyar dike.
 Zû here,
 Biterike,
 Lê terî tê.

Mehmet Nergîz

Di dewra bihar a sala par de me di bin banê Komîsyona Edebiyata Kurdî de xebatên xwendinan kirin li ser 'çîroka modern a kurd'. Di wan xebatan de me kitêbên Epîlog (Hesenê Metê), Hezkiriya Xwedê (Îbrahîm Seydo Aydogan) û Kelevajî (Kamiran Haco) xwendin û nirxandin. Li vir em ligel çîrokeke yek ji wan kitêban du nirxandinên çîrokên heman kitêbê jî pêşkeşî we xwendevanan dikin.

www.arsivakurdi.org

KELEVAJÎ***Kamiran Haco**

Sira bayê sibê canê wî bi hînikayî dipêça, bi kêfxweşî li ser kursîkî rûniştibu û li ber siya dîwarê çayxanê cîyekî xwe girtibû .Lingê rastê kiribû mêvanê lingê çepê û li ser hev re anîbûn, piyê xweyî rastê bi xurtî çep û rast, xwar û banî dihejand, çixara wî di nav lêvan de bû û li vî alî,wî alî, ji xwe re li tevgera nava bazarê dinihêrt.

Zîî.....îîîq. Mîkrobasa roava li ber kenarê rê rawesta..Yeko yeko siwarên wê jê peyabûn û hatîne xwar. Evdo jî serê xwe nizim kir û hat ku bikeve, lê belê yekî nêzîk destê xwe avêtîyê, berstika Evdo kete nav lepê wî û ji ketineke bê goman ew rizgar kir. Evdo rawesta û xwe vezîland.Çakêtê xwe rast kir, li vî alî , wî alî meyzand. Hesê li ber dîwêr dît, hema yekser berê xwe dayê silav da, Hesê ji ber rabû:

-Tu bi xêr hatî Evdo...

Û di ber re kursîkî nêzîkî xwe xijiqnd, da ku Evdo rûnê.

-Xêra Xwedê li te be, rehmet li bavê te..

Evdo bi rûniştina xwe re bersiv da.

-Ha ha, rehme li bavê te, ka guhê xwe bide min da ji te re bêjim...Bi zeraqa rojê re, ez ji xew rabûm, ji nav nivînê derketim, misînê xwe dagirt av û min destlimêj girt û cilka limêjê rağist, min limêja sibê kir. Paşê rabûm min kincên xwe li xwe kirin û desmala xwe da serê xwe û nanek bi destê xwe girt û min da ser rê...

-De camêr ne gereke ku tu her tiştî bêjî...

Hesê got û pê re qotîya tûtînê da Evdo, bakirê kurikê şagirt ku çayê ji Evdo re bânî...

-De ka bîna xwe fireh ke, ez ji te re bêjim...

Evdo got û bi destê rastê gotî girt ,bi destê di derbeka hêdî li teniştê qotîyê xist, guhezte destê dî û li alîyê di jî xist...Qotî vekir û gotina xwe berdewam kir...

-Ez bi rê ketim, rohilat û germa rojê xwe hêdî hêdî berda, sira sibê hinekî şikand, ez gihame werzê xwe, min berê xwe da nav wêrê û li nav pinan gerîyam ta ko min zebeşekî emêrîkanî dît ...

-Çavên, te gelekî dirêj kir, bes e.

Hesê vê carê bi bîntengî got...evdo jî destpêkiriye.Çixara xwe dipêçe, bi lêva xwe pela çixarê şilkir û bi tilîyên xwe cîyê şilkirî jê kir û tûtin berda nav pel û axaftina xwe domand...

-Min kêra xwe ji ber xwe derxist û zebeşê xwe kire qetîtk, zebeşekî sor û şêrîn û hînik, min bi nanê xwe xwar,dîsa min da ser rê, da ko bigihime ser riya qîrê...

-Xwedê jê razî, me got xêr e tu zû hatî, me ne got li ser jîyana xwe biaxive...

-Sebrê bide camêr, tu çiqas bînteng î...Ez giham ne giham miqrobas li ber min rawesta, berdestik berî ku ba raweste bi tinazî xwe jê avêt da ku rê bide min ez siwarbim bas ne gelekî tijî bû , çavên min li xiçk ket, wî jî bi dengê bilind bakire min da ku li rex rûnim, silavek min

Li xiçk kir, me li rewş û halê hevda pirsî, tu nabê rebeno xwestine dadgehê ji ber qaçaxîke kevin...

-Em wilo ne, ji xwe re diaxivin, me dît ko bas li deverekê rawesta û Xelîlê Ehmed siwarbû, me bakiryê, hate rex me, me li hal û demên hev pirsî...berê wî jî li bajêr bû...Hesê bi dengê bilind û bi bînce teng qîriya...

-Mala te çû mîratê, ma ez şaşbûm min pîrsek ji te kir, ma çawa çêbû...hey hawar?

Evdo bi xwîneke sar lê vegerand:

-Çiqasî bîna te teng e maxabo, de xwe bigire da ji te re timama kim...berê Xelîlê Ehmed li bajêr e,hûre-mûr ji malê re gerkin...basa me li gelek cîyan rawesta, hin peya bûn, hinek siwar bûn...ji nişka ve...

Hesê nema xwe girt:

-Hey xwedê rihê te bistîne û mala te biviritîne,malxirabo bese,ma ez kufirîm ku me pirsek ji te kir û me got xêre tu zû hafî...Wey sed carê ne xêr be...

Û bi tundî rabû ser xwe û bi lez meşî...Lê Evdo bi xwîna xweyî sar ji ser kursiyê xwe nerabû, hêjî dixwest çîroka xwe dewam bike.

Têbînî: Ev çîrok ji kitêba bi navê *Kelevajî* hatiye wergirtin. (Weşanên Avesta, 2004)

www.arsivakurdi.org

KELEVAJÎ

Ergîn Opengîn

Ev çîrok, ku navê xwe daye kitêbê, bi nezera min du profilên ji hev biyanûyî raberî xwendevanan dike. A yekem profila mirovê gundî ye ku nivîskar bi qehremanê çîrokê Ewdo re pêşkeş dike; a duyem jî mirovê bajarî ye ku bi Hesêyê bêsebr nimandiyê. Ji bo ku ev her du profilên lêkdûr di hişê xwendevên de şikl û qalibên xwe yê xweser û mexsûs bigirin, hal û hereketên wan gelekî bi hostetî hatine teswîrkirin.

Em ji tehlîla bajariyê bêsebr dest pê bikin û pê re biçin: Wekî taybetiyeke edetên navlêkirinên civaka kurdan, nav qewî (ewqas) bi şeweyên xwe yê eslî nayên bilêvkin. Ev fenomena navxirabkirinê tişteke qedîmî ye û balkêş e ku tu kesekê pê ecêb nîn e. Herçend mirov bikare gelek terz û formên vê xerabkirinê lê rêz bike jî du formên sereke tavilê xwe ji nav wan didin der. A yekem, piştî kurtkirina navî 'o' lê tê zêdekirin ku bi vî awayî navên mîna 'Miho', 'Saqo', 'Pişo', 'Heso' çêdibin; a duyem jî, piştî kurtkirina navî vê carê 'ê' lê tê zêdekirin ku bi vî awayî jî navên mîna 'Mihê', 'Saqê', 'Hesê' çêdibin.

Herçend em nekarin her yek ji wan du şeweyên navxirabkirinê rasterast wekî aîde sinifekê, an jî civakeke wekî bajarî an jî gundî nîşan bidin jî, bi nezera min em dikarin elaqeyeke bi vî rengî di navbera forma nazik û kubartir 'ê' û bajarîbûnê; û herwiha di navbera a qebetir 'o' û gundiyatîyê de bibînin. Balkêş e gelek navan her du formên xwe jî hene mîna 'Miho' û 'Mihê', û 'Heso' û 'Hesê'. Îcar ev du form bi çî rêzik û qanûnekê li xwedanên navan belav dibin? Heke em hindekî binhişê xwe têk bidin, heta bi tiliya eşedê hindekî têk werdin emê bibînin ku mesele tê û di xwedanê navî de bi dawî dibe. Li vir ez nixandinên kûrtir ji xwendevên re dihêlim û bêtir ku zêdetir ji çîrokê dûr bikevim pêwendiya çavdêriyên xwe û çîrokê rave bikim.

Navê Hesê bi forma navxerabkirina bajarvanî hatiye çêkirin û yê Ewdo bi ya gundiya tiyê. Anku nivîskar, ji navên lehengên xwe dest bi xêzkirina ew xeta ciyawazî û biyanîbûna di navbera wan her du layan de dike û em binêrin çawa dewamê lê diîne.

Çîrok bi dîmena Hesê dest pê dike ku li bazarê temaşe dike. Hesê rûniştî ye, lê em ji liv û bizavên wî yên ne-aram tê digihin ku hindekî nerihet e. Hetta heke hindekî binkol bikin em dikarin dijayetiyekê di navbera teswîra mekanî û hereketên wî de saz bikin; ji ber ku hem li ber taldeya siya dîwarê qehwexanê rûniştî ye û hem jî wekî ku dil û mêjiyê wî xwe bi aramiya cî hay nadin û didin dû ya xwe pêyê xwe yê rastê li ser lingê çepê re bi xurtî çep û rast xar û banî dihejîne; herwiha ser jî lê sabît nîn e, berê xwe her diguherîne. Ji vê profilê taybetiyên mirovê bajarî aşkera ne ku ji ber geremola jiyane, keşmekeş û muşkiliyên şexsî li ciyên talde û tenha jî xweşî û rihetî li wan nabe nisîb. Her di nav eceleyekê de ne, her karekî wan ê acîl heye ku divê biqedînin, hesabeke wan heye ku bi hûrgulî bidin. Gelek caran di vê hengameyê de mîna kavregêjan lê tîn û nema xwe ji baş dizanin.

Lehengê duyem ê çîrokê ku hindek xususiyetên şexsiyeta wî ji navê wî û forma xerab a navê wî tîn famkin, ji serê çîrokê heta dawîya çîrokê bi navê xwe re hevaheng hatiye neqşkirin. Gelekî bêhnfireh e, jixwe dema guhdarê wî ji ber çîrdirêjiya wî xwe lê dixeyidîne, Ewdo wî bi bêhnkurtiyê sûcdar dike. Ewdo, kalekî gundî, wekî pîraniya kalên me gelek hez ji axaftinê (monolog) dike lewre maceraya xwe ya zûhatinê bi hûrgulî û dûvedirêjî digêrîne (vedibêje) ku bi zeraqa rojê dide dest pê kirin bi nimêj, werz û pin û siwariya mînbasê dewamê lê dike û ji ber 'bêhnkurtiya' guhdarê xwe (bi ya guhdarî ji ber zêde bêhnfirehiya Ewdo) dawîlêanîn lê nabe nisîb. Hereketên Ewdo yên dema vegotina çîrokrêya xwe, profîla wî li pêş çavên mirov hêj zelaltir dike lewre hevokên wekî 'bi destê rastê qodî girt, bi destê dî derbeke hêdî li qodiyê xist, guhezte destê dî û li aliyê dî jî xist...'; 'Ewdo jî dest pê kiriyê. Çixara xwe dipêçe, bi lêva xwe pela çixarê şil kir û bi tiliyên

xwe ciyê şilkirî jê kir û tutin berda nav pel û axaftina xwe domand', resmê kalo ku hay ji ilmê dinyayê tune , heçko bêpaxav, û hindî ku tu bêjî bextewar û dilrihet rasterast raberî me dikin.

Ev her du profîl û ligel wan du profîlan jî du cure jiyânên civakî wekî me berê jî diyar kiribû bi hostatî û zimanêke fesîh hatine neqşkirin. Argo û bikaranînên resen ên zimên, tam û çêjeke sivik û şirîn li seranserê çîrokê direşîne. Ekonomiya gotinan aşkera ye, lê bi gelek kêr gotinan mijareke gelekî kûr û dûr, hûr hûr hatiye analîzkirin. Di dawîya çîrokê de, sebra Hesê'yê bajarî têtê nake ku xwe li ber suhbeta Ewdoyê gundî û pîrçise ragire lewre bi dicûnan sehneyê terk dike. Yek dikare wê terkkirinê wekî lêkdûrbûn-lêkbiyanîbûna her du cure jiyân û civakan jî bixwîne ku êdî elaqe û daxwaz û awatên wan nema li hev digirin, û ev yek jî dibe sebebê muşkiliyên kommûnikasyon û levfamkirinê. Ku têkilî li ser faktora lev tehemmulkirinê tê danîn û sînore vê tehemmulê jî heye. Wekî ku di çîrokê de diyar dibe lê bihurîna sînore tehemmulê bi şikleke nexweş bi dawî dibe.

Xaleke dawî, dibe ku razek jî di axirîn paragrafa çîrokê de veşartî be. Piştî rabûn û çûna Hesê, Ewdo bi awayekî şaşwaz li ciyê xwe dimîne wekî ku qet ne li benda tişteke wiha ye, û dilê wî hêj jî li dû tevawkirina çîroka xwe ye. Halê Ewdo yê pasîf, bi nezera min bi me dide zanîn ku di vê lêkdûrketinê de piraniya mesuliyetê (sûcê) a bajarvaniyê ye, lewre gundiyatî statîk e, her wekî berê ma ye; lê belê bajarvanî aktîf e û her diguhere; lew şaşwaziya Ewdo jî ji ber famnekirina wan guherînan e.

LEHENG

Gordereş

Şer, mirin, kuştin, bindestî, zordarî, aşî, tiving, barût, serhildan, têkoşîn, û gelek kelîmeyên din ku ligel van di heman rêzê de ne di ferhenga kurdan de; kelîmeyên pir muhîm in lewre ewqas ketine nav jiyana û fikra kurdan ku bêyî wan nema ne jiyana ne jî fikra çêdibe. Qasî ku aşiqên niştimana xwe ewqas lê xerîb in jî, aşî û şer di mêjiyê şervanan de jî du fenomenên pevgirêdayî ne. Mirin piştî wextekê bêminetî ye, ne meseleyeke mezin e û kuştin jî kêma zêde wesa.

Di nav kurdên Kirmanşanê de `edet e, dema zarokek çêdibe, yek ji karên ewil jê re enstrumaneke muzîkê terxan dikin. Dê bi xweşî û germiya wê mezin bibe. Li bal me heke di zaroktiyê de çekê li zarok neyê dayîn jî piştî wextekê çî bi awayekî pasîf çî bi awayekî aktîf, çek dibe parçeyeke jiyana me kurdên din.

Ev çîrok bi dubendiyên şexsî ku ji ber vê rewşa kurdan a di navbera daxwaza aşî, aramiyê, û şer û çekan de çêdibin, dadikeve. Mijareke kell e. Şehîdê bênav (gomnav) ku ji ber ax û keserên bapîrê xwe yê ji welatê xwe hatî dîrxistin mezin bûye radihije şûrê serhildanê û ji bo `welatekî azad` berê xwe dide çiya. Dudiliya wî ya li ber bêqirariya ku ji kuştina leşkerê kuştibû xemgîn bibe an na, bi ya min derûniyeke giştî ye. Lewre heye ku gelek şervan hebin ku tenê ji neçarî dikujin û dizanin ku ew kuştin wê nebe xelasî. Lê belê herwekî di vê çîrokê de jî dibe xwe bi sibeya welatekî azad tesellî dikin.

Her wekî dawiya gelek ji şervanan dawiya wî şervanê bênav jî mirin dibe. Îmaja guvişîna hinavên wî ku wekî nosyoneke şerî tê

diyar dibe, ligel xwe gelek tiştên din ên balkêş bi bîr tîne. Herwiha deftera ku hêj di serê çîrokê de meraqê li xwendevan peyda dike, di dawiya çîrokê de dema ku şervanê me tê kuştin û deftera xwînê li ber bayî dikeve û rûpel jê yek û yek diqulibin dike ku çîrok di nav konseptêke tevaw û yekgirtî de bimîne. Dema nivîsa ser defterê aşkera dibe, di ferhenga kurdan de şîrîkatiya kelîmeyên di jwate ên mîna aşî û şer ku li jor behs lê bibû, hêj peyttir dibe; lewre li ser deftera şervanê ku ji bo azadiya welatê xwe leşkerê dujmin dikuşt û canê xwe di şer de dida tenê kelîmeya aşî, di hemû rûpelan de, hatibû nivîsîn.

www.arsivakurdi.org

SALİH ŞEN

MESELEYA CINA

Salih Şen

Her çiqas mirov hebûn cin jî hebûn. Eladîn lampeyê difirkand, jê cinek camêr derdiket. "tu çi dixwazî ey xwedî?" digot. Di nav tûnebûyekî çi naxwazî... Lampeyan gundiyan ê rûyê camên wan bi sorgulî hatibû nexişandin, di bin siya wê lampê de ew zarokên gûndî gelo daxwaza wan çibû ji cinan.

Rêmo xweş evinek xwest. Xwedé da.

Mirovan di qelaşên axê da mîstin

Mala cinan xera bû, zarokên wan fetisîn.

Cinan xezeb barandin ser mirovan.

Evîna Rêmo jê qetandin

Ew kirin parçe parçe.

Rêmo dîn bû, gûnê dîna pê hat

Mirovan ew girêdan


Cin heyf hilanî û ketin kunê xwe

Qet derneketin ji lampeyan

Lampe rabûn elektrîk hat. Şewq zêde lê ne ronahî.

Baweriya mirovan jî ji cinan nema.

Gotin cin tune. zarok man bê lampe û bê hêvî.



CAN YÜCEL

www.arsivakurdi.org

Amadekarê Dosyayê û Wergera Helbestan: Hekîm Kılıç

Amadekarên Kronolojiyê: Alev Güneş, Hekîm Kılıç

www.arsivakurdi.org

DER BARÊ CAN YÜCEL DE

“Helbestvan gişt çivîkê
hefsê ne. Dilên xwe bi
xwe bi xwe dişewitînin
ku ev jî kêmasiya
mezin ya mirov e. Ji
ber vî hawî pir zor
helbest derdikeve, ya
rasî helbestvan
dernakeve lê carna
helbest derdikeve.”

Can Yücel

Helbest wergerî zimanekî din dibe an na? Ev pirsê ji terefî gelek mirovan tê pirsîn û gelek caran jî bersiva wê “na” ye. Li gorî wan, helbest weke bedenekî mirovekî ye, ma dibe ji nuh de ve bê ava kirin û helbest tiştekî xerîb e, çaxa wergerî zimanekî din dibe tu maneya wan peyvên di helbestê de namîne. Her wiha, peyv û hevok di hundirê zimanê xwe de bi reng, deng, tam û maneyek taybet cih digre. Lê wextê mirov li dîrokê binere wê bibîne ku mirovên weke Shakespeare jî bi wergerên xwe yê helbesta di dil û

aqilê gelek insana de ciyek taybet girtine. Can Yücel jî ji van mirovana yek e...

Can Yücel di sala 1926'a de li Stenbolê hatiye dinyê. Di zaningeha Ankara û Cambridge di beşê Latîni û Yûnanî de xwend. Di hin balyoziyana de wergêrî û li Londonê di beşa Turkî ya BBC'yê de spîkertî kir.

Eskeriya xwe li Kore'yê kir. Piştî di sala 1958'a de vegeriya Turkiyeyê demakî li Bodrumê rêbertiya turîsta kir. Dawiyê weke wergêr û helberstvanekî xweser jiyana xwe li Stenbolê berdewam kir. Di 1956'a de bi Güler Yücel re zewicî. Ji vê zewacê du qîz (Güzel û Su) û lawek (Hasan) çê bû.

Di salên xwe yî dawiyê de li Datça'yê rûnişt û her hefte di kovara *Lemanê*, her meh jî di *Öküzê nivîs* û *helbestên wî hatin* çapkirin. Ji heqareta li Serokkomar Süleyman Demirel dihat darizandin. Di hîlbijartina 18'ê Nîsanê de bû berendamê parlamenterê rêza yekem yê ÖDP'ya İzmir'ê.

Di heyama 12ê Adarê 1971'ê de, ji ber wergerên wî yê ji Mao û Che 15 salan ceza lê hate birîn. Bi efûya giştî ya sala 1974'a hate berdan. Piştî derket ji derve, pirtûka bi navê *Bir Siyasinin Şiirleri* (Helbestên Siyasetvanekî) ku di hepsê nivîsandibû çap kir. Piştî 12ê Îlona 1980 pirtûka wî yî bi navê *Rengahenk* (Rengaheng) bi îdiaya mustehcembûnê hate topkirin.

Di helbestên xwe gelekî cih dide peyvên argo û mustehcen û ji ber vî hawî jî gelek cara bal kişandiye û lêpirsyarî hatiye çêkirin. Di

sala 1950 de helbestên xwe yî ewil di pirtûka bi navê *Yazma*⁵⁰ top kiriye.

Di helbestên Can Yücel hîcw û hestyariya civakî giraniyek mezin digre. Bi zimanê xwe yî fêambar û dîtinên xwe yî afirîner bal kişand. Çavkaniyen îlhamê û mijarên helbestên wî; xweza, însan, bûyer, mefhûm, heycan û hest in. Di gelek helbestên wî de însanên ku ji wan hez dike heye.

Can Yücel herwiha ji lîstikên Lorca, Shakespeare û Brecht werger çêkiriye. Wergerên wî yî ji Shakespeare ji eslê tekstê gelek caran dûr e yanî ne werger lê ji nû ve qulipandin e. Bi taybetî jî *A Midsummer Night's Dream* (Xewna Şevê Havînî) ku weke *Bahar Noktası* wergerî zimanê Turkî kiriye tê bêje qey ji nû de nivîsandiye. Peyva Shakespeare ya navdar "to be or not to be" (hebûn ya jî nebûn) weke "bir ihtimal daha var, o da ölmek mi dersin" (tu dibê, îhtimalek din jî heye, ew jî mirin e) wergerî zimanê Turkî kiriye.

Helbestvan şeva 12ê Tebaxa 1999'a çû rahmetê û bi gulên berbero ku pir ji wan hez dikir hate oxurkirin û li Datça'yê hate definkirin.

⁵⁰ *Yazma*, di zimanê Turkî de tê sê maneya; Nivîsîn, Ne nivîse û Hibrî. Can Yücel îhtîmala mezin e ku bi maneya yekemîn yanî weke peyva *Nivîsîn* bi kar anîye. (n.w.)

KRONOLOJİYA CAN YÜCEL

1926	Li Stenbolê hatiye dinyê. Lawê Hasan Ali Yücel - wezîrê perwerdeyê netewî yê ewil î Turkiyeyê- e.
1945-1965	Can Yücel, di navbera van salan de di kovarên "Yenilikler", "Beraber", "Seçilmiş Hikayeler", "Dost", "Sosyal Adalet", "Şiir Sanatı", "Dönem", "Yöne", "Ant", "İmece", "Papirus" de nivîsandiye. Yücel bi helbest, nivîs û helbestên wergerê ku di kovarên "Yeni Dergi", "Birikim", "Sanat Emeği", "Yazko Edebiyat" û "Yeni Düşün" de hatine çapkirin tê naskirin, piştî 1965 li ser mijarên siyasî jî berhem daye.
1950	Wêjenasê navdar piştî li Zaningeha Cambridgê perwerdehiya Lafînî û Yûnanî sitend dîsa vegehiya Turkiyeyê. Heman salê pirtûka wî ya bi navê <i>Yazma</i> hatiye weşandin.
1953	Wergera pirtûka Eleanor Roosevelt a bi navê <i>Yên tê bîra min</i> çêkiriye.
1956	Bi Güler Yücel re zeviciye. Eynê salê wergera pirtûka Georges Duhamel a bi navê <i>Turkiyeya Nuh: Dewletek Rojava</i> çêkiriye.
1957	Wergera pirtûka bi nave <i>Ji Her Cûrê-Wergerên ji Helbestên Dinyê</i> hatiye weşandin.
1958	Wergera pirtûka Anna Frank a bi navê <i>Deftera Bîranînê ya Anna Frank</i> hatiye weşandin.

1959	Wergera pirtûka S.Lane Poole a bi navê <i>Biranînên Lord Stadford yên Turkiyeyê</i> hatiye weşandin.
1962	Di wê salê de li Îngilîstanê, dîtina wî ya pirtûkeke rêzimanê Turkî ku di 1709 de bi tîpên Lafînî bi forma çapberî(lîtografî) hatiye çapkirin, gelekî deng veda.
1963	Vê salê hate Turkiyeyê û çendakî li Bodrumê rêberiya turîsta kir.
1964	Pirtûkên wergerê yên bi navê <i>Pîna Cam</i> - T.Williams û <i>Gatsbyê Mirês</i> - S.Fitzgerald hatine weşandin.
1967	Pirtûkên wergerê yên bi navê <i>Lenin li Petrogradê ye</i> - E.Wilson, <i>Li Kûbayê Sosyalîzm û Mirov</i> - E.Che Guevara, <i>Cenga Gerîla</i> - Mao Tse Tung hatine weşandin.
1968	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Desthilatiya Reş</i> - S.Charmichael hatiye weşandin.
1971	Di vê heyamê de (Heyama 12ê Adarê), ji ber wergerên wî yên ji Mao û Che 15 salan ceza lê hate birîn.
1972	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Mavala</i> ⁵¹ <i>Saloz</i> - P.Weiss hatiye weşandin.

⁵¹ Mavala: Strana ku ligel bilûrê tê gotin.

1974	Ceza wî kete ber efûyê û hate berdan. Heman salê pirtûkên helbestê yên bi navê <i>Sevgi Duvarı</i> (Dîwarê Evînê) û <i>Bir Siyasinin Şiirleri</i> (Helbestên Siyasetvanekî) hatiye weşandin.
1976	Pirtûka helbestê ya bi navê “ <i>Ölüm ve Oğlum</i> (Mirin û Lawê Min)” hatiye weşandin.
1977	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Ji Bo Nû Destpêkeran Marks -Rius</i> , hatiye weşandin.
1981	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Bahar Noktası - W.Shakespeare</i> û heman salê pirtûka helbestê ya bi navê <i>Şiir Alayı</i> (Alaya Helbestê) hatiye weşandin.
1982	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Şvayk li Hemberî Hîtler - Bertolt Brecht</i> , û pirtûka helbestê ya bi navê <i>Rengahenk</i> (Rengaheng) hatiye weşandin.
1983	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Don Cristobita û Don Rosita -Federico Garcia Lorca</i> , hatiye weşandin.
1984	Pirtûka helbestê ya bi navê <i>Gökyokuş</i> (Ezmanderbejêr) hatiye weşandin.
1985	Pirtûka helbestê ya bi navê <i>Beşbiryerde</i> (Pêncliciyekî) hatiye weşandin.
1986	Pirtûka helbestê ya bi navê <i>Canfeda</i> hatiye weşandin.

1988	Pirtûka wergerê ya bi navê <i>Çîroka Hêla Rojavayê</i> - A.Laurents, hatiye weşandin.
1990	Pirtûkên wî yên bi navê <i>Kısa Devre</i> (Dewreya Kin) û <i>Kuzgunun Yavrusu</i> (Çêlika Qijika Reş) hatiye weşandin.
1991	Pirtûkên wergerê yên bi navê <i>Bîna Berfê</i> -C. M. Schulz û <i>Bahoz</i> -W.Shakespeare, hatine weşandin.
1992	Pirtûkên wergerên yên bi navê <i>Oliver Twist</i> - C.Dickens, <i>Hamlet</i> - W.Shakespeare, <i>Girava Xezîne</i> - R. L Stevenson û pirtûka wî ya bi navê <i>Çok Bi Çocuk</i> (Pir Zarok e) hatine weşandin.
1993	Pirtûkên wî yên bi navê <i>Gece Vardiyası</i> (Vardiya Şevê) û <i>Güle Güle Seslerin Sessizliği</i> (Bi xatirê te Bêdengiya Dengan) hatine weşandin.
1994	Berhemên wî yên bi navê <i>Gezintiler</i> (Seyran) û <i>Düzünden</i> (Jidûziyê) hatine weşandin.
1995	Berhemên wî yên bi navê <i>Maaile</i> û <i>Can'dan Yazılar</i> (Nivîsên Ji Can) hatine weşandin.
1997	Pirtûka wî ya bi navê <i>Seke Seke</i> (Lotik bi Lotik) hatiye weşandin.
1999	Pirtûkên wî yên bi navê <i>Mekanım Datça Olsun</i> (Warê Mîn Bila Datça be) û <i>Alavara</i> hatine

	weşandin. Heman salê di 12ê meha Tebaxê de çûye ser dilovaniya xwe.
--	---

ÇEND MÎNAK JÎ HELBESTÊN CAN YÜCEL

EM ŞER BIKÎN JÎ BO AŞTIYÊ

Herba sar xelas bû
 Şerên germ dest pê kir
 Welatê min jî di rewşek şerekî navxweyî de
 Welatê min di dil peritandinekê de
 Mezra dişewitin
 Gund dişewitin
 Hundirê min dişewite
 Zarok digrîn
 Dayik digrîn
 Bavê me dişewitin
 Di hundir deh hezar pirçî
 Ji derve bi sed hezaran tazî
 Ji bo aştiyê em şer bikin
 Em şer bikin ji bo aştiyê...

MÎSRETÎM

Çiqas hisretî te me

ji ber em bi hev re dijên

Çiqas hisretî te me

ji ber em bi hev re namirin

Çiqas hisretî te me

ji ber em ê gelekî hevdû bibîn

CANÊ MEZÎN GOT KU:

Min neqewirînî nav livîna

Qet xewa min tune

Hîn ez ê bibim mudaxilê gotinên we

Ez ê hawîr dorê belaw bikim

Ez ê televizyonê bigirim

Hîn ez ê resmê berberoyê çêkim

Ez ê ji tiliya xwe yî mezin re helbesta bixînim

Ez ê bifikînim

Hîn gelek nav henin

Ez ê şeva we tarî bikim

Ez ê vazoya we yî Kutahya bişkînim

Min bêwext nerazînin

Hîn gelekî zû ye

HELBESTA KESK

Çiqasî tu dineri, pir dibin stêrk di şevê
 Bi tilîkên te nayên jimartin;
 Hin ji wan tê bihîstin, hin nayên,
 Çiqasî tu guhdarî diki, zêde dibin di şevê
 Deng tîn,
 Ya ji zû, ya ji hêdî.

Her tişt ji zimanê xwe dipeyive;
 Tarîtî ser wê binixime jî
 Di şevê de dewam dike reng û reng
 Di şaxê darê, di ba de;
 Her tişt bi rengê xwe dipeyive.

Çavên xwe digirt disekinî;
 Dest û kulmên xwe yî dişuhibe pela, dirêj dikir,
 Disekinî heta bibihîse
 Di şaxê darê, di ba de;
 Çaxa kesk dibihîst radiket
 Di xewna xwe...

MÎHTÎHAR

Karê te çiye? dibêjin
 Berhê beradayî me min digot,
 Mirin e dibêjim van çaxana
 Mirin karê min î esas e
 Ma ez fil im di daristanan de xwe veşêrim
 Wextê ecela min hate,
 Helbestvan im ez dimirim
 Li pêşî çavê we
 Bi qîrîn û qîjîn

BESE

Pîr dirêj e ev dirêjahiyanan
 Sê deqqe besî min e
 Ji bo dengên zaroka
 Wextê ji mektebê vegeerê

Sê deqqe besî min e
 Ji bo ji çavê we maç bikim
 Ê ji bo ji cenetê bê m qewirandin...

BIMESAFE

Ji ku tê ecêb
 Ev xerîbiya min î xerîb?

Ne wexta ji malê dûrdikevim
 Ê ne jî wexta dûrî malê me
 Lê her ku nêzî û nêzîkî malê dibim
 Zêde dibe hisreta min î malê

QURSA ROJÊ

Ji dêvla tê rojê feth bike
 Teslîmî rojê bibe !
 Binere, ew her dû zarokana jî werê kirine !
 Bedenê wan î wek marsiqê⁵²
 Derpiyekî reş li qûna wan
 Xiyar dixwun di otobosê li ser niga
 Zarokên rojê...
 Ba jî werê ye,
 Bi germayiya rojê difûrîne....
 Ev ne qursa Qur'anê, Qursa Rojê ye!

DOKTOR

Ketim nav derdên bêçare
 Ma qey tune çara vêya?
 Heye:

⁵² Marsiq: (Tr. marsık) Komira darîn a tam çênebûyî.

Hezkirina jiyane qasî tê bimirî!

Bansaet

Ji nişka ve ez ê rakevim
 Piştî çendîn bêxewiyê bixew,
 Tê bê qey wê beybûn vebîn li pêş balkonê
 Pisîk wê werin tê de birîn
 Zibil...
 Ez ê rakevim, ne ji bo ku herkesî bixim xewê
 Ji bo ji xewê rakim,
 Ez tim were jiyam
 Ji bo herkesî ji xew rakim,
 Ne wext û saeta wê bû belkî
 Belkî ji ez
 Jiheqderneketim.

Remezane

Wextê fitara mirov xwe bikuşe
 Rojîya wî xera dibe ma?

Sehneyak Dîrokê

Wek Herba Navxweyî ya Îspanyolê me

Li alîkî Fransa
 Li alîkî Anarşîzm
 Li alîkî Stalîn
 Li alîkî Nazî, Faşîstan
 Li alîkî Dîrok
 Li alîkî ez,
 Digrîm bi Sanço Pançoy re
 Ez nemirîm lê ew mirin.

Çavkanî:

- *Alavara*, Can Yücel, Çapa 6, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Nîsan 2004.
- *Seke Seke*, Can Yücel, Çapa 6, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Sermawez 2004.
- *Mekânın Datça Olsun*, Can Yücel, Çapa 6, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Kewçêr 2004.
- *Çok Bi Çocuk*, Can Yücel, Çapa 11, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Nîsan 2004.
- *Gece Vardiyası*, Can Yücel, Çapa 8, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Nîsan 2004.
- *Güle Güle / Seslerin Sessizliği*, Can Yücel, Çapa 7, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Nîsan 2004.
- *Maaile*, Can Yücel, Çapa 5, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Îlon 2001.

- *Kısa Devre / Yazma*, Can Yücel, Çapa 2, Çapkeriya Pirtûkan ya Doğanê, Îlon 2004.
- <http://canyucel.tr.gs/>
- http://tr.wikipedia.org/wiki/Can_Y%C3%BCcel
- http://www.siir.gen.tr/siir/c/can_yucel/index.html
- <http://canyucel.cjb.net/>

www.arsivakurdi.org